

# NÛDEMI

No 5 - 1993



Kovara Hunerî, Edebî û Çandî

## XELATA NÛDEM YA EDEBIYATÊ!



Ew ê kovara me NÛDEM ji salê carekê di bin navê "Xelata Nûdem Ya Edebiyatê" de xelatekê belav bike. Ev xelata ha, ku armanca wê teşvîkkirina nivîskariya kurdî û vejandina edebiyata kurdî ye, wê ji aliyê jûriyeke xurt ve bête belavkirin.

Em ê di hejmarên bê de şerdên beşdariya xelatê, diyariya xelatê û navên endamên jûriyê bi we bidine zanîn.

Lê, hûn xwe ji niha ve ji **XELATA NÛDEM YA EDEBIYATÊ** re amade bikin!



Xwedî û Berpirsiyarê Giştî:  
Firat CEWERÎ

Hejmar: 5  
Adar 1993

**Şerdên abonetiye (Salek):**  
Swêd: 190 Skr.  
Welatên din: 39 \$  
Postgiro: 636 36 25-2  
ISSN: 1103-1964

**Wêneya Bergê:**  
Riza Topal

**Pergela Rûpelan:**  
MEZOPOTAMYA

- ◆ **Hevkarên Swêdê:** Xelîl Dihokî, Mueyyed Teyîb, Dilower Mêqerî.
- ◆ **Danmark:** Weşanxaneyê Xanî & Bateyî
- ◆ **Elmanya:** Husên Düzen
- ◆ **Belçîka:** D. M. Ferho
- ◆ **Fransa:** Ferhad Pîrbal
- ◆ **Australya:** Şahîne B. Soreklî
- ◆ **Tirkîye:** Dr. C. Bender
- ◆ **Ermenîstan:** Eskerê Boyik, Tîmûrê Xelîl
- ◆ **Îran:** Ehmed Şerîfî
- ◆ **Sûriye:** S. Birahîm

## NAVNIŞAN

Gamla Landsv. 36  
S- 740 41 Morgonåva  
SWEDEN  
Tel. & Fax: 0224-61 428

## NAVEROK

- ◆ EDEBIYATA KURDÎ / Firat CEWERÎ, 3
- ◆ XERÎBÎ / Eskerê BOYIK, 10
- ◆ BÎRA QEDERÊ / Mehmed UZUN, 12
- ◆ EW ROMÎ YE / Medenî FERHO, 24
- ◆ HEVPEYVÎN BI N. ARIÇ RE  
Husên DÜZEN, 26
- ◆ RASTHATINA LI LAÇÎNÊ / Tosinê REŞÎD, 48
- ◆ BÎRANÎNA MEHEMED ŞEXO  
Mervanê KELEŞ, 52
- ◆ NAKOKÎ / Hesenê METÊ, 62
- ◆ XEBATÊN HÊJA / Nûrî ALDUR, 66
- ◆ MELE AHMEDÊ BATÊYÎ / Z. ZINAR, 69
- ◆ HELEPÇE / Derwêş M. FERHO, 75
- ◆ HUNERMEND M. E. ŞAKIR  
Siyamend BIRAHÎM, 84
- ◆ HUNERMENDÊ PIRRHÊL: RIZA TOPAL, 86
- ◆ GOTINA PÊŞÎ YA ZERDEŞT  
F. NIETZSCHE, (Werger: F. CEWERÎ), 92
- ◆ XWÎN / Cemşîd BENDER, 103
- ◆ ÇAME / O. PAZ  
(Werger: E. Huseynî & Û. Mehdî), 105
- ◆ HEVPEYVÎN BI E. POLAT RE, 113
- ◆ ÇEND GOTIN LI SER FÎLMEKÎ BAŞ  
Ş. B. SOREGLÎ, 118
- ◆ ŞEFEQ / Husên ARIF, 122
- ◆ HEJAR / Amadekar: Ferhad PÎRBAL, 124
- ◆ DANASÎNA KOVARAN / L. POLAT, 126
- ◆ DANASÎNA PIRTÛKAN, 133



*Frau mit Krug, Gouache, 67 cm x 50 cm, 1984*

# EDEBIYATA KURDÎ

---

Firat Cewerî



**E**debiyat carinan di dema têkçûna siyasî de, carinan jî bi gurrbûna tevgera siyasî re geş dibe, bi pêş dikeve, xurt dibe.

Mîna ku li gelek welatên dinyayê bûne, li welatê me jî bi guhertinên rewşa siyasî re, rewşa ziman û edebiyata kurdî jî tête guhertin, ew reng û rûçikekî nû distîne. Bi hatina Cûnta leşkerî, 1980, xwendevan, siyasîvan û ronakbîrên kurd bi girsî, ji neçarî koçî welatên Ewrûpayê kirin. Demekê tevgera kurdî sist bû, cih bi cih têkçûna wê hate hîskirin, lê ronakbîrên kurd yên ku derketibûn Ewrûpa, xwe nas kirin, gelek ji wan jî fikir û ramanên xwe yên berê gerriyan, dev ji wê ramana xwe ya ku "Bi ziman û edebiyata kurdî re mijûlbûn, paşverûti ye" berdan.

Gava mirov jî welatê xwe bi dûtir dikeve, şerd û şirûdên biyanîstanê, jiyana biyanîtiyê mirov stûxwar dike, hîsî dike, diltenik dike. Ev hersê hêmanên (faktorên) han kirin ku em li xwe vegevin, xwe nas bikin. Li xwevegerin û xwenasîne jî kir ku em li nasnava xwe xwedî derkevin. Li nasnava xwe xwedîderketinê em ajotin

ser ziman û edebiyata me. Em têgihîştin ku miletek bi ziman, edebiyat û kultura xwe heye û bi van mijûlbûn jî ne paşverûti, ne jî dijminatîya tu gelan e. Berevajîya wê, bêî van biratiya bi gelên din re ne mumkun e. Xwendayên kurd yên ku ev yeka ha fêhm kirin, milên xwe lê wergerandin û her yekî jî hêla xwe ve dest avêtin vî karê pîroz. Yên helbest nivîsandin, yên çîrok nivîsandin, yên roman nivîsandin, yên ku lêkolîn û hevpeyvîn ceribandin, yên dest bi wergerandina berhemên dinyayê kirin. Ew zimanê ku bi salan jî ber sedemên xuyayî ve nehatibû bikaranîn, tenê zimanê gundî û şivanan mabû, di demeke kurt de bû zimanekî nivîsandinê. Di tevayîya Ewrûpa de zimanekî yekgirtî û edebî pêk hat. Hêdî hêdî standartek çê bû.

Rêxistin û partiyên kurdan weke berê ne bi tirkî, lê wan di civîn û semînerên xwe de zimanê kurdî bi kar anîn, belavokên xwe bi kurdî nivîsandin, navên kurdî li zarokên xwe kirin; hebe tune be wê jî ber gîr û nefretê be, navên xwe yên bi tirkî û erebî guhertin û di şûna wan de

navên kurdî li xwe kirin. Şaîr, nivîskar û hunermendên kurd, yê ku bi her awayî ji ziman û nasnava kurdî bi dûr ketibûn, li Ewrûpa bi xwe hesiyan, xwe nas kirin, hînî zimanê xwe bûn û dest pê kirin li gorî îmkanên xwe bi kurdî berhemên xwe afirandin. Li derveyî welêt bêhejmar weşanxaneyên kurdî ava bûn, sazgehên demokratîk û kulturî ava bûn, kovar û rojnameyên bi kurdî derketin, filmên bi kurdî çê bûn. Mirov kane bêje ku ronesanseke ziman û edebiyata kurdî dest pê kiribû. Lê mixabin, ev tevgera kultura kurdî tenê li derveyî welêt dima, ew nedigihîşte hevvelatîyên me yê li welêt. Tew demek hat ku kurdên li derveyî welêt û yê li welêt di aliyê zimên de ji hev bi dûr ketin. Di danûstandin û diyalogan de bi zehmetî ji hev têdigihîştin. Ev xebat û keftelesta kulturî ya bi salan li Ewrûpayê bû, nedigihîşte welêt, hevvelatîyên me yê li welêt ji vê tevger û pêşketinê destkewtî nedibûn. Heya demeke nêzik jî haya wan ji xebat û tevgera Ewrûpayê tune bû, wan navên nivîskar, kovar û rojnameyên bi kurdî nebihîstibûn. Xebata kulturî ya ku bi gelemperî li Ewrûpayê û bi taybetî jî li Swêdê geş bûbû di dolava xwe de mabû.

Ta ku di van salên dawî de, bi xurtbûna tevgera kurdî li welêt, bi avakirina pira danûstandinê di navbera kurdên li Ewrûpa û yê li welêt, bi avakirina weşanxane û weşandina weşanên bi kurdî li Tirkîyê, kurdî di demeke kurt de bi pêş ket û tîrêjên hevîyê berda dilê me.

Lê gava mirov bi tevayî dinihêre, hîna jî pîrraniya ronakbîrên kurdan li Tirkîyê dev ji ramênên xwe yê berê bernedane, ji berdêla mijûlbûna ziman û edebiyata kurdî ew ji xwe re ziman û edebiyata tirkî hildibijêrin. Ew bi hev re, di nav xwe de bi tirkî dipeyivin, guh nadin ziman û edebiyata kurdî, serê xwe bi kultura kurdî re naêşînin. Digel ku ev

camêrên ha bi kurdiya devkî dizanin jî, ew hewl nadin ku xwe hînî kurdiya nivîsandinê bikin, hebe tune be, ew ê ji tembelî be, ew gazinan ji zehmetiya zimanê kurdî dikin.

Kategoriyekê din ya nivîskaran heye, ku hem kurd in, hem kurdîtîyê dikin, lê ji ber sedemên siyasî, civakî û cografî kurdiya xwe ji bîr kirine, berhemên xwe bi tirkî dinivîsînin. Nivîskarên di vî celebî de heya do kê m bûn, lê îro hene. Yek ji van nivîskaran Mîrza Cemşîd Bender e. Bender di hejmara Nûdemê ya çaran de wilo dibêje: "Di pêvajoya dîrokê de edebiyata kurdî bi zimanê serdestan bi pêş ket. *Ebû Muslum Horasanî, Ebû'l Vefa, Şhabedîn Suhreverdî, Abdul Kadîr El-Geylanî, Şêx Adî, B. Mîdsafîr* bi erebî nivîsandine. *Di dema Selçûkiyan de Husamettîn Çelebî* yê kurd bi zimanê resmî farisî nivîsandiyê. *Seyit Nesîmî, ji şaîrên me yê dîwanê Nabiyê kurd û Fuzûlî* bi erebî û Osmanî nivîsandine. Di dema me de jî gelek şaîr û nivîskarên kurd bi zimanê resmî bi tirkî nivîsandine. Ji xwe ev heftê sal in nivîsandina bi kurdî li Tirkîyê qedexeyê. Lê ez nivîskarekî kurd im û ez bi vê jî serbilind im."

Em jî bi serbilindahiya Cemşîd Benderserbilind dibin û ger ew xwe weke nivîskarekî kurd dihesibîne ser çavan, lê yê ku wî navên wan hejmartine nivîskarên kurd in an na? Wan xizmet ji ziman û edebiyata kê re kirine? *Fuzûlî* şaîrê kîjan zimanî ye?

Gelek şaîrên edebiyata dîwanê kurd bûne... Lê wan berhemên xwe bi kurdî nenivîsandine. Loma jî ew îro weke şaîrên tirk yê dîwanê têne pêşkêş kirin. Lê kes nikane ji Ehmêdê Xanî re bibêje ew tirk e, an jî şaîrekî tirkan e. Ji ber ku *Ehmêdê Xanî* berhemên xwe bi zimanê kurdî nivîsandine. Kes nikane ji *Melayê Cizîrî* re bibêje ew şaîrê ereban, farisan an jî tirkan e. Ji ber ku *Melayê Cizîrî* berhemên xwe bi kurdî nivîsandine. Kes nikane

bibêje *Eliyê Herîrî, Melayê Batêyi, Feqiyê Teyran* ne şairên kurdan in. Ji ber ku wan berhemên xwe bi kurdî nivîsandine. Lê *Fuzûlî, Nabî, Nefî, Nafîz* û gelekên din ku bi eslên xwe kurd in, lê berhemên xwe bi kurdî nenivîsandine?... Gelo mirov ê karibe ji van re bibêje şairên kurdan?

Mirza M. *Anter* di hejmara *Welat* ya 48'an (1993) de di nivîseke xwe ya li ser *Y. Kemal* de wilo dibêje: "Heyfa *Y. Kemal*. Lê yên ku heyfa wan e ne *Kemal* bi tenê ye. Yên wek wî ji berê ve û niha jî pîrr in. Wek şairên *dîwanê Nefî, Nabî, Z. Gökalp, Silêman Nafîz, Elî Emîrî* û hwd. Heta ez karim xwe jî bêjim, ma çi îşê min bi tirkî re heye? Pîrraniya nivîsên min heya îro bi tirkî ne. Rica min ew e ku ji îro û pê ve xortên kurdan me paqij bikin. Em ne xayin in, lê em nezan û bêmecal bûn, em mecbûr diman li pîpîka dijminan bixin."

Lê ew nezanî û bêmecaliya ku *Musa Anter* behs dike îro nema ye. Hin şair, nivîskar û xwendayên kurd, ku bi tirkî dinivîsînin û bi tirkî tevdiagerin, gazinan ji zehmetiya zimanê kurdî dikin. Ma gelo bi rastî jî hînbûna zimanê kurdî bi qasî ku ew dibêjin zehmet e? Ji bo gundiyeke nexwendî dibe ku zehmet be, lê ji bo ronakbîr û siyasetvanekî bi tenê karê çend mehan e. Ronakbîrekî ku bi tenê çend mehên xwe bide hînbûna zimanê kurdî, ew ê hîn bibe û ew ê bi hêsanî bikaribe bi kurdî binivîsîne û ji xelkê xwe yê nezan re bibe mînak. Lê mixabin, ronakbîrên me vê nakin, hin bi zanebûn, hin jî bi nezanî ji ziman, edebiyat û kultura kurdî bi dûr dikevin. Ew vî barê giran li ser milên gundî û hejarên kurdan dihêlin. Loma jî di nava gundî û hejarên kurdan de wilo bû ye ku her tiştên biçûk, kirêt û ne spehî malê kurdan e. "Kera kurmancî", "Mîrîşka kurmancî", "Em kurmancên reş in" û hwd. Kompleksa xwebiçûkdîtîne, nebaweriya bi xwe, liba kurdan di giraniyê de ye.

Şikandina vê yeka han bi xwenasîn û bi rûmetbûna ronakbîrên kurd ve girêdayî ye.

Gelî ronakbîrên kurd ên birûmet! Li xwe vegerin, xwe nas bikin, bi zimanê xwe tevbigerin! Li ser hîmê xwe rabin, li ser koka xwe geş bibin! Mirov ancax di nava miletê xwe de serbilind e, di nava miletê xwe de serbilind bibin! Biratiya bi gelên dinyayê re bi hebûna mirov dest pê dike. Li hebûna xwe xwedî derkevin! Hebûna we zimanê we ye, kultura we ye, edebiyata we ye!



Me ji mêj ve dixwest em li ser nivîskarên ku bi eslê xwe kurd in, lê bi tirkî dinivîsînin munaqeseyekê vekin. Hevalê me *H. Düzen* di hejmara me ya sisyan de li ser *E. Ocak* bendek nivîsandibû. *E. Ocak* kurdeke Diyarbekirê ye. Ew van demên dawî bi çîrok û romanên xwe li Tirkîyê hatiye naskirin û di kurtedemekê de navdar bûye. Pirtûkên wê ji aliyê rexnegiran ve tene pesinandin, çîrokên wê bûne film, filmên ku ji çîrokên wê çêbûne bûne xwediyê xelatan. *Cemal Süreya* yek ji şairên Tirkîyê yê herî navdar û nûjen e. *C. Süreya* kurd e. Herweha *Ahmed Arif* jî yek ji navdartirîn şairê Tirkîyê ye. *Ahmed Arif* kurd e. *Y. Kemal* ku îro romannivîskarê Tirkîyê yê herî li pêş e û pirtûkên wî bi zêdeyî çil zimanan hene, kandîdatê (aday) xelata Nobelê ya edebiyatê ye, bi eslê xwe kurd e, lê ew weke nivîskarekî tirk tête pêşkêş kirin. Ger em navên hemû şair û nivîskarên ku bi eslê xwe kurd in lê bi tirkî dinivîsînin, di vir de binivîsînin, wê listeya me dirêj bibe û dibe ku rûpelên me ji têrê nekin.

Lê ji bo zelalkirina vê pirsgirêkê û bi armanca vekirina munaqeseyekê me bi çend pirsan nêrinên hin nivîskarên kurd girtin.

# PIRSÊN ME

## PIRS 1:

*Hişyarbûna kurdan ya siyasî û civakî, hişyarbûna kulturî û întelektuelî jî bi xwe re tine. Îro kulmek nivîskar û întelektuelên kurd giya ye. Ji van hinek bi kurdî û hinek jî bi tirkî dinivîsînin. Lê herdu hêl jî xwe weke nivîskarên kurd dizanin. Bi a we çawa ye? Gelo mirov kane ji berhemên ku bi zimanin din têne nivîsandin re bibêje berhemên kurdî an jî edebiyata kurdî?*

## PIRS 2:

*Hem li Tirkîyê, hem jî li welatên din yên ku îro serdestiya kurdan dikin gelek nivîskar hene, ku bi eslê xwe kurd in, lê bi zimanên serdestan berhemên xwe diafirînin. Digel ku ew jî dê û bavekî kurd in, lê ew xwe weke kurd nahesibînin. Gelo mirov kane çî navî li van celebî nivîskaran bike? Ma mirov kane ji wan re bibêje nivîskarên kurd?*

## PIRS 3:

*Kategoriyeke din ya nivîskaran heye, ku hem kurdîtiya xwe înkâr nakin, hem jî temayên wan jiyana kurdan û çavkaniyên wan kultura kurdan e. Lê ew berhemên xwe bi zimanê serdestan diafirînin. Edebiyatzan û rexnegir jî wan weke edebiyatvanên serdestan pêşkêş dikin. Bi a we çawa ye?*

## PIRS 4:

*Yek ji van nivîskaran Yaşar Kemal e. Yaşar Kemalê ku di cihana nivîskariyê de xwediyê navekî bi rûmet e, pirtûkên wî bi nêzîkî çil zimanan hene, kandîdatê (adayê) xelata Nobel ya edebiyatê ye, bi eslê xwe kurd e û camêr li gelek cihan jî kurdîtiya xwe înkâr nake. Bi a we Yaşar Kemal nivîskarekî kurd e an nivîskarekî tirk e? Ger hûn wî weke nivîskarekî tirk bibînin çilo û bi çî awayî, na, ger bi a we ew nivîskarekî kurd be, ji bo çî?*



# BERSÎVÊN WAN



## Rohat

«Mîsala herî berbiçav bêguman Şerefxan e, vî nivîskarî herçiqaş berhe-  
ma xwe ya dîrokî Şeref-  
name bi farisî nivîsibe jî,  
ew wek nivîskarê kurd tê  
zanîn.»

## BERSÎV 1:

Dema em qala edebiyata kurdî dikin, bêguman em berhem, afirandinên ku tenê bi zimanê kurdî hatine nivîsîn, fam dikin. Di navbera edebiyat-zimên de bendên gelek xurt hene. Berhemeke ku bi zimanê biyanî hatiye nivîsîn (tirkî, farisî, erebî, an jî almanî, îngilîzî) mirov nikare beşeke edebiyata kurdî bihesibîne (herçiqaş nivîskarên van berheman kurd bin jî). Ji ber ku her edebiyatek li ser bingehên hêz û îmkanên wî zimanî pêk tê û pêş dikeve. Di vê babetê de pîvana mezin çawa tê xuyan ziman e. Bêguman ev baweriyên, ji bo welatekî ku li ser ziman û nivîskarên wî zordestî û qedexebûn tunin, derbas dibin. Ji aliyê din, li welatekî wek Kurdistanê li ser ziman zordestiyeke mezin heye, ew ziman qedexe ye, di vê rewşê de mirov rastî nivîskarên bi du ziman (wek kurdî-tirkî), an jî nivîskarên ku ji der zimanê xwe dinivîsin, tê. Îro çawa em dibînin, wek mîsal li Tirkîyê beşek nivîskarên kurd hene bi tirkî dinivîsinin, lê belê xwe wek nivîskarên kurd dihesibînin. Herçiqaş ew bi tirkî binivîsinin jî, dema ew xwe wek kurd qebûl dikin, vê carê mirov nikare wan wek nivîskarên tirk bi nav bike. Li vira pîvana mezin, pîvana îdentifikasyonê ye. Ji ber ku bêdaxwaziya wan, bêîrada wan, zimanê wan ji destê wan hatiye girtinê, nayê bi kar anîn, li welat zimanê perwerdekariyê-komînikasyonê nîne. Ew mecbûr bûne, an jî mecbûr dibin, bi tirkî dinivîsin. Bi kurtî dema dixwazin bersiva kî nivîskarê kurd e? Kî nîne? Pêwîst e, em du pîvana bidin ber çavan a) Ziman, b) îdentifikasyon. Ji aliyê din mefhûmên "edebiyat" û "nivîskar" du kategoriyên ji hev cuda ne. Nûnerên edebiyata kurdî û nivîskarên kurd jî, wek du kategoriyan dikarin ji hev bîn

cihê kirin. Mîsala herî berbiçav bêguman Şerefxan e, vî nivîskarî herçiqaş berhema xwe ya dîrokî Şerefname bi farisî nivîsibe jî, ew wek nivîskarê kurd tê zanîn. Ji ber ku wî xwe kurd hesibandiyê, li vîra pîvan ne ziman e, pîrsa îdentîfikasyonê ye.

#### BERSÎV 2:

Me çawa li jor jî got, di warê navkirinê de hin pîvan di destê me de hene. Ji der van pîvanan, herçiqaş dê-bavê wî-wê kurd be jî, dema ew xwe kurd nehesibîne, mirov nikare wî/wê kurd, an jî nivîskarên kurd bihesibîne, wek *Ziya Gökalp*...

#### BERSÎV 3:

Îro gelek nivîskarên ku dê-bavên wan kurd in, ji ber ku bi zimanekî mayîn dinivîsin, bi navê edebiyata ku ji wî zimanê biyanî hatine afirandin, tînan hesab kirin. Di nav vê beşa nivîskaran de tiştê bala mirov dikêşîne, ji der ziman, ji aliyê din de ew xwe wek kurd jî nahesibînin, hatine asîmîle kirin, serêşî, nerehetiyên wan yê îdentîtetê- îdentîfikasyonê hene. Di nav berhemên wan de cîhgirtina dema kurdan bi serê xwe wek pîvanekê mirov nikare bide ber çavan, bifikirin! nivîskarekî Alman, an jî Ermenî di nav berhemên xwe de cihekî fireh bide tema kurdan, mirov dikare van nivîskaran, wek nivîskarên kurd bihesibîne? Naxêr, tiştêkî wîsan nabe, wek *İsmail Beşikçi*...

#### BERSÎV 4:

*Y. Kemal* heta niha berhemên xwe hemû bi tirkî nivîsîne, bûyê nivîskarekî tirk. Bend û peywendiyên nivîskar-xwendevan-berhem di vê rewşê de, beşeke hebûna edebiyata tirkî pêk tînin. Herçiqaş *Yaşar Kemal* kurd be jî, di berhemên wî de kurd cihekî taybetî digrin jî, ew xwe wek nivîskarekî tirk

dihesibîne. (Wek şexs ew xwe kurd dihesibîne). Sibe-dusibe wek *Y. Güney*, ew jî rabe bêje; "Ez hunermendekî kurd im", vê carê çawa me li jor jî şirove kir, rewş diguhere. Êdî mirov nikare bêje, ew nivîskarekî tirk e, em bêjin jî, dema ew nebêje, çawa tê xuyan ji destê me tiştêk nayê, realîta kurdan, serêşiyên kurdan yê îdentîtet û îdentîfikasyonê îro ji etabeke nuh re derbaz dibin. Ger û lêkolîna mirovan çawa em dibînin tehr û teşeyên nuh werdigrin, dinya û serê wan jî tevlihev e. Ji ber ku îro li Tirkiyê rewş, merc-hoyên azad tunin, riyên xweifadekirinê hatine xitimandin, mirov pêwîst e, jan-serêşiyên nivîskarên wek *Y. Kemal* jî fam bike, hebûna wan yekcar înkâr neke... Dema em dibêjin "Nivîskarên kurd" em du tiştan fam dikin; a) Kesê ku kurd e û berhemên xwe bi kurdî dinivîse, b) Kesekî mecbûr maye bi zimanekî biyanî dinivîse, kurd e û xwe wek nivîskar, nivîskarekî kurd dihesibîne.

Rewşa *Y. Kemal* ji van herdu tarîfan cudatir e. Ew her çiqas wek şexs xwe kurd dihesibîne jî, wek nivîskar ew nivîskarekî tirk tê zanîn, bi peyvên din, ew jî wek nivîskar xwe nivîskarekî kurd nahesibîne. Bi kurtî wek nivîskar (ne wek şexs) *Y. Kemal* bêşik di nav edebiyata tirkî de cîh digre. Bi edebiyata tirkî ve xwe îdentîfe dike. Bêguman ev pîrsên kesname (îdentîtet) nivîskaran, ji bo gelên wek kurdan pey koka xwe ketine, dixwazin kesnama xwe biparêzin, pîrsên rojane ne û girîng in, ji bo gelên azad, ev pîrsan îro nayên munaqêşekirin, ewqas jî girîng nayên dîtin. Ji ber li her welatekî azad, her nivîskarek heta ku pêwîstîk tune be, bi zimanê xwe berhemên xwe dinivîsin û kesnama wan zelal û kifş e.



## Nacî Kutlay

«Hela bi taybetî, angorî  
eslê wan î etnîkî, katego-  
rîkirina nivîskaran ne  
durust e û ne jî ilmî ye.»

Li ser vê pirsgirêkê hewceye ku meriv lêkolîn û munaqeseyên girîng bike. Ez nizanîm ka we çiqas rûpelên NUDEM'ê ji bo vê pirsê veqetandiye. Meriv dikare vê pirsê bi taybetî, bi serê xwe munaqese bike. Wê çaxê meriv dikare bi gelek alîyan ve li pirsê mêze bike. Ez hêvîdar im ku di rojên pêş, firseteke weha wê derkeve. Lewra, niha, çiqas ji destên min tê, ez ê kin û kurt dîrtinên xwe pêşkêş bikim.

Pirsên we ku bi hev re girêdayî ne, ez jî dixwazim bersivên wan bi tevayî bidim, lê belê pirsê dawî ya di derheqa *Yaşar Kemal* de ji yê din piçekî cuda ye. Lewra ez ê di dawiyê de bi taybetî çend pirsan ji bo vê meselê bêjim.

Bi dîtina min, pirsêkirina bi vî tehrî gelekî ne bi cî ye. Ji bo ku hemû nivîskar jî hevdu cuda ne û xusûsiyetên wan ên taybetî hene. Meriv bi gelek alîyan wek hev in, lê belê, bi hinek alîyan jî ji hev cuda ne. Nivîskar jî weha ne. Meriv dikare bi van xusûsiyetên wan binhêre û wan têke nav kategoriyan. Ev metod bi pirranî di dibistanan de, ji bo ku şagirt hêsa hîn bibin tê şuxulandin. Meriv dikare li gor xusûsiyetên wan nivîskaran, an jî nivîskarên hine deman, wan jî hevdu cuda bike. Wek naturalîst, romantîk û realist wh. An jî li gor deman, klasîk, nûdemîn wh. Lê belê meriv nikare angorî van kategoriyan, nivîskarekî bide naskirinê. Evtêrê nakin.

Hela bi taybetî, angorî eslê wan î etnîkî, kategorîkirina nivîskaran ne durust e û ne jî ilmî ye.

Bi vî tehrî û bi vê dîtinê, kategorîkirina nivîskaran di jiyane de ne mumkun e, pirr zehînet e. Wek qaîde yê fîzîk û kîmya nîn e. Di jiyane de meriv (însan) yê herî bi qîmet e. Ne wek "tiştan" e. Divê meriv bi vî çavî û bi vê

dîtînê li nivîskaran binhêre. Aletû wesîta çand û edebiyatê "ziman" e. Edebiyata kurdî, ji wan berhemên ku bi kurdî hatine nivîsandinê an jî bi kurdî hatine gotinê tên holê. Meriv dikare tenê qala wê edebiyatê bike ku bi wî zimanî hatiye nivîsandin. Meriv bi hine sebebên an jî hine demên taybetî bi zimanê xwe nikare binivîse û bêje. An zimanê xwe rind nizanibe û an jî zimanê wî/ wê qedexe be. Ji bo van sebebên, nivîskar berhemên xwe ku bi zimanekî din nivîsibe, ew berhem ne ji edebiyata milletê nivîskar in, ya rast ji edebiyata ew zimanê ku hatine nivîsandinê ne. Em nikarin bi tehrekî din qebûl bikin. Wisa qebûl kirin li dijî jiyane û xusûsiyete "tişt" an e. Edebiyata kurdî ji berhemên bi kurdî, edebiyata tirkî jî ji berhemên bi tirkî hatine nivîsandinê çê dibin. Milletê wî nivîskarî meseleke duemîn e. Caran xwendevan milletê wî nivîskarî qet nayne bira xwe. Yê herî girîng, zimanê berhevan e.

Nivîskar, pirsên gelê xwe, folklor, muzîk, edetên xwe bi zimanekî din nivîsibe ew berhem nabe edebiyata milletê wî. Yê bibe edebiyata wî zimanî ku pê hatiye nivîsandin. Wek, bi swêdî, meriv hinek bûyerên ku li der-dorên Diyarbekirê qewimîne binivîse, dawet û şînen wan herêman bîne ser ziman, em dikarin ji xwe bipirsîn, ev dibe berhemek ji edebiyata kurdî? ha min nivîsiye, ha Svensson nivîsî ye, çi ferq heye?

Bi ya min, di bingeha van munaqeseyan de dijîtiyek heye. Ew jî, kurd çima bi tirkî, erebî, farişî an jî bi rûsî dinivîsîne. Ev tişteki cuda ye ku ana ne ciye ku em li vir li ser bisekinin. Di nav sedan gelê dinyayê û dewlemendî û zehnetiyên tarîxî hemû tişt bi angorî dilê meriyan nabe. Meriv caran nexwaze

jî, zimanê dê û bavê xwe baş an jî qet nizane.

Ev tişteki vekirî ye, ku xwandiyên kurdên Tirkiyê, gelekên wan xwendin û nivîsandina bi tirkî ji ya kurdî baştir dizanin. Lewra jî gelekên wan bi tirkî dinivîsin. Bi vî tehrî alîkariya edebiyata tirkî dikin. Em nexwazin jî wisan dibe. Ji bo wê, meriv dikare çî bike, ev tişteki din e.

Di nav pirsên we de tişteki din jî heye; nivîskarek ku ji malbateke kurdî be û bi kurdî nenivîsibe, hûn dipirsîn ku em ê yên weha çî behesibînin? Bi a min, ev tişteki vekirî û şexsî ye. Meriv xwe çilo dihesibîne wilo ye. Kesên ku xwe kurd nehesibînin û bi kurdî nenivîsinin em ê jê re çî bibêjin.

Em bî ser pirsê *Yaşar Kemal*: Ez bi xwe *Yaşar Kemal* baş nas dikim û me pirt caran li ser vê pirsê jî xeber daye. *Yaşar Kemal* ji malbateke kurd e. Kurdiya xwe li hemû deran, angorî xwe tîne ser ziman. Li Edenê mezin bûye, lewra kurdî baş nizane. Kurdiya wî qels e. Lê belê hostekî zimanê tirkî yê mezin e. Folklorê kurdî û karakterên kurdî di berhemên xwe de gelek caran dîr û dirêj nivîsiye. Eslê wî kurd e, lê bi tirkî nivîsî ye. Li gor dîtina min ku li jor min got, *Yaşar Kemal* nivîskarekî bi eslê xwe kurd e lê nivîskarê Tirkî ye.

Em ku bi taybetî li ser eslê nivîskaran bisekinin, em naxwazin jî, tesîr û sînore wî/wê yî navnetewî teng bikin. *Yaşar Kemal* bi vê hostatî û navnetewiya xwe, di berhemên xwe de folklor û gelê kurd bi dinyayê dide naskirinê.

Ev neheqiyê mezin e, ku hinek kes hertim dipirsîn û li serê wî dixin ku *Yaşar Kemal* çima ne bi kurdî lê bi tirkî dinivîse.



## Hesenê Metê

### BERSIV:1

Mijara berhemekê, bi taybetî jî mijara berhemeke edebî li ser çî dibe bila bibe, li ku derbas dibe bila bibe, lê bi kîjan zimanî hatibe nivisandin, edebiyata wî zimanî ye. Nimûne: Li ser dema Hîtler berhemên edebî jî hatine nivisandin. Bûyer li Almanyayê, li Swîsreyê, li Polonyayê derbas dibe. Bi fransî, bi swêdî, bi îngilîzî û îtalî hatine nivisandin. Ba e, em ê çawa bibêjin ku ev berhemên ha edebiyata almanan e? Bi ya min, na! Pirtûk bi kîjan zimanî be, edebiyat jî dibe edebiyata wî zimanî ye.

### BERSIV:2

Niviskarekî bi pîrika xwe, bi dê û bavê xwe kurd be, bi kurdî nenivisîne û tew di ser de jî rabe bibêje: «Ez ne kurd im, an jî naxwazim bibim kurd!» Wê çaxê jî mafê tu kesekî tuneye ku ji wî zatî re bibêje: «Ew kurd e, an jî titekî kurd e.» Ev dibe titekî wekî pine, an jî boç û bi wî zatî ve dizeliqe. Bi ya min, ku meriv bi zimanê literatûrî nîgara wî bikin, divê meriv bibêje: Bi pîrik, an jî dê û bavê xwe kurd e, bi kurdî nanivisîne û naxwaze weke kurd jî were naskirin. Ewqas! Lê ku meriv bi zimanekî politîkî nîgara wî bikin, meriv ê gelek titên din bibêjin. Gelek caran meriv dibihîse ku dibêjin: Kurdekî xwefiro, xayîn... Lê ez bi xwe naxwazim bi wî zimanî bipeyivim.

### BERSIV:3

Bi ya min edebiyatzan û rexnegîr rast dibêjin. Kurdekî ku nikane bi kurdî binivisîne, lê bi tirkî xwediyê berehmên edebî ne, bi zimanekî literatûrî meriv ê nikanibe ji wan re bibêje niviskarekî kurd e. Lê bi zimanekî sosyolojîk meriv ê bibêje, îdentîfîta wî kurd e.

### BERSIV:4

Ku Y. Kemal bibêje «Ez kurd im.» Ew kurd e. Ku bibêje: «Ez nikanim bi kurdî binivisînim.» ew jî rast e. Berhemên hêja afirandine, li gor xwendevanan ew jî rast e. Lê dema ku dîsa bi zimanekî literatûrî were gotin, divê meriv neheqiyekê li wî, an jî li gelê kurd nekin û nebêjin: Niviskarekî kurd e. Herçiqas li hîndîstanê îngilîzî jî tê peyivîn, lê Salman Ruştî êdî ne niviskarekî Hîndî ye. Lê hinek rewên awarte jî hene. Tolstoy bi fransî jî berhem afirandiye. Berhema wî ya firansî weke edebiyata fransî be jî, gelek berhemên wî bi rûsî ne, rûs e û Tolstoy niviskarekî rûs e.

# XERÎBÎ

---

## Eskerê BOYIK

Ya serê sibê-  
Bikene xemxur û sibexêryê  
Dilovan bide welatê me,- dûr  
Hemêzke, germ ke çiyayê me-sîngberf  
Û geliyê mîna birînê me kûr...  
/ Çiqas wedeye welatê min ra  
Kes nekenyaye bêqelp, biratî,  
Ax, çiqas bêriya wan çiyar kiriye min,  
Bêriya wan warê xweş e cinetî/.

Ya serê sibê  
Hesîna min jî germ ke dilovan  
Bibe paşla dê,  
Cabeke xêrê bîne bide min  
Ser evê rênga tele xerîbyê...

Ax, çiqas hîvya wê cabê me ez  
Wê roja kerem tîne çap û hed,  
Hisreta wetan min ra bûye birî  
Bûye keser û êş, bûye merez, bûye derd...

Xwelî dikşîne û xûn dikşîne,  
Û dê dikşîne  
Ez jî hîvyê me,  
Hîvêbûn zor e, dijwar dilêş e,  
Emirmaşîn e,  
Axir birano welatê me xweştir,  
Welatê me baştir  
Dinya ronîk da cîkî din tune.

Loman ji min nekin maqûlêd dinê,  
Ji min nekin gazin  
Merivê xerîb cinetê da jî welat dixwazin,  
Nav zêr zîva da: xemgîn in, bêcî,  
Nav xêr-bêrê da: melûl in, birçî...

Çavên wan li desta,  
Çavên wan li derya,  
Çavên wan li merya,  
Ser zimên jî tim dua-dirozgê  
Gerok, parsekçiya...

Heta cegera xwe da jî xerîb  
Çavbihar, guman û dilgerm nîn in,  
Herge dikenin, herge kêf dikin  
Bizanibin ese wedelû dilê xwe dixapînin.

Kesera kûr e, birîna êş e, hisreta dûr e  
Hesîna wetîn,  
Hundir dildan e, nav xwînê da ne, dest kesî  
nîn e,  
Çi karî bêjî?  
Ne karî derxî, ne jî bavêjî, ne jî birêjî,  
Ya serê sibê  
Xerîbbûn zor e  
Xerîb neke tu, tu bendê dine.

Beşek ji romana

# BÎRA QEDERÊ

(ROMANA CELADET ALÎ BEDIRXAN)

---

Mehmed UZUN



CECO; ZAROKÊ WELATÊ  
XERÎBIYÊ,  
NEVIYÊ MÎR BEDIR XAN

1

Belê, herwekî ku hatiye gotin, pêşî dîtî û nihêrî e, paşê jî peyv û gotin e. Romana ku Celadet Begê dixwest binivîse, dikare bi vê wêneyê dest pê bike, ev wêneyê dikare bibe fotografî yekemîn a romana Bîra Qederê; Salut de Constantinople, Vue de Moda a

Cadi-Keuy. Silav ji Constantinoplê, bergehê û nêrînek ji Modayê, li Kadiköyê. Pêşî bergehê û nêrîna paşê gotinê û qise... Sal, 1893 ye. Demsal, bihar, ji mehan Gulan, ji rojan rojeke germ, vekirî û xweş e. Biharê û gulana hatine; derê û berhêşîna, dinya germ,



esman gewher e. Stembol û Kadiköy di nav govenda rengan de ne. Reng bi ser ketine, dinya ji nû ve vedije. Jiyaneke nû dest pê dike.

Di bergehê de tiştê herî ber bi çav, zerya ye. Zerya di nav rengekî kesk û şîn de hemû wêne rapêçaye. Tonên rengê şîn lê ne. Li aliyê dûr spiyekî qerqaş desthilat e. Li der û dorên qeraxên zeryayê tarîtiyeke qer li ser avê dixuye. Di navbera herduyan de jî hin celebên din ên rengê şîn hene. Esman çîkvekirî ye. Li cîhê ku zerya û esman bi hev re dibin yek, komên ewran çîlspî ne. Lê li jorê, cîhê ku êdî ewr diqedin, esman bi rengê şîn xemiliye. Rengê spî xwe qulipandiye serrengê şîn. Ewr di zikê hev de ne, lê nerm û sade dixuyin. Ne sawa berf û baranê, ne jî tirsba û bahozê lê ne. Ew di nav spehîtiyeke zarîf de ne, mîna ku ew mizgîniya jiyana nû bi dinyayê digihînin.

Li dûr, li cîhê ku zerya û esman dibin yek, berpala girekî ku dirêjî avê bûye, xwe bi zeryayê digihîne. Qirax û ax li wir dest pê dike. Gir bilind, dirêj û asê ye. Ew bi carekê noqî avê bûye, rûyê wî kevir e û mîna piyekî dirêj ê axê dixuye. Li ser gir dar hene. Ji bergehê fahm nabe ka ew çi texlît dar in, lê stûr û dirêj in. Li cîhê ku dar dest pê dikin, rengê kesk zora rengên spî û şîn dibe. Keskahiyeke bedew li rengên wêneyê zêde dibe. Keskahî hemû milê jor ê bergehê dadigire. Daristaneke xweş û bedew li wir hevaltî li zerya û esmanan dike. Jiyana merivan jî li wir dest pê dike. Ji ber ku li ser gir, di nav daristanê de xanî xuya dikin. Di ser daran re, banên qesreke pir mezin dixuye. Qesr spî ye û welê dixuye ku ew ji çend

beşan tê pê. Hema di binî banên xaniyan de pencereyên dirêj û mezin dixuyin. Meriv ji penceran dikare hemû rengên roja xweş a gulana 1893-an bibîne. Digel ku qesr di wêneyê de jî pir li dûr e, dîsan jî meriv ji avasaziya wê derdixe ku qesr di dema osmaniyan de lêbûye. Mîmariya wê ne ya bîzansan, lê ya osmaniyan e. Xwediyê qesrê jî binemala osmaniyan, sultan û şahzadeyên wan in. Qesr li ser pozê gir ava bûye û eynî mîna malbata osmaniyan, nêrevanî li erd û esmanan, dewr û dewranan dike.

Ji qesrê hinekî dûr, lê li ser eynî rêzê, çar qonax, bi gotina osmaniyan çar koşk hene. Ew bi qasî qesrê baş naxuyin, bi tenê banên wan û hin aliyên wan dixuyin. Ew ji qesrê pir biçûktir in, lê tevî wê, qonaxên spehî ne. Banên wan sor dike; bi lehîten sor lêbûne. Qonax li kêleka hev in û di nav daran re meriv dikare pencereyeke yekê bibîne. Ew qonaxa ku pencera wê dixuye, li kêlekê ye, ji qesrê dûr e. Ew ji qonaxên din jî hinekî dûr e... Ew qonax, hebûna wê, reng û avahiyên wê, ode û meclîsên wê, bîr û bexçê wê, ji bo romana Bîra Qederê pir girîng û pir pêwîst e. Ji ber ku tovên romanê li wê qonaxê tên avêtin: Qonax, yek ji malên malbata Mîrê kurd ê Cizîra Botanê Bedir Xan Beg e. Lawê wî Bedrî, paşa û sereskerê osmaniyan, tevî mala xwe tê de dijî.

Li kêleka qonaxa Bedrî Paşayê Bedirxanî, gir bi şikêrekê xelas dibe. Tê re gewriyek derbas dibe û xwe bi zeryayê digihîne. Piştî gewriyê jî girekî nû ku hinekî berztir e, dest pê dike. Lê di navbera herdu giran de, li cîhê ku gewrî xwe bi zerya digihîne,

lengergeheke dirêj heye. Welê dixuye ku lengergeh bi qasî 100-120 mîtroyî dirêj e. Li herdu aliyên lengergehê çend kelek, qayik, kod û keştiyên biçûk ên bayê hene. Ji wan hinekî dûr jî keştiyeke mezintir lenger avêtiye û rawestaye. Û hema li qiraxê lengergehê, du qonaxên biçûk ên bansor ku pir bi qonaxên din dişibin, dixuyin. Wan berê xwe dane zerya û piştî xwe dane gir. Girê nû û berztir jî bi daran tijî ye û li cîhê ku wêne xelas dibe, nîvê qesreke mezin xuyaye. Avasaziya vê qesrê jî mîna ya din e.

Li ser vê wêneyê tiştê herî balkêş, hebûna merivekî ye. Di wêne de, li aliyê pêş, giraveke pir biçûk heye. Girav hema bi qasî bihustekê ji qirax û gir veqetiyaye. Lê meriv dikare bi hêsanî xwe bigihîne giravê. Û hemû girav ji çend lat û kevirên mezin û bilind hatiye pê. Ew ne cîhê jiyîn û rûniştinê ye. Lê ji wir mîna teyrê baz, meriv dikare hemû alî bibîne. Di wêne de, merivekî li ser kevirê herî bilind ê giravê rûniştiye û li kamerayê dinihêre. Ew kî ye, çi kes e, çi dike? Meriv vê yekê ji resim nikare derxe. Digel ku ew di wêne de, pir li pêş e, dîsan jî rûyê wî baş naxuye. Ew mêr e, porê wî reş, gomlega wî spî û kincê wî reş e. Wî hinekî stûyê xwe xwar kiriye û li aliyê objektiva makîne mêze dike. Pêş ew li fotografkêş dinihêre û paşê jî, bi ihtimaleke mezin, weha dibêje: "ez jî heme, ez li vir im, perçeyekî vê wêne û bergehê me..." Hebûna vî merivî wêne yekcar diguherîne; ruh û can dikeve wêne, hest û pejna jîn û jîndariyê direşe ser bergehê. Di fotoya yekemîn a romana Bîra Qederê de, hebûna merivekî weha gelek girîng e.

Ji ber ku romana Bîra Qederê, tevî bergehên cuda û xweş, li ser însan ava dibe. Meriv û hebûna wî esas e.

Di wêne de, merivê ku li ser kêvir rûniştiye, piştî xwe daye girê jorîn ku qesr û qonax lê ne. Piştî meriv, bi temamî, ber bi qonaxa Bedrî Paşa ye. Eger meriv xêzekê ji piştî wî bikisîne, xêz ê rasterast xwe bigihîne qonaxê. Di qonaxê de, ji 40 zêdetir meriv dijîn. Hemû jî Bedirxanî ne. Bedirxanî, bi gotina osmaniyan Bedirxanpaşazade, pir in. Ji vê qonaxê pê ve, çend mal, xanî û qonaxên wan ên din hene. Hemû jî li aliyê rohelat ê Stembolê, li milê Anatolîyê, li Kadiköyê bi cîh bûne; li Moda, Fenerbahçe, Cevizlik, Bostancı, Mühürdar, Göztepe û Kızıltoprakê dijîn. Bi dû welatê Kurdistanê re, Stembol û Kadiköy bûye welatê wan ê duyemîn.

Fotokêş kî ye? Li ser fotoyê, ev ne diyar e. Lê belê, eger kî be, ew fotokêşekî hoste ye. Li ser fotoyê hem dêmenên vekirî yên Kadiköyê, bi rengên xwe yên taybetî, hene, hem jî di navenda hemûyan de însan. Ne însan ji ber cavan direve ne jî bergehê Kadiköyê... Bergeh, perçeyekî ji xweşî û dewlemendiya Kadiköyê, tevî insanê wê, berpêş dike. Zerya Marmarayê bi pêlên xwe piştî qirax û girên Kadiköyê mist dide. Dar û ber bi rengên xwe yên demsalan hawirdor dineqîşîne. Qesr û qonaxên Kadiköyê esaleteke yekta didiyê. Bender û lengergehên Kadiköyê ku ew rapêçane, mîna pencereyekê li dinyayê vedibin. Keştiyên ku li doraliyên Kadiköyê ne, ahengeke lêhatî didinê. Daristan û hêşinahiyê Kadiköyê kiriye cîhê ger, geşt û seyrangê.

Di rojêke biharê ya gulana 1893-an

de, Kadiköy, taxa wê Moda û qonaxa Bedrî Paşayê Bedirxanî, li ser resimekê weha xweş û rengîn dixuyin.

2

Di rojêke biharê ya gulana 1893-an de, li Stembol, Kadiköyê, li mala Bedrî Paşayê Bedirxanî lez û bez û endîşe heye. Zarokê li rê ye. Jina Emîn Õlî Bedirxan, Samiha Xanim li ber welidandinê ye. Qonax tijî meriv e. Roj xweş, dinya germ, dan êvar e. Ji axê bîhna kulîlk û gulana difûre. Zerya çîk şîn e û mîna neynikekê zelal û aram e. Li esmanan komên spî yên ewran, bi aramî, xwe dilivînin. Li dûr, du keştiyên dirêj û stûr ên dûkelî zikê ava paqij diqelişînin û hêdî hêdî, li pey hev, derin. Dûya wan, bi giranî, ber bi esmanan hildikişê. Ro di ser ewran re li Kadiköyê dinihêre û tîrêjên wê li ser eniya pêşî ya qonaxa Bedrî Paşa şewq dide.

Qonax, sê qat e û li gora avasaziya osmanî hatiye lêkirin. Du qatên jêrîn, ji herdu aliyên, fireh in. Lê qata jorîn, bi tenê dirêj e. Loma, ne sê qat, lê meriv dikare bibêje ku qonax du qat û nîv e. Qata jorîn ji navenda xênî ber bi jor dibe û estetîkeke taybetî ya avasaziyê dide xonaxê. Li rûyê pêşînê qata jorîn pencereyêke dirêj û fireh heye ku xweşiya avasaziyê dineqişîne. Li ber pencerê jî balkoneke, bi gotina kevn, şahnişîneke biçûk heye. Ji wî derî meriv dikare hemû pêlên zerya, yek bi yek, bihêjmêre. Ji wirebediyeta ewr û esman, av û zeryayê, mîna tabloyeke resamekî hoste, baş, pir baş dixuye. Banê qonêx, ji herdu milan

ve, ber bi jêr, xwar dibe û bi qermîtên sor dagirtî û raxistî ye. Ev qermîtên sor pir xweş li rengên xênî û hawirdor hatiye. Rengê qonaxê spî ye û hawirdor jî di nav rengên kesk û şîn de ye. Gava rengê sor jî li wan zêde dibe, cumbaşa rengan temam dibe û rengên herî xweş ku li ber dilê kurdan pir ezîz in, derdikevin holê; kesk, sor, zer û gewher. Niha di vê danê êvarê de, gava tîrêjên tavê li ser qermîtên banê govend girtine, di eynî wextê de, govenda rengan e jî. Ban, bi kêranên têkûz, bi dîwarên depîn ên qonaxê ve hatine girêdan. Ev kêran, di avasaziya osmanî de, hem pêwistiyeke lêkirinê ye, hem jî neqş e.

Mîna hemû qonax, qesr û xaniyên li doralî, qonaxa Bedrî Paşa jî xêşap e, ji max, qab, cax, kêran, karîte, spartek û stûnên textînan ava bûye. Li eniya pêşîn a qonaxê, ji nav daran, 9 pencere dixuyin, çar li qata herî jêrîn, çar li qata navîn û yek jî li qata jorîn. Caxên penceran bi hostehî hatine neqişandin. Li ber deriyê mezinê qonaxê derenceyêk bi pênc pêlikan heye. Li herdu aliyên derî darên biçûk ber bi jor dibin. Bexçeyekî biçûk û xweşê qonaxê jî heye. Niha, li bexçê tiştê herî girîngê romana Bîra Qederê, bîra bexçê ye. Hema li kêleka çepê xênî, di bin dareke dirêj de, bîrek heye. Bîrek ku hem ji bo romana Bîra Qederê, hem jî ji bo şênîyê malê girîng e.

Herçî aliyê hundirê malê ye, berî hertîştî meriv divê bibêje ku 18 odeyên malê hene. Du salon, mutfexekê mezin, deh odeyên razanê, kitabxaneyek, odeyêke xebatê, serderiyêke dirêj, dalaneyekê fireh, du banyo... Lê dîsan jî, digel vê mezinahî û pîrbûna odeyan,

xanî têrî şênîyên malê nake. Malbata Bedrî bi xwe ji bihîst kesan zêdetir e. Eger meriv mêvanên wan ên ku hertim tèn jî bihesibîne, hejmar hîn pirtir dibe. Û niha, ji mehekê zêdetir e ku birayê wî Emîn Alî Bedirxan Beg jî, tevî jin û zarokên xwe, hatine û bûne mêvanê wan.

Belê, mêvaniyek ku ji bêgaviyê hatiye pê. Agir û şewatên Stembolê navdar in. Her roj derek, taxek, aliyekî Stembolê dişewite. Gulokên agiran bi esmanan dikeve, mal wêran dibin, malbat li kuçan dimînin. Her roj tulumaciyan taxên Stembolê, sîtil û depoyên avê li ser milên wan, bi qîreqîr, li kolanên Stembolê dibezin da ku xwe bi agirên kambax bigihînin û vemirînin. Lê heyhat!.. Ne agir vedimire ne jî qîre qîra tulumaciyan bi kêrî tişteki tê. Mal dişewitin, tax kavil dibin, jiyana rojane têk dere... Berî niha bi qasî mehekê, mala Emîn Alî Begê jî ku li aliyê Kadiköyê, Kızıltoprakê bû, şewitî. Wan jî têkber û feraqên malê berhev kirin û hatin qonaxa Bedrî Paşa.

Nivîskarê delal, herwekî ku tu dizanî, kitekit û detay ji bo afirîn û avakirinê gelek girîng in. Kitekit û detayên reng û bergehên ji bo resamekî, yên dangan ji bo musikejanekî, yên peyv û gotinan ji bo nivîskarekî girîng in. Belê, hê berî ku ez werim dinê, agirê Stembolê mala me wêran kiribû... Ew agir û bi gotina te, tulumaciyan Stembolê, mîna kitekit û detayeke jîna min, tê bîra min jî. Li milekî ew agir û şewat, li milekî jî qîreqîr û xirecir, rû û rûçik, cil û bergên wan tulumaciyan... Meriv nizanîbû çî bike, bikene yan

bigirî... Li taxa me Kızıltoprakê jî komeke tulumaciyan hebû. Qîrîna wan hê jî di guhê min de ye; "Hayyyy!.. Kara babam, hayyy! Yolumuzu kesenin haline vayyyy!.. Bu gelen Kızıltoprak köleleri!.." Kumê wan xwar, simbêlê wan boq, lingên wan xwasî, pazûyê wan şidayî, ew fedakar, pêxas û berdûşên Stembolê bûn. Hebûna wan, nişana jînê bû; li milekî axîn, girîn û qîrîn, li milekî jî ken, henek û zirtîn...

Îro, di vî danê êvarê de, gava roja romantîk a biharê ya Modayê hêdî hêdî winda dibe, li qata dudiyên a qonaxa Bedrî Paşa, di odeyê fireh de, Samîha Xanim di nav êşê mezî de ye. Mêr li qata jêr, li salonê rûniştine, jin jî li jor. Ev zarokê ku niha li rê ye, dê bibe zarokê dudiyên ê Samîha Xanimê. Berî niha bi deh salan jî wê zarokek, lawê xwe Sureya, anîbû dinê. Lê ne bi vê êş û ecêbê. Zik lê bûye mîna def. Êşa wê yekcar zêde ye. Nefes lê diçike. Ev çî hal e!..

### 3

Ev çî hal e!.. Eger weha here, Samîha Xanim dê bimire. Danê êvarê bû êvar, êvar qulipî serşevê, şev ber bi berbangê dihere, lê hê jî zarok nehat dinê. Êşên Semîha Xanimê yekcar zêde bûne. Êş pêl bi pêl tèn. Nalenala Semîha Xanimê ye, ji şerma nikare biqîre jî. Ew bi tenê kûr-kûr dinale. Rûşen Xanim, diya Bedrî Paşa û Emîn Alî Beg, du jinên Bedrî Paşa û hin jinên din jî li ser Semîha Xanimê ne. Her yek, ji aliyekî ve, dixwaze alîkarî bike. Rûşen Xanima pîr û xwedantecrube dike,

nake, nikare serê zarok ji bedena dê derxe.

- Min evçend alîkarî li jinên me kirine, lêtu carî ecebêke weha nedîtiye, ew dibêje... Li gora vê êşê û vebûna bedenê diviya zarok ji zû ve bihata. Serî dixuye, lêber bi jêr nabe. Ev çi hal e? Tirs a min ew tirs e ku Semîha min here. Çareyek divê, çareyek divê...

Çare çi ye? Mêr, Bedrî Paşa, Emîn Alî Beg û çend birayên wan ên din, li qata jêr, di salona fireh de hê jî rûniştine û li benda xebra pîroz in. Lawê Emîn Alî Beg, Sureya ku nû ketiye sala xwe ya dehan, heta berî niha bi bîskeke jî, li kêleka bavê xwe, li erdê rûniştibû û li hêviya hatina bira yan jî xwişka xwe bû. Lê gava çavên wî giran bûbûn, xizmetkareke malê ew biribû jor û razandibû.

Emîn Alî Beg ê dîsan bibûya bav. Du lawên wî hebûn; Hikmet û Sureya. Diya Hikmet zû wefat kiribû. Hikmet hê nebûbû du salî, diya wî bi nexweşiya seretanê ketibû û di demeke kurt de wefat kiribû. Du mehên dawîn ên nexweşiya wê Emîn Ali Beg gelekî êşandibû. Diya Hikmet ku Emîn Ali Begê jê ewçend hez dikir, li ber çavên hemûyan, bi êş û janeke mezin, vedimirî û dimir. Wan jî, ne Emîn Ali Begê, ne jî kesekî din, nikarîbûn tu tiştî bikin. Di rojên dawiyê de, diya Hikmet biqasî mistekê mabû. Û gava wê wefat kir, Emîn Ali Beg bi rojan li şîna wê rûnişt, bi mehan pê êşîya û di şevên tarî ya zivistana Kadiköyê de, bi dizî, ji bo delaliya xwe giriya. Diya Hikmet jineke bedew a çerkez û ji malbateke navdar a aristokratên Osmaniyan bû. Ew, evîna yekemîn a Emîn Ali Begê bû. Wan hê di xortiyê

de hevûdu nas kiribûn. Di daristan û bexçeyên Moda de, ew pêşî ji dûr ve, bi çawan peyivîbûn, paşê jî dest di destan de. Hingê mirin tu carî nedihat bîra wan. Piştî zewacê lawekî wan ê mîna topa zêr jî çêbûbû. Pêşerojê tiştên nû, xweş û serfiraz waadî wan dikir. Lê di wê dema ku ne mumkin bû ku wan bîr bi mirinê bibirana, mirin hatibû...

Bi dû mirina yara wî ya dil û can re, Emîn Ali Beg dil nebû ku bizewiciya. Lê lawê Mirê gornehîşt ê kurdan Bedir Xan, yek ji serokên herî girîng ên kurdan dê çawan mala xwe bê jin bihîşt? Niha lawê wî jî hebû, na, nedibû... Xwişkên wî Melek, Ayşe û Sariye û bi taybetî jî dapîra wan hemûyan Rûşen Xanim ketin qirika wî da ku ew bizewice. Dîsan zewac... bi kê re û çawan? Lê li ser gotin û israren "jinên malê", ew hêdî hêdî dîsan ket ser rîya zewacê. Îcar jî dîsan bi yeka gelekî nas re; Semîha. Semîha ku li ber destê diya wî mezin bûbû û ji diya wî re cariyetî dikir. Semîha ku mîna çilkeke zêr û dilopeke av bû. Semîha ku dilê wê nerm, heşê wê xurt û wîcdanê wê tam bû.

Her çi tişt û kesê xweş û rind e, ew muqedes e. Ev, yek ji qayideyên min ên jînê bû. Xweşahî, spehîtî û bedewî divê felsefa jînê be. Û xweşî û rindî divê bi xweşî û rindî bête zimên... Eger ez weha difikirîm û dijiyam, ez bawer im, tê de tesîra diya min pir bû. Diya min abîda xweşî û rindiyê bû ku bi gotinan naye saloxdan. Ew jî mîna dêmariya min a rehmetî ku min nedît, çerkez bû. Lê tiştêkî diya min ji dêmariya min zêde bû; diya min bi kurdî jî dizanîbû û li malê bi kurdî

dipeyivî. û ez vê yekê jî bibêjim; kurdiya diya min ne kêmfî kurdiya metên min û dapîra min bû. Herwekfî tu jî dizanî, xweşiya çerkezana bi nav û deng e. Ew hemû xweşî hatibû û li ser rûyê diya min diçirûsî. Di jînê de, meriv rastî gelek rûyan dibê. Piraniya wan ji bîr dibin, li hinên wan di bîr û heşê meriv de, her û her, dimînin. Rûyê diya min, yek ji wan rûyan bû ku mîna siya meriv, hertim, bi merivan re bû. Rûyekî gulover, spî, xweşlihevhati û bihîstiyar...

Lê niha halê Semîhayê ne tu hal e. Jê re çare divê... Rûşen Xanim ji derencên textî û neqîşkirî ku di navbera herdu qatên qonaxê de ne, hêdfî hêdfî peyayî jêr bûye û niha li salona mezin a qonaxê, li nik "mêran" e. Mêr divê çarê bibînin. Çavên mêran bi endîşe û meroq li Rûşen Xanimê dinihêrin. Gelo çî bû, çîma zarok nayê, digel ku evçend wext derbas bû? Rûşen Xanima westiyayî û bêxew napeyive, bi tenê bi çavan li civatê mêze dike û dîsan bi çavan bang li Bedrî Paşa dike. Herdu bi hev re, Rûşen Xanim li pêşî, Bedrî Paşa li paşî, derbasî mitbaxa mezin û fireh a kêlekê dibin. Maseyeke dirêj a xwarinê û li doralfî jî donzde kursiyên rûniştinê, li aliyekî mitbaxê ne. Mase û kursî ji darê gûzan çêbûne û rengê wan, rengê qahwê ye. Rûşen Xanim bi destê Bedrî Paşa digire û bi hev re derin li ser herdu kursiyên li koşa masê rûdinin. Stêrk, ji pencereyên fireh ên mitbaxê, ronahîyeke qels direşînin hundiirê mitbaxê.

-Yadê, ev çî hal e? Çîma zarok weha bi derengî ket? Bedrî Paşa dipirse.

-Kurê min, min heta niha

pîrikiya bi dehan zarokên malê kiriye, lê min ecêbeke weha nedîtiye. Ji êvar de ye ku zarok nayê xwar. Em dikin nakin, nikarin zarok bikişînin. Heke hinekî din weha dewam bike, em ê Semîha reben winda bikin... Divê doxtorek were û alîkarî bike. Wekî din çare nîn e. Min nexwest ji Emînê xwe re bibêjim. Heke min jê re bigota, wî dê bigota na. Tu jê re bibêje û wî ji bo doxtor îkna bike. Hûn çî dikin bikin, zû doxtorekî bînin.

-Yadê, di vê nivê şevê de, em ê doxtor ji ku bibînin. Tu dizanî, em ji bajêr gelekî dûr in.

Rûşen Xanim gotina dawîn, bi dengê sar û qetî, dibêje;

-Lawê min, ma heke çare hebûya, min doxtor dixwest? Rast e, em ji bajêr gelekî dûr in, lê erebe li ber derî ye, ji seyisê xwe re bibêje, bila ew hespan bîne û bi erebê ve girê bide... Hûn divê xwe bi doxtorekî bigihînin.

#### 4

-Me xwe bi doxtor Esad Paşa gîhand. Xwedê jê razî be, wî yeka me nekir dudo.

Gava Bedrî Paşa û bijîşk Esad Paşa dikevin hundir, aliyê salonê, Bedrî Paşa weha dibêje. Emîn Alî Beg û kesên din jî radibin û xêrhatinî li Esad Paşa dikin. "Hoş geldiniz, buyurun, oturun." Ew kursiyekî fireh ê rûniştinê nîşanî Esad Paşa dikin. Lê Esad Paşa rûnane, destê xwe yê rastê davêje riya xwe ya dirêj û spî, li dora xwe, Bedrî Paşa û Emîn Alî Beg dinihêre û bi ken dibêje,

-Hayır, oturmuyayım. Sağolun. Elbette Bedrî Paşa ve sizleri kıramazdım... Ancak bildiginiz gibi, ben göz tabibiyim. Ama elimden geleni yapacağım...

Esad Paşa ku bi eslê xwe arnawid e, tevî mal, zarok û neviyên xwe, li Kadiköyê, Modayê rûdine. Piştî ku seyis hesp û erebe hazir kiribû û deriyê erebê vekiribû, Bedrî Paşa, birayê xwe yê herî biçûk Murat jî girtibû ba xwe û ew bi hev re çûbûn mala Esad Paşa. Esad Paşa ne bijîşkê zarokan bû ne jî aletên wî yên bijîşkiya zarokan hebû. Lê wî tikaya Bedrî Paşa venegerandibû. Ew bi hev re pêşî çûbûn nexweşxana Haydarpaşayê da ku hin alet û firaq werbigirin u bi dû re jî, bi lez, hatibûn malê.

-Hemen işe koyulalım... Hastamız nerede?

Bi van gotinên Esad Paşa re, Rûşen Xanim rê nîşanî wî dide û ew bi hev re derdikevin qata jor, odeya Samîha Xanimê. Jinên ku li odê ne, xwe didin alî. Textê razanê ku Samîha Xanim li serê ye, li ber pencereyekê ye. Li herdu aliyên text du maseyên dirêj ên text hene ku ji herdu aliyan ve xwe bi dîwêr digihînin. Li ser wan jî du çirayên mezin vêketîne. Li ser dîwarê kêlekê lewheyê mezin heye û tê de bi destnivîseke gelekî bedew Bismîllahî Rehmanî Rehîm hatiye nivîsîn. Destnivîs neqîşkirî ye û diyar e ku ew ji destê xetatekî hoste derketiye... Esad Paşa tê ser Samîha Xanimê û lê dinihêre. Çavên wê girtî ne. Diranên wê yên jorîn li ser lêva wê ya jêrîn in û pihê ew gez kiriye. Rûyê wê yê spî yekcar bûye mîna xwelî û jê

êş û jan dixuye. Bi tenê ji xwîdana ser enî, meriv fahm dike ku Samîha Xanim dijî. Esad Paşa destê xwe dide ser enîya wê. Enî, mîna berfê, sar e. Esad Paşa, bi destê xwe, bi zehmetî, çavê Semîha Xanimê vedike. Hingê, ji nişkê ve, bedena wê, mîna ku ew ketibe ber zelzeleyekê, pihê diheze û nalîneke kûr pê dikeve. Pêlên hezinê li pey hev û pir xurt tîn. Esad Paşa, bi carekê, li Rûşen Xanimê û jinan vedigere,

-Çabuk, çok çabuk, sıcak su, bez vesaire getirin, çabuk...

Jin, hema bi lez, jê re du misîn ava germ, satileke ava sar, leganeke mezin, hin xawlî û pêşgîr tînin. Ew bi lez destên xwe duşo û dîsan dere ser Samîha Xanimê.

Feylesofan weha gotiye; rû, ruh û giyanê bedenê ye. Tiştê ku meriv li ser rû dibîne, haletê ruhiya bedenê ye. Rû, nîşana fikir, hizr, pejn, hîs, gumanên dil û mêjî ye. Tu dikarî van hemûyan li ser rûyekî bibînî û bixwînî. Ma me kurdan jî weha negotiye; li rû binihêre, merivê xwe binase.

Di wê destê sibê de, li ser rûyê diya min Semîha Xanimê jî mirin hebû. Bi tenê mirin. Mirinê hê hingê mohra xwe lê xistibû. Ew êş, jan û zehmetiya berbanga wê sibê hem nîşana jîneke nû hem jî ya mirinê bû. Di berbanga sibeheke bihara 1893-an de, jîn û mirin ketibûn nav hev. Tu kesî nikaribû ew ji hevûdu veqetanda. Cezbê mirinê bi ser herkesî de hatibû. Kesî nikaribû tovên jiyane tê de bidîta...

Çaxa dunya ronî dibe û tav bi tîrêjên xwe yên pêşîn mizgînî li rojeke nû dike, Esad Paşa, Rûşen Xanim, Melek Xanim û du carîye ji derencên

qata jor peya dibin. Di hembêza cariyekê de, di nav pêşgîreke spî de tiştê heye. Pêşgîr di nav xwîna sor de ye. Esad Paşa, Rûşen Xanim û Melek Xanim ber bi salonê, herdu cariyê jî ber bi deriyê derve derin.

Gava Esad Paşa û yên pê re dikevin salonê, Bedrî Paşa û Emîn Alî Beg ji kursiyên xwe radibin. Ji kesî deng dernakeve. Bira û birarziyên din hemû çûne, li salonê bi tenê Bedrî Paşa û birayê wî Emîn Alî Beg mane. Yên nû hatî jî li kursiyên kêlekan rûdin. Hemû westiyayî ne, ji rûyên wan xemgînî dixuye.

-Acı kahveniz var mı? Sabah sabah acı kahve iyi gelir.

Esad Paşa qahwatahl dixwaze. Di destpêka sibê de, qahwatahl baş û xweş e, ew dibêje. Xeberên wî hem xweş, hem nexweş in. Emîn Alî Beg, destê wî li ser rîya wî, bi hizr li Esad Paşa guhdarî dike.

-Samîha Hanımı güç bela kurtardık. Ancak çocuğu kurtaramadık. Hacmi çok büyüktü. Zorla ana karnından çıkardık. Çok zor oldu. Ölü dogdu...

Rûşen Xanim gotina Esad Paşa didomîne. Semîha, Semîha delal û reben di nav hêlekana mirin û jînê de çend car çûye û hatiye. Wan bawer nekiriye ku ew dê xelas bibûya. Şikur ji Xwedê re ku ew xelas bûye. Herçî zarok e, wê hê zarokêkî ew çend mezin nedîtibûye. Ê zarok, kur bûye.

Emîn Alî Beg bi tenê li wan guhdarî dike û difikire. Ew çî bibêje û hîs bike? Samîha ji mirinê xelas bûye. Lê lawê wî miriye. Wî navê lêwik jî hazir kiribû. Eger zarok kur bûya, navê wî dê Celadet bûya, na eger ew

keç bûya, navê wê dê Meziyet bûya. Lê ew çî bike... mirin û jiyan bi hev re hatibûn.

## 5

Mirin û jiyan bi hev re hatibûn. Samîha Xanim li jorê, qata diduyan, razaye. Perçeyê beden û jiyana wê, zarokê mirî, li jêr, li kêleka bîrê ye. Cariye zarok, di nav pêşgîr û pêçekêkî xwîni de, danîne ber devê bîrê da ku wî bişon û tevî xanimên malê, veşêrin. Ew li der, bêruh û bêpejn, tenê, li kêleka bîreke sar, dirêj bûye.

Pariyeke zarok, misteke can... Hatî û çûyina wî bû yek. Ji qonaxê deng dernakeve. Mala mezin, di nav xewa sibê de, bédeng, li neheqiyên jiyanê difikire. Kî dê ber bi zarokê mehrûm bibe, wî bişo û ji xwîna jiyanê paqij bike? Kî dê kefenekî spî û biçûk li bedena wî ya biçûk rapêçe? Bêyî hêstirên çavan, kî dê bikaribe li ser wî melayika biçûk, bilorîne û stranên şînê bibêje? Kî dê wî bi temamî ji jiyanê bi dûr xîne û bixe bin axa reş û sar? Kî dixwaze pêrgî rûyê sar ê mirinê bibe, xwestekên mirinê qebûl bike, stûyê xwe li ber mirinê xwar bike, ji xwe re nebe xweyî û bide ber sistiyê? Kî? Jiyan û zehmetiyên jiyanê li aliyekî. Lê ev mirin, mirina ku dora romana Bîra Qederê rapêçaye? Mirina ku berî jiyanê hatiye û zarokêkî nûbîyî dixwaze?

Belê, mirina ku rêzika dinyayê digêrin, niha li mala Bedrî Paşa jî, mîna xeyaletêkî, digere. Rûşen Xanim, Melek Xanim, Bedrî Paşa û Emîn Alî Beg jî çûne odayên xwe yên razanê. Bi



westa şevê û sawa mirinê, ew dixwazin çavên xwe nerm bikin. Bi tenê çend cariyên malê li piya ne. Yek li ber serê Samîha Xanimê rûniştiye, yek li jêr têkberên salon û odeyan dide hev, yek jî li mitbaxê avê germ dike. Ji bo zarokê li ber devê bîrê.

”Ji bo zarokê li ber devê bîrê”...

Hîn gotin û peyv hene ku tê de jînek, umrek veşartiye. Çaxa meriv li wan hûr dibe, umrekî dirêj, mîna neynikekê, li merivan dinihêre. Nivîskaro, heye ku haya te jê tune be, lê di gotina te ya jorîn de umrê min veşartiye. Peyva bîrê û bîrên ku di hin gehînekên jîna min de bûn pardarên qedera min, hê wê roja biharê, li ber bîra qonaxa mamê min Bedrî Paşa, xwe bi kûrahî bera nav rehên jîna min dan. Jîna min a ecêb, bi awayekî ecêb, bi wan dest pê kir û bi wan xelas bû... Bîra mala Bedrî Paşa ku li kêlekê jîn û mirin di nav şerekî bêeman de bûn, bîreke pir xweş bû. Doraliyê wê bi qasî pênc bihustan, mîna dîwarekî, bi qermîtên sor hatibû lêkirin. Devê wê zêde ne fireh bû. Ew ne kûr bû jî. Di nav bîrê de, bi dîwaran ve, pêbaskên wê hebûn. Meriv dikarîbû bi wan pêbaskan daketa nav bîrê. Ava wê hinekî şor û hertim hûnik bû. Dara behîvan ku li kêleka bîrê bû, xweşiyeye yekta dida bîrê. Gava meh dibû adar û kulîlkên spî yên darê dibişkovîn, di bin dara spî de bîr dibû mîna bergehêk ji çîroka Hezar û şevêkê...

Cariya li mitbexê, ku eslê wê îtalî ye, straneke îtalî ya zîz li ser lêvên wê, hêdî hêdî, karê xwe dike. Wê ji qata herî jorîn, ji oda binê banê ku ji bo dirûn û hûnanê ye, cawekî dirêj ê spî aniyê. Ev caw dê bibe kirasê mirinê,

yanê bibe kafen û bedena biçûk rapêçe. Av li ser argûnê germ dibe. Gelo zarok dê li ku were şuştin? Mal, mala misilmanan e. Adet û ûsil divê baş bi cih bîn. Lê kî dê bi cih bîne? Cariye dê çima serê xwe bi van pirsiyaran biêşîne. Ji ber bextê rind, Rûşen Xanim, stûna mala Bedirxaniyan li vir e. Bêguman, ew ê her tiştî, bi rê xîne...

Cariye dere ser beroşa li ser êgir û li avê dinihêre. Na, av hê germ nebûye. Gelo av ne kêmbê? Cariye satila ber argûnê digire û dere derve da ku ji bîrê av bikişîne. Dinya êdî ronî bûye. Ji dûr dengê pêlên zeryayê, ji ser darên bexçê jî dengê çivîkan tê. Bayekî sivik hêdî hêdî pelên daran dilivîne. Rojêke nû ya bûyerên însanî dest pê kiriye. Zarokê mirî di nav paç, xawlî û pêşgiran de, li wir, li ser qermîtên ku li dora bîrê hatine raxistin, dirêj bûye. Jiyan çiqas ecêb e!.. Gelo vî mehrûmî, hema bi qasî kêlîkekê be jî, jiyan dît û hîs kir? Gelo rûyê wî çawan bû? Ji ber xwîna boş, kesî ne rûyê wî ne jî serçavê wî dîtibû. Niha, piştî biskekê, gava ew vî mehrûmî bişon, Rûşen Xanim dê, îlam, li rûyê wî binihêre.

Lê ew çi ye! Dengêk tê. Dengê zarokêkî tê. Dengêkî zirav ji zarokê mirî tê guhê Cariyê. Ev çi ye!.. Cariye li kêleka bîrê, di cîhê xwe de, mat dibe. Na, ne rast e. Cariye, ji xofan, hinekî xwe ji ber bîrê vedikişîne. ”Mama mia, mama mia...” Ma ev ne cin bin? Sihirên cin û periyên li van deveran navdar in. Ev ne listikeke periyên be? Ji dûr ve, ew dîsan, bi dîqet, li pêçeka zarok dinihêre û guhê xwe didiyê. Deng e, deng tê... belê, deng tê... Ev vedicinîqe.

-Signore, signori, signore,

signori!..

Cariye ji nişka ve, bi tirs û qîrîn, direve hundir. Cin in, cin hatine. "Signore, signore!" Cariyên din li mitbaxê, li ser serê wê dicivin. Yek ji wan taseke av tîne û didiyê. Ew diheze û matbûyî li cariyên dora xwe dinihêre. Murat Beg ku li qata jêrîn razayî bû, bi deng û qîrînê radibe û bi heyecan, picema lê, tê mitbaxê.

-Ne oldu, ne var? Francesca, ne oldu?

Ew bi tirkî ji cariyên û cariya ku diheze dipirse. Lê cariyê nikare bipeyive. Ew bi tenê, bi tiliyan bexçe nîşan dide û dibêje "piccola, piccolo..."

6

-Mio piccolo, mio piccolo.

Cariye, Rûşen Xanim, Melek Xanim, cariyên din li ser serê zarok in û wî dişon. Hêdî hêdî, bi diqet. Wan zarok anîne hundir, mitbaxê. Tiştê nebûyîne qewimiye; zarok dijî. Ew di nav xwînê de ye û hê jî ji serê wî xwîn tê. Lê ew dijî. Di pêveçûna jiyana û mirinê de, jiyana bi serketiye. Li qonaxa Bedrî Paşa, di roja nû ya biharê de, bêdengiya mirinê, bi carekê, qulipiye ser dengên jiyana. Samîha Xanima ku ji mirinê xelas bûye, niha dibihîse ku lawê wî jî ji mirinê xelas bûye. Bask nîn in ku ew pê bifire. "Yarebî, şukir, şukir ji te re. Heke tu nekujî, nakujî", ew dibêje. Ew nikare ji cihê xwe bilive û dakeve jêr, lê ji cariyê dixwaze ku ew werin û her gav xeberên lawê wê jê re bibêjin.

Kêf, kêfa Rûşen Xanimê ye, jê re

payan nîn e. Di vî umrî de, wê dê ev roj û ev ecêb jî bidîtina! Berî niha bi demeke kurt, ew bi keserkûrî çûbû oda razanê û ketibû nav cihê xwe yê ku li erdê raxistî bû. Wê dê zarokê mirî bişuşt, kefenê spî lê rapêça, li serê bixwenda û ew bikara nav gorê û axa reş li serê bireşanda. Lê niha zarok hatiye, ji mirinê vegeyiraye û hatiye. Perda reş a mirinê rabûye. Di roja ronî de, jiyana ronî dest pê kiriyê.

Rûşen Xanima ku umrê wê li ser 80 salan e, lê hê jî li ser xwe ye û di tevgerên xwe de xurt e, bi hêdîka, bi xawliyeke spî ya şil, xwîna zarok jê paqij dike. Zarok digirî, qîreqîr dike û xwe dilivîne. Bedena wî, li gora zarokê nûbûyî, mezin e û bejna wî jî dirêjtir e. Rûşen Xanim rûyê zarok paqij dike. Rû hêdî hêdî derdikeve holê. Porê wî reş, birûyên wî dirêj, rûyê wî gilover e.

-Li vî pozî, li vî difnî fekin, Rûşen Xanim bi ken dibêje. Poz, mîna pozê beranan e. Xwedê star bike. Enî, mîna eniya çiyayê Herokolê ye. Xwedê bihêle, ew tevde li bapîrê xwe rehmetî Bedir Xan Beg çûye, tevde kalik e.

Min dapîra xwe Rûşen Xanim, bi gotina te "stûna malbata Bedirxaniyan", hezar mixabin, nas nekir. Bîr û hafiza meriv heta katekê ye. Piştê wê êdî perda nezaniyê ye. Heta katekê, zaroktiya min tê bîra min. Lê, ne dapîra min. Bi dû bûyina min re ew dîsan vedigere nik keçên xwe (metên min), şamê û li wir jî dere rehmetê. Wê li kêleka mêrê wê (kalikê min) Mîr Bedir Xan defn dikin... (Jixwe li gora gotinan, gava ez tîm dinê, ew bi ziyaretî ji şamê hatiye Stembolê û demekê jî ji bo min li

Stembolê dimîne.)

Tu dizanî, di jîna xerîb de, meriv hene ku çêyîyeke mezin li te kirine û mora xwe li jîna te xistine. Lê tu wan nas nakî. Tu dikî, nakî, tu nikarî xwe bi wan bigihînî û wan binasî û bi awayekî ji bin çêyîya wan derkevî. Tu bi wan dizanî, li wan difikirî, lê nikarî wan bibînî. Çêyîya wan dibe hesre teke xedar û bi canê te dikeve. Hesret gav bi gav te, bedena te, can û ruhê te, mêjî û dilê te vedigire. Hesreta dîtina dapîra min jî, hesre teke weha bû; wê ez vegirtibûm. Di her gava nû ya jîna min de, wê hesretê rîya min li ber min rast dikir. Min li gora wê gav davêt. Bav û diya min, mam û metên min bi dirêjî behsa wê û zimanê wê yê şêrîn dikirin. Li gora wan, tu kes mîna dapîra min xweş û zelal bi zimanê kurdî nepeyiviye. Eger ez pîşê bi xurtî li ser zimanê kurdî hûr bûme û min bi kurdî nivisiye, bawer bike, tê de para hesreta dîtina dapîra min pir e.

Rûşen Xanim zarok baş dişo, xweş dipêçe, serê wî yê birîndar girê dide û wî bi cariya îtalî re dişîne cem diya zarok, Semîha Xanimê.

-Fransê, lêwîk bibe nik diya wî, bila ew şîr bidîyê. Çavreşê min birçî ye, ew dibêje û tevî Melek Xanimê vedigere salonê.

Emîn Alî Beg û birayê wî yê biçûk Murat li salonê rûniştine. Cixare di destan de, rûyê Emîn Alî Beg dikene. Gava ew Rûşen Xanimê dibîne, radibe ser piyan û ber bi wê dere.

-Yadê, çavê me ronî, lingê te bi xêr hat, Lawik jî xelas bû, ew dibêje.

-Emînê min, tu lêwîk bibînî, pariyeke şekir e; çavreş, pozberan, enîvekirî ye. Ew eynî bavê te rehmetî Bedir Xan Beg e.

-Yadê, helbet lawê min dê li bapîrê xwe here. Celadetê min neviyê Mîr Bedir Xan e. Ew dê dewsa bapîrê xwe bigire.

-Te got çî?

Rûşen Xanim, bi heyirî, ji Emîn Alî Beg dipirse. Ji ber ku wê tu carî ev nav nebihîstiye. Navê ku dê hertim di romana Bîra Qederê derbas bibe, cara yekemîn, hingê bi ziman dibe.

-Celadet, Yadê. Navê neviyê te dê Celadet be. Yanê xurtî û bawerî. Yanê li hember mezinahî û serdestiyê xwe ragirtin... Ji mêj ve bû ku min navê wî danibû. Ew li welatê xerîbiyê hatiye dinê, lê neviyê Mîr Bedir Xan dê bibe tîmsala xurtî û baweriya bapîrê xwe. Tu bi vê bawer be, Yadê.

-Cedad, Cedet... Ceced... Te got çî, navê wî çî bû?

Rûşen Xanim nikare navê lêwîk bi lêv ke. Emîn Alî Beg bi destê Rûşen Xanimê digire û wê dibe li ser kursiyekê dide rûniştin. Ew destê xwe dibe rîya xwe, pê dilîze û bi ken dibêje,

-Yadê tu pir westiyayî, hinekî bîhna xwe berde. Ê... Celadet, Yadê, Celadet.

-Cela... na, ez nikarim bibêjim, zimanê min lê nagere. Heyra ez dê jê re bibêjim Ceco. Cecoyê min...

# EW ROMÎ YE

---

## Medenî FERHO

Sal  
Û wext  
Ew kesê li devê derî ye  
bê ol  
û  
bê xelat

Wek  
Seyê har  
Bi şev  
Bi roj

Ew  
Romî ye  
Zilm û zor jiyana wî ye  
Xwîn û kuştin xebata wî ye

Di dem û dewranan de bi nîşanî  
Ne qesir hişt ava, ne xanî  
Ne kewar hişt tejî, ne kadîn  
Bi top û tiving tev bi yek awayî  
Qijnik li ser xwînê radizî  
Bê xof bê tirs wek hovên berazî

Sal  
Û wext  
Yek ''beş'' û yek ''qançor''  
Tê  
Bi talanî

Serê salê  
Binê salê  
''Wek xwedê kurek  
Bide xwediyê malê''  
Hêk di nava rûn de  
Goşt di nav dû de  
Qûtê salê di devê wî de  
Bê firset û bê bawerî  
Dizire weke kerê biharî.

# DI RUHÊ KURDAN DA TOLERANS HEYE.

Hevpeyvîn bi NÎZAMETTÎN ARIÇ RE

HUSÊN DÜZEN



Nîzamettîn Arîç û Husên Düzen (Foto: M. Ararat)

## BILA ZIMANÊ ME JI BIKEVE SÎNEMAYÊ

H.Düzen (H.D.):

*Kek Nizamettin, di van mehên dawiyê de gelek tişt li ser filmê «Kilamek ji bo Beko» hatin gotin; gelek rojnameyên dinyayê û yên Kurdan di rûpelên xwe de cih dan filmê te. Ew ket hin festîvalên filman yên navneteweyî û hate xelat kirin. Min jî dil heye ku em ji bo xwendevanên Nûdem'ê li vir bi ''Kilamek ji bo Beko'' dest bi sohbeta xwe bikin: Li gor te cihêtiya vî filmî ji filmên heta nuha bi kurdî yan jî li ser Kurdan çêbûne çi ye?*

N. Aric (N.A.):

Pirtîştên nû hene. Di serî da min dixwest, ez bi leyîstevanên profesyonel ra şixul bikim. Tirsê min ji wan kesên ku bi sînemayê va mijul nebûne hebû. Seba wê min û leyîstevanên Ermenî me hev dît û me xeber da. Lê belê kêfa min pê ra nehat. Paşê ez li goreyî wan hizir û rolên di serê xwe da li nav gel li meriyam geriyam. Min xwest tê da ji sedî 95 Kurd bilîzin. Ewên ku tê da dilîzin çewa ne? Tê da pîr û kalên me hene, ku wan nizanibûn, pêş kamerayê û paş kamerayê kîjan e. Ez li sed kesî geriyam. Min ew diceriband û dijbart, ka gelo ev rol rola wî ye, gelo ew çewa qise dike, gelo rabûn-rûniştin û reaksiyona wî çewa ye. Yekî dikaribû xweş xeber bida, lê nikaribû baş bilîzta, yan jî dilîzt, lê şaş dikir nikaribû xeber de. Ez pir aciz bûm û gelek waxtê min tê da çû. Li hevanîna van tiştan pir dijwar bû.

H.D.:

*Ji ber ku ew ne profesyonel bû?*

N.A.:

Erê. Lê belê ez niha dikarim bêjim, ku bi millet ra kar kirin rehetir bû, ji ber ku Kurdên me pir baş, pir paqij dileyistin. Çewa be, wisa dileyistin, ev xweş e. Ev tecrûbek gellek pêwîst e ji bo Kurdan, bona sînema Kurdan. Divê meriv ji xortên xwe, ji materyalên gelê xwe netirse. Gava meriv film çê dike, ne hewce ye, ku meriv Tarik Akan bîne. Di nav Kurdên me da keç û xortên me henin, ku pir rind dilîzin, kesên xweşik in, bedew in. Meriv divê ji wan netirse. Ku em ji gellê xwe bawer nekin û bêjin îlla merivên profesyonel dixwazim, ewê kingê û çewa leyîstevanên me bighêjin û bibin profesyonel? Niha li Kurdistanê di vî warî da yên profesyonel tunene. Lê em çewa bikin? Em film çê nekin? Tecrûba vî filmî aşkere kir ku, dema dil bixweze û meriv hewl bide xwe, di nav gelê me da leyîstevanên baş wê derkevin.

H.D.:

*Çend kesên profesyonel di film de dilîzin?*

N.A.:

Sê kes hene. Ez xwe nakim profesyonel. Yekî Kurd û du kesên Ermenî yên profesyonel hene. Ew kesên bi nav û deng in.

H.D.:

*Ji kerema xwe re tu dikarî navên wan bibêjî?*

N.A.:

Kurdê me rejîsorê pandomîmê ye û pir bi nav û deng e. Merivekî baş û pir întelligent e, hunera xwe baş dizane. Arsen Poladow e navê wî. Ew ji Rewan'ê

ye, xwendina xwe li Moskova'yê kiriye. Ji herdu leyîstevanên Ermenî yek Galîna Noven e, ku di nav Ermeniyana da pir tê nas kirin. Yê din jî leyîstevanê ciwan Aschot Yadingarian e, ku ew jî li Ermenistanê pir bi nav û deng e.

H.D.: *Qederê ez dizanim, leyîstvanê/a profesyonel di dema provê de rola xwe difîze hetanî ku ew karibe wê wek rabûn û rûniştina keseki normal rê bide.*

N.A.:

Kesin profesyonel hene, meriv wek rejisor dikare cem wan gelek tiştan fêr bibe. Lê di serên gelek kesên profesyonel da şablon hene. Ew dixwazin wan şabllonan bileyîzin. Ez bêjim wek rejisorekî nû di serê min da rolek heye. Gava ku yek tê û bi şablonê xwe dixwaze bileyîze, ev qebûl nabe. Ez çawa dixwazim gerek ew wisa bileyîze.

H.D.:

*Di nav te û leyîztevanên te de munaqeseyek li ser vê yekê bû?*

N.A.:

Pir. Yekî Ermenî hebû. Min got: Kerema xwe ra bi rûyê alkolî neyê vir, Heftêkî dev ji votkayê berde. Ev film li Kurdîstana Iraqê derbaz dibe. Li serê çiyana alkol û vexwarin tune ye. Ez tiştê wisa naxwazim. Gotin baş. Min ji gundiyan ra jî got, alkolê nedin kesî. Lê paşê min seh kir, ku wan dîsa jî votka peyda kirine, sibê tîn setê dîsa bi çavekî, bi rûkî wisa, û cardin rolên xwe şaş dikin. Misal: Dîdemek hebû divê tê da bigota, "ê baş", lê belê wî pê ra serê xwe mîna "na" dihejand, ku meriv nebihîsta, te digot, ew dibêje "na".

H.D.:

*Filmê "Kilamek ji bo Beko" ji serî heya binî hemî bi Kurdî ye û Kurdîya wî jî min bihîst Kurdîyeke pir baş e.*

N.A.:

Kurdîya film pir paqij e. Û tişteki çî xweşik e, gava ev merivan, ev zarokan di filim da xeber didin, dengê wan, bihna wan dibihîzî tu, li derdorê wana, çî vedixwin, ji devê wan ew deng tê. Ew tişteki pir xweşik e.

H.D.:

*Tiştê te dixwest ku tu bêje te kari bû bi Kurdî bianiya zimên. Tu hewcayî tu zimanên din nebû. Gelek caran tê gotin ku meriv bi Kurdî iro nikare berhemên mezin binivîsîne; Filmên yan romanên mezin binivîsîne. Di vi warî de tu dijwarî derket pêşya te? Em bêjin te dixwest tiştê bêjî, lê ziman têrê nedikir.*



N.A.:

Na, tişteki wisa tune bû. Tenê, piştî ku ez çûm Ermenistanê û min dest bi şixul kir, di dema provayê da min dît ku tiştê min nivîsiye, carina bi leyîstevanan zehmet tê, nikarin wisa xeber bidin. Pişt ra ez û Tosinê Reşît em runiştin, me li goreyî wan sahne guhart. Min bi tecrûbeyên xwe filmek kişand. Fîmekî mezin e jî, piçûk nîn e. Tişteki wisa min nedîtiye. Tişteki wisa tune ye. Zimanê Kurdî têra min kir. Têra filim jî kir. Kî dikare derkeve û bêje, bi zimanê Kurdî meriv dikare her tişt binivîse? Kes nabêje, ez jî nabêjim. Di zimanê Kurdî da



kêmasî hene. Lê em dikarin hêdî hêdî kêmasiyên xwe jî serast bikin. Lê gava em rojnameyên xwe, filmên xwe û romanên xwe, tim bi Tirkî çê kin û binivîsin, çawa û kingê emê zimanê xwe jî kêmasiyan xilas bikin. Ev problemekî pir zahmet e. Kî ku wisa dike, rexneyê min li wana ye. Ev heşt sal in ku ez hatime. Ev heşt sal in ez zimanê Kurdî xeber didim. Heşt sal in ku ez zimanê Kurdî hîn bûme. Ez dikarim bi zimanê Kurdî film çê kim. Hin kes henin Tirkiya wana jî pir nebaş e, Kurdîya wana pir baş e, lê dîsa jî Tirkî bikartînin. Vana gerek film bibînin û şerm kin. Meriv dikare bi zimanê xwe pir tiştên xweş çê ke.

H.D.:

*Gelo tu alîkariya filmin din li te bû. Yan te hemû bi xwe çêkir ?*

N.A.:

Tecrûbên min di sînema da nû nînin. Min bi leyîstevanî dest pê kir. Paşê min

ji bo pir filman muzik çê kir. Vana ra dan û standinê min, înteressê min tim hebû. Ez gava ji Tirkîyê derketim û çûm Sûriyê, wê derê wisa min du-sê not xwe ra girtibûn, wisa nivîsandibû.

H.D.:

*Kîja dem bû ew ?*

N.A.:

Sala 1981, gava ez ji Tikîyê derketim û demekê li Sûriyê mam, min li ser revê û sînor pir tişt gudaî kirin. Ji aliyê din ez jî ji sînor wisa derbas bûbûm. Min ji xwe zanibû ji sînor derbasbûn çiqas zahmet e, çiqas talûke ye. Hîn wê demê min dest pê kir, li ser vê temayê min çend notên piçûk girtin. Destpêk wisa li wir çê bû. Ew notên min wisa man heya sê sal berê. Paşê min dest pê kir, wan tev fikrên nû kûr bikim. Pişt ra hêdî hêdî ev film derket. Carina ewrûpayî ji min pirs dikin, dibên, tu çewa hînî filmçêkeriyê bûyî. Li ewropa meriv mekteba rejîsoriyê dixwîne. Ez jî dibêim, ez cem kalkê xwe û pîrka xwe hîn bûme. Min di jiyana xwe da pir dijwarî dîtî, ez ji jiyane, ji merivan gellek tiştan hîn bûm. Niha jî bi her cureyî merivan ra dan û standinên min henin, çî Kurd bin, çî ewropayî û yê din herwisa bi hunermendan ra bi merivên enteresan û ne enteresan ra, merivên baş û ne baş ra. Derdorê meriv jîyan çawa diçe, çawa tê, divê meriv wan nas bike. Ji aliyê din ku talentê meriv nebe, meriv nikare bibe rejîsor jî. Ez bawer nakim ku gava di nava merivan da talent tune be, ku ew li derveyî wan heye. Bi kitêban, bi dîtî û nizanim bi çî meriv nikrare filman bide sînemayê. Lê gerek meriv talentê xwe bizane. Pir kesên di nav politikayê da hene, ku bawer dikim ewan talentê xwe nizanim. Şaş in, polîtika nikarin bikin. Belkî ewan dikarin helbest binivîsin, lê nikarin politika bikin. Evî jîyan jî nîşan dide. Pir kes hene û îllahî dixwazin film çê kin. Belkî 20,30,50 film çê kirine. Ji yêkî jî tiştê derneketiye. Gava ku derdorê min ji min ra bibêje, "na tu dest ji vî karî berde" yan jî rexna li min bike, bêje ev tiştên wisa şaş in, bawer ke, ezê berdim.

Disa jî ez dibêjim meslegê min rejîsorî nîn e. Ez mûzîkvan im. Ez muzîkê çê dikim. Lê elaqaya min bi film ra jî heye, min bi leyistvanî dest pê kir, û ez dikarim rejîsortîyê jî bikim. Ev tiştê min yê zahmet kîjan rejîsorî çê kiriye nizanim. Her halde Charlie Chaplin çê kiriye. Senaryo nivîsandiye, rola bingehîn leyîstiye, rejîsortî kiriye, jê ra mûzîk amade kiriye. Dekorasyon ewî çê kiriye, kostûm amade kirine. Yanî ew qas tişt ewî çê kirine.

H.D.:

*Û ev tişt hemû pêwîst bûn te bi serê xwe çê bikirana, te alîkarî nikaribû ji kesin din bigirta ?*

N.A.:

Na. Pir meriv hebûn min pere jî dida wan, lê wana şixulê xwe baş nedikirin. Ya

ku wana çê dikirin, kêfa min pê nedihat. Min nedixwast tiştêkî wisa bi tenê bikim, mecbûr mam tenê bi destê xwe çê kim. Di vî filmî da her tişt hatiye çê kirin. Tiştêkî tesadûfî di film da tune. "Sürü" em bînin ber çavên xwe, di "Sürü" da pir tiştên tesadûfî hene. Misal, çûna wana cem koçeran, her tiştên koçeran li wê derê ye, ne wisa? "Sürü" em nas dikin, filmêkî pir mezin e bo min. Lê ez wisa dibêjim ku meriv bizanibe, ka min çewa çê kiriye, wan çawa kiriye. Min jî koçer çê kirine, wan jî. Yên wana koçerên rastî ne. Ewana çûne cem Kurdan her tiştê wana heye, cilên koceran yê orjînal li wir li xwe kirine. Tiştêkî ne hatiye çê kirin. Gava tê da ew du-sê dengbêj tîni bi erebane, sahnêk wisa tê da heye, tu tê da jinikan, zarokan dibîni, bi heywanan û karê xwe da, şixulê xwe da hemû dokûmentar in. Yê min da çet imkanek tunebû, ku sahnêke wisa bikşînim. Her tişt hatin mîzansen kirin, hatine çê kirin; ew gundê em tê da diman, ew cihê koçeran. Nêzikî 3-4 km rê hat çê kirin. Vê derê heya wê derê rêkî wisa li serê çiya. Rê tunebû, otomobîl nedikarî biçe wê derê. Zinarê mezin, wê derê min dibistan zarokan ra ava kir. Sê roj zinarên mezin kişandin wê derê.

H.D.:

*Gava din, berî em dest bi sohbeta xwe bikin, te ji bo filmê xwe got, ev film ne filmêkî nasyonal e. Min ew tişt baş fam nekir.*

N.A.:

Bi baweriya min filmêkî baş ew e, ku tê da him motîvên netewî û him jî yê navnetewî hebin. Belkî filmên Kemal Sunal natînal in, ew dikarin tenê Tirkan bidin kenîn, yekî Alman nikare bi wan bikene.

H.D.:

*Filmê te filmê Kurdî ye ?*

N.A.:

Filmê min bi zimanê Kurdî ye, filmê Kurdî ye. Kurd fahm dikin, bi kultura xwe paqij, bi dîtina xwe ya din, ne mîna Tirkan, ne mîna Ereban, ne mîna Farisan. Gere meriv materyalên xwe, qerekerên xwe derxe. Gere meriv filmêkî çê ke, ku meriv bibêjin, va filmêkî Kurd derketiye, ev filmêkî din e, şexsiyetekeke din e. Gava ez Tharkowski dinêrim, Tharkowski filmêkî pir paqij çê dîke, ew rihê wî tê de heye. Rihê Rûsî tê de heye. Ez dixwazim tiştêkî wisa bikim. Meriv gere bizane ji bo kê çê dîke. Film tiştêkî pir buha ye. Meriv nikare filmêkî çê ke, ku bibêjin, ewî ev çê kir iro dem vî dixwaze. Lê sibê? Meriv divê film çêke bo herdem.

H.D.:

*Film ji alî Kurdan çewa hat dîtin?*

N.A.:

Hin Kurdên me pir jê hez kirin. Cem hin Kurdên me jî problem heye, hîn bûne bi çavekî din li tiştan dinhêrin. her tiştî bi çavê organizasyon û tenê dîtina wan, ji wê pencerê lê dinhêrin. Gava navê partî an rêxistina wan xweş dernekeve, qala mezinahiya wan, mêrxasiya wan neyê kirin, dibêjin çima? Dibêjin, hertîşt xweş bû, lê ew tunebû. Ev dîtîna bi baweriya min şaş e. Di vî filmî da ruhê Kurdan heye. Ruhê Kurdan çi ye? Di ruhê Kurda da tolerans heye. Kurd mîna Tirkan nînin. Tirk çawa barbartî dike, millet çawa diêşîne, bomba davêje, zar-zêç qir dike. Kurd nikare mîna wan bike. Ewî Tirk dike, milletê Tirk jî nikare bike, merivê bi hiş wê çawa tiştên wisa bike. Evî eskerê Tirk dikare bike. Lê gava ez filmekî dikşînim, gava tê da eskerên Tirk tînd gundekî, ew esker çi dikin, ji bo me piçûk bikin. Hewce ye ez jî wek rejîsorekî Kurd wan texlît bikim? Tiştê Tirk dike, Kurd nikare bike. Pir mîsal heye. Gellek caran min di televîzyona Alman da dîtîye, li Kurdistana Iraqê peşmergan eskerên Iraqê girtine, paşê berdane. Ez bawer dikim li Kurdistana Tirkîyê jî wisa ye, gerilla jî pir caran eskeran dîl digre û paşê berdide. Ev di kultura me da heye. Em gava mîna Tirka bikin, mabeyna me û wan da ferq namîne.

H.D.:

*Wekî din çi reaksiyonên Kurda tu dikarî ji me re bêje?*

N.A.:

Heta niha min kîjan Kurd dîtîye, ez dizanim ji kîjan terefê kîjan rexne tê. Ew her alî da rexne pozîtîv e. Pir pozîtîv e. Êvarekê li bajarê Hamm'ê yek hat û got, "cara ewil e bi zimanê Kurdi filmekî dibînim, va bo min xeyalek e. Herkes bi Kurdî xeber dide, film bi profesyonelî hatiye çê kirin. Her tişt paqij û xweş e." Yanê millet pir kêfxweş e.

H.D.:

*Tu dikarî bi kurtî ji me re bêje film li ku derê hatiye çê kirin.?*

N.A.:

Min film li Ermenîstanê kişand. Min pir dixwast, ez film li Kurdistanê bikşînim. Bi rastî ji ber ku ne mimkun bû, ez mecbûr mam. Bes welatek ma, ew jî Ermenîstan bû, ji bo wan pir, pir spas..

H.D.:

*Pirsek din li ser film: Min li çend cîhan bihîst, rexne li beşên ku li Hamburg'ê çê bûne, tê kirin. Gellek kesan got ku te bi awakî pir bi lez ew beş çê kirine. Te keys nedaye wan ku ew xwe amade bikin. Gellek kes hebûn belkî nikaribûn wî karî jî bikin. Te ew girtine û bi wan lîstîye. Dibên te di wir de pir ecele kiriye. Rast e?*



N.A.:

Ji bo min ne mihum e. Ez nikarim li gora wan film çê kim. Ew dibêjin, gava meriv newrozê çê dike, divê meriv filmekî dokumentar bikşîne. Ji bo min Newroz ne babeta film e. Di Newroza film da çi dibe? Li wir Beko tê yekî dibîne, ji ber ku ew li birayê xwe digere. Ew li Kurdistanê jî li birayê xwe geriyabû. Dibêjin Newroz e, ew hêvî dike ku wî li wir bibîne. Ev kes birayê wî nas dike. Divê ew hevdû bibînin. Ji alî din Newroz tim ne wisa şevên mezin in. Ez malbatan nas dikim, di nav xwe da rûdinên û Newrozê pîroz dikin. Bê deng rudinên, xwarinê çê dikin, sohbet dikin, cilên paqij li xwe dikin, zarok ji xwe ra dilîzin û gava kêfa wan dixwaze, radibin ji xwe ra govendê digrin. Yanî ne di cîkî mezin da.

H.D.:

*Ew mesela profsyoneltiyê, bi rastî min dixwast tu hebekî din wê veke. Qederê ez te nas dikim tu pir qîmetê didî karê xwe. Muzika ku tu çêdikî tu dixwazî wê bi awakî profesyonel çêbikî. Gelek caran hukumiyê, em bêjin di şevêkê de kes rabûne govend girtine, tu pê aciz bûyî ku guhdar bi wî awayî "qelabalix" kirine. Te digot gere meriv muzîkê bi awakî weha bêje ku guhdar karibe lê guhdarî bike. Em dizanin ku muzika te bi awakî profesyonelî çêdibe. Tu pir li ser wan kar dikî û pişt re qasetên xwe derdixî. Lê ji bo film tu dibêjî gerek em "materyalê" xwe*

*kesên ne profesyonel be jî gerek em wan bi kar bînin. Bi min weha tê ku tu qîmeta profesyonelîyê ya tu dide muzîkê tu nadî film.*

N.A.:

Na. Ez mûzîkê Çawa çê dikim, ez film jî wisa çê dikim. Ez dixwazim bila mûzîka min paqij be, tişteki xweşik çê bibe. Bala min tim li ser vê ye. Meriv tê, tiştan çêdike û paşê diçe. Ji bo vê dema meriv tişteki çê dike, divê xweşik çê bike. Min pir şaşitî kirine di jiyana xwe da. Li Tirkîyê, li Kurdîstanê. Ez niha şerm dikim, ji ber ku mûzîka Kurdî min bi Tirkî digot. Ew tişteki xirab bû. Gava ez hatim Almanyê, min dest bi mûzîka Kurdî kir. Wê demê Kurdiya min ne baş bû. Heta niha ez kaseta çara ji nû va demaxim, ji ber ku zimanê min ne pir baş bû. Ji ber ku wan şaşitîyên bûne, ez naxwazim şaşitîyên nû çê bibin. Zimanê min niha piçekî pêş da çûye. Divê meriv bicedîne, ku her biçe xweşiktir be. Fîlm jî wisa ye. Yekî kamaraman, yekî leyîstevan nikare bi kêfa xwe tişteki çê bike. Gava karê min xerab bike, ew filmê min nine. Di film da rejîsor berpiriyarê her tiştî ye. Sibê yekî rabe ji me ra bibê, ev masa çima wisa ye, gere ez bersiva wî bidim. Berpirsiyar ez im.

H.D.:

*Gelo tişteke nebû wek astengiyekî ji bo te, em bêjin her tişt ku bes te bi xwe tenê çê kir, ku te xwest ku her tişt bila perfekt be? U ew jî li hember karê te bû astengî? Em bêjin te xwest her tişt pir pir baş çêbibe û te pir rol kurt kirin. Yanî te dixwest ku tu tişteki gelek gelek baş çêbiki.*

N.A.:

Rast e. Lê ez mecbûrê vê mam. Ez nabêmin ew qulbandiye. Min carek dinê nivîsandîye. Min xerab nekiriye nû da, ewî merivan çawa dikaribûn, min li gora wana nivîsandîsa. Bi zimanekî din, bi zimanê wana. Alîkî din da te got: "Di konseran da tu wisa dikî, tu aciz dibî, tu naxwazî millet rabe bilîze." Ev tişt rast e. Nav me Kurda da, ez merivekî serhadî me, cem me gava dengbêjek tê distirê, bê deng guhdarî dikin. Gerek deng nebe. Divê meriv guhdarî ke. Gerek wisa be. Min di kultura xwe da wisa dîtiye. Lê dibe ku kesên din hebin, ji cîkî Kurdîstanê din tîn, li cem wan wuha be. Çi dibêje bila bêje, guhdarî nakin, tevlihev e. Min tiştê wisa nedîtiye. Vê yekê jî tew şaş dibînim. Cîhê her tiştî heye. Dikare kilamên govendê bibêje. Meriv kare pê ra bilîze. Lê meriv nikare çar seet, şeş seet di şevê wisa de govendê bikşîne. Meriv dikare carekê bi dehol û zurne bireqise û paşê jî rûnê, guhdarî ke. Ew ne tenê kêmasiya millet e, yên ku organize dikin, karê xwe baş nakin. Gava însan dikevin hundurê salonê û dibîne her tişt tevlihev e, ew jî xwe tevî wê dike. Gava ku dîsîplîn hebe, cîhê xwe de rûdine. Guhdarî dike. Hunermend jî derdikeve xweşik xweşik tiştan amade dike. Dengbêjek derdikeve seetekî, kes nabê, bavo de bes e. Rexnê min li organizasyonan û li gelê me ye. Herdu jî divê tiştê xwe paqij bikin.

H.D.:

*Ez bawer dikim ew problemên we hunermendan ne. Li Araratê jî kes hene, gava tê stran radibin dîlan dikin. Belkî li Ruhayê jî hebin. Te got hunermendine hene dixwazin...*

N.A.:

Rast e.

H.D.:

*Min gelek çaran li konseran li te guhdarî kiriye. Heke Alman guhdarî dikin bêdengîyeke bêtir heye.*

N.A.:

Ma ew tiştêkî şaş e? Ferqa me û Ereban ev e. Erebi her tiştan dileyîze. Biçe şevê wan, her tişt tevlihev e. U xweş jî dike Erebi. Kultura xwe ye. Em jî min Ereban nakin. Kultura me tiştêkî nerm e. Li wê dengbêj rûdinê distirê, her kes guhdarî dike. Stranên me da, kilamên me da problem hene, hazîn in. Kilamin hene wisa wek govendî dibêjin, lê ew hazîn in. Tê de surgûntî heye. Dibêje "malan barkir...Goştê me xwar mişk û mara" û dilîze li ber. Ev mîsalek e. Meriv gerek çihê xwe bizane. Gava govendî, meriv rabe bilîze û paşê biçe şûna xwe rûne.

H.D.:

*Îsal filmêkî din bi navê «Siyamend û Xecê» hate çê kirin. Min berî çendekî di rojnamyekê de xwend, Hüseyin Erdem di wir de dibêje ku «Siyabend û Xecê» filmê Kurdî yê yekemîn e. Lê bi gumana min «Kilamek ji bo Beko» berî wî derket. Tu ji bo vê yekê çî dibêjî? U tu cihekî çawa dide filma xwe di pêşketina sînema Kurdî de?*

N.A.:

Weke tu jî aşkere dikî, filma min pêştatir derket, kete festîvalan û çend xelat jî standiye. Lê belê ji her tiştî pêwîsttir ew e, ku senaryoya «Kilamek ji bo Beko» bi kurdî hatiye nivîsandin, film bi xwe jî bi Kurdî hatiye kişandin û tê da dublaj tune. «Siyabend û Xecê» mixabin senaryoya wî bi tirkî ye, bi tirkî hatiye kişandin û dublaj kirine. Edî bila temaşekar û ew kesên ji sînemayê fam dikin qirar bidin.

H.D.:

*Yanî orijînalê wî filmî bi Tirkî bû ?*

N.A.:

Belê. Ma Tarik Akan tê da bi Kurdî xeber daye? Aliyê din da, yê min wisa nin

e. Di yê min da Kurd dilîzin û temakî hemdemîn e, temakî aktûel e, Siyabendekî nû ye, Xecêke nû ye. Pir problem hene li Kurdistanê. Divê meriv pêşîn van probleman bide xuyan û bîne ziman. Meriv nikare destanên mîna Siyabend û Xecê û Mem û Zînê wisa bi lez û bez bikişîne. Evan destanên pir poetîk in. Meriv çewa wan bigre wisa xirab bike. Mem û Zîn û Siyabend û Xecê divê bi rasti bi leyîstevanên Kurdan va bîn çêkirin. Hewce ye ku meriv bi merivên xwe, bi Kurdan bawer bike. Ma ev destan Kurdan afirandiye an...? Ev hunera Kurdan e û divê em berê bi hunermendiya merivên xwe bawer bikin. Siyamend 19-20 salî ye, xortek ciwan e. Divê meriv wisa çêke. Çima xortekî Kurd yê 19-20 salî, yê ku ji piçûktiya xwe da rûhê Siyabend nas dike, vê rolê neleyîze? Tarik Akan 50 salî ye, bavo. Ne li dijî wîya me, lê rûhê Sîyabend, rola Sîyabend di nav civata Kurdan da nas nake, di film da Kurdî qise nake. Ev tişt ji bo edebîyat, zargotin û kultura me pir pêwîst e. Divê ronakbîrên Kurd vê yekê tucar ji bîr nekin. Ez dîsa dibêjim, Mem û Zîn û Siyabend û Xecê wê hîn pir caran bîn çêkirin li Kurdistanê. Wisa namîne.

H.D.:

*Berpirsiyarê giştî yê rojnameya "Welat" Abdullah Keskîn ji bo pirtûka Hüseyn Erdem ya ku ji bo filmê Siyabend û Xecê bûye bingeh wuha dibêje: "Gava meriv pirtûkê ji serî heta dawiyê dixwîne diyar dibe ku tîpa "Gurî" ya ku nivîskar ew çê kiriye, tu elaqe wê bi Siyabend re tune. Ev çîroka giring ji ûslubê hetanî naverokê li gor motîvên edebiyata Tirkî ya gelêrî hatiye li hev anîn." 1 Gelo di film de jî ev derketiye pêş?*

N.A.:

Nizanim, berê jî min got. Hevalên din jî ji min pirsî bûn. Lê gava ku ez bibînim, ez dikarim baweriyên xwe li ser bêjim. Lê belê min hîn ew film nedîdiye.

H.D.:

*Lê te "Mem û Zîn" dîtiye?*

N.A.:

Na, min ew jî nedîtiye.

H.D.:

*Gelo tu çilo dibînî ku ev eposên Kurdî, kilamên Kurdî bi Tirkî bîn listin yan jî bîn nivîsandin?*

N.A.:

Ev tiştêkî pir şaş e. Hele Mem û Zîn'ê! Gere Kurd destûrê nedin tiştên wisa. Lê ev gotina min jî bi rastî ne tiştêkî demokratîk e. Hin kes dikarin tiştên wisa jî bikin, lê gere ew bi xwe bikin, divê Kurdên me alîkariya tiştên weha nekin. Divê





ronakbîrên me xwe beşdarî van çewtiyan nebin. Ku tiştên wisa tên çêkirin, tu zanî çiqas xirab e! Mem û Zîn destanek e. Di Mem û Zîn'ê da keçên periyên hene; sê keçikên periyên. Evan Mem û Zîn'ê tînin ba hev. Ne wisa ye? Ew dikarin bifirin, ew perên xwe datînin û dikevin ava gulan. Hespê Memo, Bozê Rewan, dikare bifire. Pir tiştên sihrî henin di destanê da. Sihêbaz hene. Loma ev tiştê wisa mîtolojîk, wisa epîk, gava tu van tiştanan jê bavêjî, bes eşqek normal û basît dimîne. Ma eşq çiyê? Li herder dinê wek hev e. Eşq e, hezkirin e, gava tenê wisa be navê wê Mem û Zîn nîne. Herçî Mem û Zîn e, ew ji bo Kurdan pir pîroz e. Ew cem Kurdan gellek bi qîmet e.

H.D.:

*Tu di Yenî Ülke de dibêjî, "ji ber ku bûyer pir bi lez û agresiv hatin, çêbûn, em wextê nabînin ku em li ser huner li Kurdistanê, cihê huner yan jî cihê hunermendan li wir, huner û azadiyê bifikirin û xeber bidin."*<sup>2</sup> Di vir de ez dixwazim tu van gotinên xwe hebekî vekî. Û di demên wanî de ku bûyer pir bi lez tên, yekî ronakbîr, hunermend gerek bi çî tehrî kar bike. Di rojê wiha de rola hunermendan çî ye, tu dikarî ji me re piçek bahs bikî ?

N.A.:

Ez zanim, tim dibêjin, rola hunermendî di şoreşê de çî ye. Hunermend ne

mecbûr e, tim xwe ji şoreşê re kil ke. Yanî şoreş perspektiv bingehîn nine. şoreş perspektivek piçûk e. Ah sibê şoreş pêk hat, paşê? Ewqasî ye şixulê hunermend? Ez tim dibêjim, li Kurdîstanê azadîya hunermendan hîn jî nîne. Gava hunermend cûrekî din çê dike, dibêjin ew çito tişt e. Yanî ew nermîtî, ew tolerans tune ye. Meriv gere bikaribe li Kurdistanê her tiştî bi senatê xwe bibêje. Ez vê azadîyê nabînim. Gava meriv tişteki din dibêje, hin organîzasyon dibin dijminê meriv. Gava meriv fikrê xwe veke, bibêje dinya îslamî dinyake xirab e, çî dibe? Di film da fikrê xwe wisa beyan bike, ne wisa? Lê ew azadî tune ye. Gava ku em li ser şoresgerekî filmekî çê kin, em bêjin ew şoresger tiştên xirab dike. Di mala wî da dûzan tune ye, jina wî bindest e, zaroka ra bavtîyê nake, paşê derdikeve diçe komelê, dibê ez şoresger im, ezê Dinyak nû çê kim, merivên nû ezê çê kim. Çito mirovên nû, çawa dinyakî nû, çawa dibe ev ? Gere meriv di mala xwe da dest bi şoreşê bike. Gava ez li ser yekî wisa filmekî çê kim, rexne lê bikim, wê ji bo min bêjin "cahş e". Kîjan dengbêj bi wê partîyê ra kar ne ke, ew li gor wan ne baş e, ew cahş e, xirab e. şoresgertî ev e? Ku meriv tişteki wisa bike, wê werin şevan, tiştê xirab biqîrin, yan jî binivîsin. Yanî çiqas tiştên xerab heye, hetta ji tehdîte heya kuştinê. Mixabin ev tişt da nav me da heye. Ango azadiya huner û hunermendên Kurda tune ye. Li ser vê divê meriv bi hevra pipeyive û binivîse. Em îro di demek wisa da ne, ku meriv nikare xeberde. Pir tişt hene, ez dixwazim li ser wan binivîsim, film çê kim, lê nikarim. Ew di dilê min da dimînin. Ez xwe bi xwe sansûr dikim. Ez dizanim ev tişteki şaş e, lê disa jî ez dikim. Di wextekî wisa tevlihev da meriv nikare xwestinên xwe, gotinên xwe bibêje. Hele mirovekî xweser mina min. Ez bi tenê me. Bawerîyek min heye, ez ji gelê xwe hez dikim. Gel jî ji min hez dike. Aliyê din da, bi partî û organîzasyonan ra dostîtiya min heye, dijminatîya min tune ye. Lê ji ber ku ez di nav wan da kar nakim, dostên min li cem wan hindik in. Ez wisa dibînim.

H.D.:

*Te got "ez xwe bi xwe sansûr dikim." Ez bawer im ne tu tenê yî. Gelek kesên din jî hene deng nakin, dibêjin ma qey ew tiştaya bi serê min ketiye. Li gor fikra min hoy çî dibin, bila bibin gerek meriv xwe sansûr neke. Divê kesê ronakbîr, hunermend tim karibe bîr û baweriyên xwe bibêje. Gava yekî wek te, yan ronakbîrên din bîr û baweriyên xwe nebejin, ez wek tişteki pir hazîn dibînim.*

N.A.:

Rast e. Ew tişteki hazîn e. Ez xwe tenê dibînim bi rastî. Lê ez bi tenê me li ortê.

H.D.:

*Tenê bûna te xurtîyek e.*

N.A.:

Dîsa jî ez hewl didim. Lê rexne min bo tiştên min hene. Azadîkî bi rastî tune ye. Lê meriv hevî dike ku sibê derkeve. Yekî rojnamevan li rastiya tiştan digere û

wê dinivîse, şixulê wi ew e. Yê min muzîk e. Bêşansîya me ev e. Em senatkar cîkî wilo da ne, ku barekî giran li ser milê me ye. Di nav organîzasyonên me da şaşîfîyên pir xirab hene. Ewana serast bikin, wê pêş da biçin. şixulê min ew e, gere ez mêjîye xwe bidim sinetê xwe.

H.D.:

*Te di nav gotinên xwe de tişteki pir enteresan got, te got; şoreş perspektîveke pir biçûk e. Ez bawer dikim ev raman ji gelek rexneyan ra vekirî ye. Dibe ku kesin bêjin, şoreş ne tişteki biçûk e, şoreş dê her tiştî azad bike, wê zimanê me jî azad bike. Gelek kes hene dibêjin ne pêwîst e iro em bi Kurdî binivîsin, dibêjin ewê yekê emê piştî şoreşê bikin.*

N.A.:

Hemû şaş e. Gava îro nikarin bikin, ew şoreş çi şoreş e? Gava mîna Molla li Kurdistanê şoreşê bikin, wê çawa bibe. Gava partîkî tenê, partîkî komûnist li Kurdistanê şoreşê bike, wê çi bike? Ewan ne tenê ne, dinyakî mezin heye. Ev dinya mezin pir pêş da çûye. Ev tiş, ev şoreş û fikrên wan hinan sed sal berî wan gotine û çê kirine. Lê meriv dibîne, li welatên wan piştî şoreşê qet tişteke nehatiye pêk anîn. Wan pir tiştên xirab jî kirine. Ew çi şoreş e? Divê meriv navê wê bêje.

H.D.:

*Tu behsa kîjan welatan dikî ?*

N.A.:

Hemî welatên sosyalist. Çi şoreş e? Rengê wê çi ye? Xwe li pişt peyva şoreşê wisa vedişêrin. Ev tiştî şaş e, bê perspektîv e. Dibên paş şoreşê cînet e. Wuha nabe. Ku wuha be, ez li Kurdistan'ê paş şoreşê kaos dibînim. Bela û kuştin wê heta qirikê bê. Tirs min ew e. Gerek em karê îro, îro bikin, nehêlin pey şoreşê. Gava Kurdistan çê bû gere em bêhazirî nebin. Ma emê sîstema Tirkan binin? Emê bêjin: Kurd, Kurd, Kurd...Kurdîstana Kurda ye. !? Metodên me wê çawa bin ? Senaat dîsa wisa ye.

H.D.:

*Tu dibêjî karê ku em dixwazin gerek em îro dest pê bikin û wî nehêlin piştî şoreşê. Di mesela ziman da jî meriv dikare wisa bêje. Gelek kes hene dibêjin ji ber ku em di rewşek xirab da ne em nikarin fêrî Kurdî bibin. Dibêjin emê piştî şoreşê karibin. Lê tu dibêjî gerek em îro dest pê bikin. Berî ku tu bê Almanya te Kurdî nizanibû û te berhemên xwe hemû bi Tirkî diafirandin, ne wa ?*

N.A.:

Erê.

H.D.:

*Piştî tu hat Almanya tu çilo fêrî Kurdî bû? Ez bawer im te xwe pir êşand. Tu di demeke kurt de him fêrî Kurdî bûyî û te di vê navberê de neh kasetên muzîkê bi Kurdî derxistin. U va ye te filmekî bi Kurdî jî çê kir. Filmê te di nav Dinyayê de deng da. Ew gîştik bi zimane Kurdî.... Te ev kar hemû çawa karibû bikirman?*

N.A.:

Bi rastî gava mîrov bixwaze, dikare hinî gelek tiştan bibe. Lê teşvîq jî tişteki pir muhîm e. Meriv gere zimanê Kurdî cazîp bike. Ji wî ne tirse, bi Kurdî binivîse. Wazîfekî mezin dikeve ser milê rojnamevanan, entellektûellan, hunermendan, partî û organizasyonan. Divê her tiştê ku tu çê dikî bi zimanê Kurdî çê bikî. Gava wisa bi Tirkî berdewam bikin, halê me pir xirab e. Vana dibên şoreş, şoreş... Sibê şoreş pêk bê, ewê bi kîjan zimanî rojnameyan derxin? Özgür Gündem, Yeni Ülke û Azadî wê disa bi Tirkî derkevin? Wê carekê da wana bikin bi Kurdî? Ewqas kovar û rojname hene, ku ew îro dest pê nekin wê kinga dest pê bikin? Kî dikare bibêje, sibê, dusibê, an pênc sal şunda şoreş hazire, li hêviya me ye? Tiştê wisa dibê? Jina min Alman e. Du zaroyên min hene. Ez bi zimanê Kurdî ne tenê stranan dibêjim. Ez di mala xwe da herdu zarokên xwe bi du zimanan mezin dikim; Kurdî û Almanî. Ez bi wan ra Kurdî xeber didim. Meriv vê neke, bi zarokên xwe ra Tirkî xeberde, icar navê wan şîlan jî lê ke, Dîlan jî lêke, fayde nake. Ev nabe... Ji bo huner jî wisa ye, bo film jî wisa ye. Di vî warî da, di warê filîmçêkirinê da heya niha tecrûbeyek tune, mîsalek tune ku meriv lê binêre û bêje çawa çêkirine. Ji ber ku tune, divê ez bi serê xwe çê kim. Ez tişteki çê kim, belkî fikrekê bide wan kesên ku qet mîsal di destê wan da tune. Imkanê me li vir bûn. Em li vir dikarin bi nihêrînek wisa mezin, wisa panoramakê çê kin. Awrûpa merkez e ji bo min, him ji alî sîyasî, him ji alî kulturî, û him alî aborî da. Ha li vê dest pêke mirov, filmekî çêke, sibê dusibê bê gotin: "Eстетика filmê Kurdî bi vî dest pêkiriye". Ne wisa? Edebiyata Kurdî tişteki din e, di vî warî da pêşiyên me ji me ra berhem hîştine. Edebiyatê niha disa despêkiriye. Ev ronasanek e, wê li Kurdistanê bi muzîk, bi nivîsandin û bi sînemayê dest pêkiriye. Ez dinêrim van salên dawiyê sê çar filîm bi Kurdî çê bûn. Bi Tirkî çêkirin paşê kirine Kurdî. Lê dixwazin bi Kurdî bikin. Meriv dikare bêje, her tiştî dest pê kiriye.

H.D.:

*Tu hunermendekî Kurd ê surgûnê yî. Di hejmara Nûdemê yekemîn de munaqaşeyek li ser surgûn û ronakbîrên Kurd heye. Ew tişt di wir de di mabeyna Xelîl Dihokî, Mehmed Uzun, Mahmûd Lewendî û Firat Cewerî de tê munaqêşe kirin. Mehmed Uzun dibêje hoyên surgûnê di salên 80 yî de ji bo gelek nivîskar û roakbîrên Kurd bûn çavkaniyên ji bo pêşketina ziman û edebiyata Kurdî, ango ew dibêje di jwartiya jiyana surgûnê rolek pozîtiv li ser kesên li surgûnê kir. Lê Mahmûd Lewendî dibêje, gava ronakbîrên Kurd di nav gel de li welêt bimanan,*

*nehatanan surgûnê belkî huner, ziman û edebiyata Kurdî hîn geştir bibanan. Tu di vê babetê de çi difikirî?*

N.A.:

Ev tiştê M. Lewendî dibêje, bawer dikim, ne pir rast e. Piçek rastiya wî heye, lê bi bawerîya min tiştê Mehmed Uzun dibêje rasttir e. Ez dibêim gava Kurdên me, hunermendên me yên ku mecbûr man welatê xwe terk bikin, ku biçûna welatên Ereban, wana wê bikarîban mîna niha li Awrûpa pir tiştan weha pêk banîyana? Ev pirsekî mezin e. Ez dibêim na. Ez li xwe dinêrim, berê ez çawa bûm û niha çawa me. Ez heval û dostên xwe yê berê dibînim, di mabeyna me de ferqeke mezin heye. Ew ferq ji ku tê? Ez dibêim ji hoyên Awrûpa, Kultureke din, zimanekî din. Li Awrûpa em hînî pir tiştan bûn û ez bawer dikim, Awrûpa ji bo me rolekî pir pozîtîv dilîze. Hêdî hêdî em dibînin senatkarên wana çawa dişuxulin, xwe çawa li şuxulê xwe li karê xwe konsantre dikin. Em senatkarên Kurdan xwe li tiştê xwe konsantre nakin. Belê şixulê wana heye, muchûr kar bikin, ku perê nan derxin. Ne wisa? Nivîskar him polîtîka dike, him dişuxule, zarokan va mijul dibe, him mamostatî dike. Yanî ew hemû bi hev ra nabin. Zahmet e. Ew weha nikare xwe li karê xwe, li nivîsandina xwe konsantre bike. Gelek kes li vir hêdî hêdî hînî van tiştanan bûn. Berê wana tiştê xwe tevlihev, perçe perçe dikirin. Niha ew warê kar û bar ji hev diqetînin, pîranî li ser karê xwe yê hunermendiyê mijul dibin, polîtîka, îdeolojî û hunermendiyê tevlihev nakin. Lê belê ew ne dûrî polîtîka rojane ne. Ev jî ev tiştêkî baş e. Niha pirê wan xwe konsantre şuxulê xwe dikin.

H.D.:

*Ew tesîrên surgûnê yên baş in.*

N.A.:

Lê dîsa jî divê meriv aliyê surgûnê yê din ji bîr neke. Surgûnî tiştêkî pir xirab e. Dilê mirov dişkîne. Lê îfadekirina wê pir dijwar e. Dilê min çawa şikestiyê. Çima mirov nikare biçê welatê xwe? Dê û bavê xwe, meriv çawa nikare ronahîya Kurdistanê bibîne. Li welat ronahîke wisa heye, meriv kare ji hezaran km. dûr tiştan bibîne. Li Awrûpa tiştêkî wisa tune. Em biçûktî wisa hînbûne. Gava ev ronahî ne be, ji bo me tengahî ye. Em mecbûr man, hatin vir. Mirov dixwaze azad be. Çima, me çi kiriye? Him wê derê bibîne, him van deran. Çima na? Pir kes hîn jî nikarin biçin. Yanî surgûntî ewqas tiştêkî xweş jî nîn e. Em bi kêfa xwe nehatine van deran.

H.D.:

*Baş e, emê bên ser wê. Mesela surgûnê. Ez bawer dikim ew kesên ku hatin surgûnê û di van hoyên dijwar de berhemên bi kêrhatî dikaribûn biafirandanan, bi gelemperî ew kesên ku dikaribûn Kurdî û zimanê wî welatê ku ew lê dijîn,*

*fêrbibûnan in.*

N.A.:

Ev tişteki zahmet e. Lê çi dimîne ji bo min? Ez hatim vir. Him zimanê Kurdî nizanîm, him zimanê vana. Ez mecbûr im zimanê van jî fahm bikim. Lê zimanê xwe gerek bermedim. Teorîkî heye, dibêjin em li vir dijîn gere em pêşî zimanê wan fêr bibin, paşê kurdî. Ha hîn bibin, hîn bibin. Tu dinêri panzdeh sal çûye hîn jî zimanê Kurdî hîn nebûye. Nabe. Yanê em zimanê Kurdî gere atraktîv bikin. Meriv gere bi zimanê Kurdî karibe pere jî qezenç bike. Ji her alî va. Bi zimanê Kurdî divê meriv filman jî çê bike. Bila zimanê me jî bikeve sînemê. Çima na?

H.D.

*Kesên ku li surgûnê fêrî zimanekî biyanî bûn ew ji wan re bû wek şibakakê.*

N.A.:

Tesîra surgûnê li ser kesên ku zimanên Awrûpayî fêr bûn, pozî-tîvtir bû. Ezê li vir nimûneyekê bidim. Gava em li Tirkîyê bûn digotin, hozanên ku derin Awrûpayê dengê wan xirab dibe. Ez dibêjim berovajîya vê rast e. Disan li Tirkîyê 12-13 salan berê digotin, dengbêjekî gelêrî dersên şan hilde yanê dersên deng yê modern hilde, dengê wî xirab dibe. Ew tişteki şaş bû û şaş e jî. Meriv dersên şan distîne, meriv dikarê dengê xwe û hunerê xwe bi zanetir bikarbîne. Ne bi tesadûfî û şaş nefesa xwe hilde. Divê meriv berovajîya vê bike.

H.D.:

*Gelek çaran merov dibihîze ku tê gotin, dibên ew kesên li dervayî welêt reviyane. Bi van gotinan dixwazin wan kêr bikin. Dibêjin ew ji bo welat tişteki nikarin bikin. Lê dengî din jî tên: Berî niha bi çendakî Dr. Cemşid Bender di nameyek xwe de ya ku wî ji Nûdemê re şandibû, weha dibêje: "Bi xebata ronakbirên Kurd yê li Siwêd, ev deh salek e ku edebîyata Kurdî geş bûye. Ez wilo bawer im ku di pêşerojê de wê xebata we bi navê "dibistana Swêd" di dîroka me de cîh bigre.... îro jî em dibînin ku serîyê kar û xebata çandî li welêt dîsa hevîjadê me, Kurdên li Siwêd dikişînin." Gelo tu çi difikirî ?*

N.A.:

Ez ji van gotinan qet hez nakim. Pir kes hene, muheqeq reviyane jî. Wisa bi kêfa xwe. Meriv nikare hemûyan ra bêje. Tu merivê me nî nî, tu li Kurdistanê tişteki nakî. Sibê dusibê ez biçim Kurdistanê, ez naxwazim mina wan bibim. Ez çawa bim, wisa me. Ew dixwazim em jî biçin mina wan bikin. An jî em dixwazin ew mina me bibin. Wisa nabe, ev şaşîkî mezin e. Lê gerek ew vê yekê jî bîr nekin. Li Awrûpa rastî ji bo kultura Kurdî tişt çê dibin. Ne tenê li Awrûpa, li dervayî welêt. Li Ermenîstanê, li Gurcîstanê heta Awûstûralyayê ji bo welat herkes, em

hemî kar dikin. U yek derdikeve dibêje, "na, ewana ne tişt in!". Meriv nikare bêje, li Kurdistanê her tişt baş e, yan jî li derva her tişt xirab e. Mîsal li Awrûpa derew tiştêkî pir şerm e. Jina min Alman e. Gava telefon ji bo min dihat, min digot "bêje ne li vir e." Wê destê xwe dida ser ahîzê û digot "ezê çawa bêm tu ne li vir î." Gava li Kurdistanê be çi dikin? Dibên "welleh ne li vir e, çûye çarşiyê." Ev mîsaleke piçûk e, meriv li vir hînî tiştê wisan jî dibe. Lê meriv li vir hînî tiştên xirab jî dibe. Hevalin ji welêt tên, em pirs dikin, ew dibên rewş pir xerab bûye. Di vê xirabbûnê da eskerê Tirk rolekî mezin dilîze. Lê belê gelo di vê xirabbûnê da roleke me Kurdan a negatîv jî tune ye? Divê em li ser vê yekê jî bisekinin. Divê kî ku xar dimeşe gere xwe rast bike. Jiyan nasekine, tim dimeşe û dibuhire. Em dibînin îdeologan çawa bûn. Sosyalîzm tiştêkî xirab nebû. Wan lê îxanet kir, li welatê sosyalist. Dîwar kişandin dora xwe. Çima? Çima wisa bû, çima demokrasîk wisa azad tunebû? Herkesî çima nedikarîbû fikrê xwe bêje? Ew ji bo Kurdistanê jî wisa ne, kî dibê şertên dinê û şertên Kurdistanê ne wek hev in?

H.D.:

*Min di "Azadî" û rojnameya "talyanî L'Unita de xwend ku te dil heye ku tu vegeerî welêt. Rojnamevana İtalyan Roberta Chitî dibêje, "Hêviya wî ev e ku filmê xwe rê kesên li Kurdistanê bide." 3 Di Azadî da jî te weha gotibû, "Min ev film ji bo Kurdan çê kir. Ez dixwazim bi filmê xwe re biçim Tirkiyê û wî rê bidim. Lê ku hukumeta Tirk ji tirsê re newêribe filmê min bide rêdan, ezê herim çî? Ji bo hunermendan cîhekî demokratîk, dinyayek bê qedexeyê pêwîst e. Ji ber ku film bi Kurdî ye, ew li Tirkiyê qedexeyê ye. Gava hukumeta Demirel netirse, wê cesareta ku film bide rêdan, rê bide, ezê bi dilxweşî vegeerim û li Tirkiyê xebatên xwe yên hunermendî bidomînim."* 4

*Tu dikarî planên xwe yê li ser vegeerî welêt ji me ra bêjî?*

N.A.:

Mesela vegeerî welat tiştêkî muhîm e. Yanê ez bawer nakim ku Kurdek heye, ez ji bo hunermendan xeber didim, nexwaze biçê Kurdistanê. Belkî mirov hene, dixwazin him li Kurdistanê bijîn, him li vir. Kesên wisa hene. Ev tiştên însani ye. Ez bawer dikim pir kes hene ditirsin. Surgûntî wisa zahmeteke mezin bû, jiyanêke zahmet bû. Pir kes hene biçê Kurdistanê wê dîsa xerîb be. Yanê jiyanek nû dest pêdike. Jiyanêke nû tiştêkî zahmet e. Binêre, li Kurdistanê kes hene, malê xwe difroşin ji Dêrsimê diçin cîhekî din. Ev dîsan jî zahmet e. Em ji welat hatin heya vir. Li vir em hînî jiyanêke nû bûne. Em xeyala jiyanê li Kurdistanê dikin. Tu zanî, di xeyala me da tim Kurdistan heye. Ev qet rehet nîn e. Ev aliyekî surgûnê yê hazîn e. Kesê surgûntî neditîye, nikare li ser wê xeber bide. Loma ez dixwazim biçin Kurdistanê. Çima na? Di fikra min, di serê min da ewqas tişt hene, ewqas proje hene. Lê ez difikirim, gava ez biçim, gelo ez dikarim van tiştan pêk bînim. Ku ez herim Kurdistanê, ezê karibim filmê xwe yê nû li wir

çê bikim. Çima ez çûm, min li Ermenistanê film kişand? Her tişt li Kurdistanê heye. Lê wira tişteke tunebû ji bo min. Gelo ew azadiya film çêkirinê ezê li Kurdistanê bibînim? Tuneke, herkes dizane. Ez ji bo xwe xeberdim. Ev waxt û çihê ku ez lê me, pir biber in ji bo min. Rojek berê rojekê ez dixwazim tiştên xwe bi awakî xweşik çêkim, berî ku ev firsend ji destê min derkevin. Rewş tim wisa namîne, jîyan jî tim dimeşe. Ez dixwazim, karên xwe zû bi zû çê bikim. Da ku rojekê milletê min bêje, eva çû, dilê wî ewqas şewitî, lê dîsa jî ji bo welatê xwe tişteki kêrhatî çê kir.

H.D.:

*Ez bi xwe di karê rewşenbirî û bi taybetî di yê hunermendî de kurtinîtetê pir giring dibînim. Pir caran hunermend û nivîskarên Kurd radibin çend berhemên biqîmet diafirînin, lê ji ber ku di wî warî de karê xwe berdewam nakin, dem tê ew tên ji bîr kirin. Di dîroka neteweyan de ev tiştên wanî windabûnên mezin in. Gelo piştî kilamek ji bo Beko tu projeyên te ji bo pêşerojê hene?*

N.A.:

Erê, hene. Vî filmî pir tecrube da min. Min ruhê film fam kir. Li ser van tecruban ezê gellek tiştan çêkim. Lê ez naxwazim projeyên xwe yên ji bo pêşerojê niha bibêjim.

H.D.:

*Çima na?*

N.A.:

Ma mihum e?

H.D.:

*Tu dizanî.*

N.A.:

Sala bê ezê dest bi du filman bikim.

H.D.:

*Tişteki din heye ku tu dixwazî ji xwandevevanên Nûdemê re bibêjî?*

N.A.:

Ez pir kêfxweş im, Kurdî min tim kêfxweş dike. Ez îro Nûdem cara yekemîn dibînim. Respekt ji bo kesên tê de dinivîsînin. Pir baş e, ewqas entellektûellên Kurd tê de dinivîsînin. Gava meriv Nûdemê digre, gelek kes tê da hene. Hinek ji Ermenistanê, hinek ji Awûsturalya, li Awrûpa. Ew wan hemûya tîne ba hev. Meriv dikare di hejmarek Nûdemê da nivîsên van hemûyan bixwîne. Ev tişteki





pir xweş e. Çiqas kovarên me wek Nûdemê zêde bin, ewqas hêvîyên me jî zêde dibin.

Ez serfirazî û jiyaneke dirêj ji Nûdemê ra dixwazim.

H.D.:

*Pir spas..*

N.A.:

Spas xweş be, ez jî pir spas dikim.

---

1) Özgür Gündem, 27.08.1992, Stembol., 2) Yeni Ülke, Hj.43, 1992, Stembol., 3) L'Unita, 09.09.1992, Venedig., 4) Azadi, Hj.16, 1992, Stembol.

# RASHATINA LI LAÇÎNÊ

Tosinê REŞÎD



Stûna bêtone, ku li ser bi tîpên mezin "Laçîn" nivîsandî bû, avêtibûn. Lê dîsa jî çend kesan ew texmîn kir û di otobusê de bû hêwirze: "Ev sînorê Kurdistanê ye".

Xêlekê şûnda em peyayî geliyê Zabûxê bûn, em ji binê gêlî bi riya berware, çivane hilkişiyên hafa gêlî. Paşê dîsa newal, topik, heta ji dûrva Laçîn xuya bû.

Min berê tirê rasthatina min ê tevî Kurdistanê lap taherekî mayin be. Niha di otobusê da rûniştî derva dinihêrim, lê tu tişt ji bo min ne balkêş e. Çiya, gelî, mêşe, çem, kanî, zang, divek hema eve Kurdistan? Lê ez texmîn nakim, ez li dor berê xwe dinihêrim, hundurê xwe digirim, lê

tişteki wekî min ji vî welatî ra, vê axê ra bide girêdan nabînim.

Ezî xemgîn im, dudilike xayin dil û canê min dixişivîne, tebatiyê nade min: "Dibe rojek bê û ez di dilê xwe da ewa mezin jî nebînim. Ne axir min tirê eva jî timê di dilê min da ye. Dibe ew gişk her tenê li zarê me ye û roja xeder em ê ji wê jî vekşin? Ne axir ev jî Kurdistan e, ne axir di nav dil û canê me da ciyê vê Kurdistanê jî gerek hebûya".

Ez di nav van mitalan da, otobusa me peyayî ser Laçînê dibe. Pêşiya me dîsa gelî ye. Di binê gêlî ra çemekî gelek mezin dikîşe. Xortê kêleka min, wekî bi xerîtê evê navçê ezberî zane, bi şa dibêje: "Eva jî çemê

Hekarî”.

”Çemê Hekarî!” Ev gotina mîna mûmekê fikrê min ronahî dike û ev welatê gavekê pêş da ji bo min dûr û nenas, dibe welatê min, dibe meskenê min, dibe Kurdîstana min. Her tişt li ber çavên min tê guhastin. Niha ez li dorberê xwe dinihêrim û bi xwe jî nizanîm çawa min berê texmîn nedikir, ku çiya û gelî, kendal û zangê ha tenê li Kurdîstanê dikarin hebin.

Hekarî! Gelo ew kî bûye, kîjan pêşî bûye, ku ew nav di dilê xwe da parastiye, xweyî kiriye, aniye derxistiye vira û daniye ser vî çemî? Gelo bi çi hesîn, hisretê wî ew nav li vî çemî kiriye, ku ew nav tu car nayê ji bîr kirin, ku ”Hekarî” heta-heta li ser zar, neví, nevíçirk, çirçirk û peyhatiyê wî yên mayin be. Gelo ew canîer li ku çelkiriye? Divê ku gorra wî bikine ziyaret, parêstgeh.

Otobus li ber çemê radiweste. Ez peya dibim, diçime ser avê. Wek ku kivrê dibe, li çiyê baran barî ye, ava çemê şelû ye. Lê çi xem, tiştê bûyinê ye, ku kurdekî ji xerîbiyê bê devê çemê Dicle û ava Dicle tem neke, ser çavên xwe bi ava Dicleyê neşo. Ku kurdek cara pêşin here devê Feratê û ava wî tem neke, ser çavê xwe bi ava wî neşo.

Ez qûz dibim, bi ava çemê Hekarî ser çavê xwe dişom, kulmek ava çemê Hekarî vedixwim. Hinek hogirên min jî peya dibin, dest û çavên xwe bi ava çemê Hekarî can dikin. Em zûtirkê dîsa bi rê dikevin.

Eva jî Laçîn, Pîrecana berê, serbajarê Kurdîstana sor. Bajartemam pêda pêda çiya û banî, top û newal in. Erdê rast tune: zang, kendal, zinar in.

Lê xelkê bajêr zang û kendal şikênandine û li ser wan ji xwe ra xanî avakirine. Berpalê çiyana heta qotê wan temam xanî ne. Çiya û baniyê bajêr tev bi darîstanê xemilandiye, bajar bi xwe di nav bax û baxçan da winda bûye. Li her alî xule xula avê ye. Lê Laçîn niha vala, şewitî û wêran e. Bi jimara sala 1926’an vir da 42 hezar kurd hebûn, navça Kurdîstanê ya otonom hebû, bi dibîstanê kurdî, bi pirtûk, radyo û rojnama kurdî. Lê bi jimara sala 1979’an li Azerbeycanê kurd tunebûn.

Û niha ez ketime kolanên Laçînê û şopa kurdîtiyê digerinim. Erê, min çemê Hekarî dît, min bawer kir, ku ev Kurdîstan e, lê paşê? Paşê ez ê Kurdîstanê di nav çî da bibînim?

Li her derê, li ser xaniya, li ser deriya, li ser nîşanên devê rê bi zîmanekî nenas û xerîb nivîsandine, kovar û rojnamên der û dora min bi zîmanê xerîb, nenas in. Ya rebî! Lê ka Laçîna kurdan? Ka Laçîna serbajarê Kurdîstana sor? Çawa bû, ku di nava çil, pêncî salî da Azerbeycanê li Kurdîstana sor kurdîti kokbir kir? Ew ne tişteki bûyinê ye. Dîroka kurd û Kurdîstanê dide kivrê, ku ew tişteki hêsa nîne.

Navbera Gorîsê û Laçînê qereqol danîne. Nahêlin çek û sîlehan ji Qerebaxê bibîne Ermenîstanê. Em li qereqolê ne, jîneke ermenî ji Gorîsê, 60-65 salî, pêlavên xwe êxistine, li kêleka me rûniştiye, hêsa dibe. Kamyoneke bi darê banê xaniya barkirî jî ji aliyê Laçînê tê û diçe Gorîsê. Jinika ermenî gava kamyonê dibîne, bi keser dibêje: ”Hûn erdê sar da herin, lê hûn şerm nakin malê kurdên me talan dikin.” Wisane çiqasî jî

serokê Azerbeycanê kurdê Laçînê çawa Azerbeycanî nîşan kin, çiqasî jî hinek ji wan bêjin em Azerbeycanî ne, lê dîsa jî ermeniyê cînar wana çawa kurd nas dikin.

Û niha ez bi kolanên Laçîna şewitî ketime, li kurdîtiyê digerim. Eva jî xaniyê rojnama "Laçîn." Çar sal berê berpîrsyarê rojnamê Huseyin Mialim çay dabû ber min û bi zimanê ûrisî dixwest bi min bide bawer kirin, ku li Azerbeycanê li ser kurdan tu zordarî tune ye. Lê paşê li kebabxaneke ji bajêrder, piştî vexwarina çend kas araq, hêsir ketine çavên wî û çend xet ji dîroka kurdî stiran. Dîrok ya aliyê wan bû. Û min texmîn kir, ku ew bi wan hêsrâ, bi wê dîroka melûl şîna kurdîtiya xwe ya ziman şikestî dike.

Peyre ez ê carekê jî Huseyin Mialim bibînim. Dema konferensa kurda li Moskovayê, sala 1990î. Ewê dîsa rabe û bêje, ku rewşa kurdan li Azerbeycanê baş e, kurdû Azerbeycanî bi hev re mîna biran dijîn. Lê ev êdî ne ciyê wan gotinan bû, xortê kurdan yên xwîngerm fitandinê û nehiştine gotina xwe temam bike. Êvarî li mêvanxanê wê dîsa Husên Mialim bigirî, lê kesê wî aş neke. Kî zane, dibe ku ew hêsir dil û canê wî pakij bikin, hîsên kurdîtiyê di nava wî da hişyar bikin.

Qumandarê desta fîdayê ermeniya, ku gundê wan li ser sînorê Laçînê ye, ji me re dibêje: "Em kê li bajêr hêsrî digirin, dibêjin em kurd in. Ew zanin ku kurda xwe ra dijmin hesab nakin. Bav û kalên me bi sedsalan tevî kurdan cînarî, dostanî kirine. Rast e, ev çar sal in em di nava şer de ne, lê heta van çend mehên paşîn jî çûyin-hatina gundiyeên me û kurdên

Kaşîşkendê hebû."

Ev çi zilam e, merivê kurdî di nav van çiyân de ji diya xwe bûye, di nav van çiyân da mezin bûye, çawa dikarîbû ewqas zû bişkê, ewqas zû zimanê xwe wînda bike. Ne axir heta sala 1926'an li temama navça Laçînê tenê 108 meriv ji wî mîletî bûn. Ew mîletê ku navê xwe jî rast nizane. Pêsiyê teterê Kafkasê bûn, paşê bûne tirk, peyre azerbeycan, paşê azerî û niha jî dîsa dixwazin bibin tirk.

Û ez ketime Laçînê, mîrata kurda, li kurdîtiyê digerim Ez li tiştêkî wisa digerim, ku vê axê bike Kurdistan, vî bajarî bike serbajarê Kurdistanê sor. Li çend ciyan misîne avê li ber çavên min dikevin. Dikeve bîra min ku etnograf T. Arîstovayê li kitêba xwe ya "Kurdê Pişkavkazê" wêne van misîna aniyê û nivîsî ye, ku ev derdanê kurdê Laçînê ne... Lê gelo ev misîna tenê di malên kurdan da hebûn?

Dengê xortekî me min ji nav wan mitalan derdixe:

-Apo, hela were, me maleke kurdan dîtiye.

Mala kurdayê bi çi bê xanê? Bi emenî û xalîçên kurdî? Eger xweyê wan dema revê ew hiştibin jî, niha xelkê talan kiriye. Bi kincê kurdî? Ew jî dûrî aqilan e. Çiqas ez zanim kesî li vî bajarî cilê kurdî li xwe nekirine.

Ez ber bi wê malê diçim. Agir berdane malê, lê gişk neşewitiye. Mal serûbinî hev kirine. Li ser erdê tijî kitêb in; bi zimanê ûrisî, azerbeycanî, îngîlîzî û di nava wan da kitêbên kurdî. Em ketine nava kitêban û yên bi kurdî dijmêrin. Em li Laçînê wisa kitêbê kurdî dinihêrin, çawa meriv xerîbekî xweyî çend sala windakirî bibîne.

Kitêbên bi zimanê kurdî, kitêbên di derheqa kurdan da pir in. Çawa tê kivişê xweyê malê kurdekî baş bûye, pêşewitiyê çanda millet bûye. Li quncikek malê rojname "Riya Teze" sal bi sal cihêkirî, bi hev va dirûti danîne. Belê, li vê malê qedrê qelema kurdî zanîbûne, li vê malê serê xwe li ber zilm û zorê xwar nekirine, neşikestine. Em di nav kitêban de rastî çend naman tên. Nameyên Qanadê Kurdo, Heciyê Cindî, nameyên ji rojname Riya Teze. Di nava wan naman da reş çend erza, ku salên cihê, kurdan bi wan derd û kulên xwe gihandine hukûmetê. Ji wan erza yek rûniştevanê gundê Lênînkendê (bin navê çawan da zilm kirine) ser navê serokê Sovyeta tewre bilind, ya Yekîtiya Komarê Sovyeta Sosyalîst ya Podgronî û serokê Sovyeta Azerbeycanê ya tewre bilind Xalîlov, şandine. 43 rûniştevanê wî gundî ew erza îmze kirine. Ez dixwazim wê erza ha li vir binivîsînim.

"Bi nivîsandina vê erzê em dixwzin hûn hay jê hebin ku em kurd in, dê û bavê me kurd bûne, kalik û pîrikên me kurd bûne. Li gundê me Lênînkendê (Keşîşkenda berê) hetanî sala 1937'an dibistana bi zimanê kurdî hebû, zarokên me hetanî hingê bi zimanê xwe yê dê, bi zimanê kurdî xwendine. Lê peyra, bi menê me va ne eyan ew dibistan hatiye dadanê. Hema wê salê jî gundiyê me, ku tamam kurd in, çawa azerbeycanê hatine nivîsîn?

Wexta jimara rûniştevana, sala 1969'an gundiyê me gişka, du hezar merivî zêdetir, xwe kurd nivîsîn, lê dîsa jî hukûmetê ew azerî nîşan dan. Lê niha, gava di welêt da paseport

diguhêzin, gundiyên me dixwazin, ku di paseportên wan de ne azerbeycanî, lê kurd bê nivîsandin. Em pîrî caran berbirî îdarê de anegor bûne û me tika kiriye, ku di paseportên me da, di mêtirikê zarokên me da binivîsinin kurd. Lê ew jî timî dibêjin, ku di destê wan de, ji bo ku me kurd binivîsinin tu hîm tune ye. Bi malûmatên di destê me da heyî li komara Asya Navîn, li Gurcîstanê û li Ermenîstanê jî kurd hene û wana çawa kurd nas dikin, di paseportê wan de kurd dinivîsin. Lê çawa dibe ku kurdên li komara Azerbeycanê dijîn azerbeycanî têne nivîsandin. Em bi wê pirsê çend caran berbirî Sovyeta komara Azerbeycanê ya tewrî bilind, wezareta karê hundur, wezareta edaletê bûne, lê me tu bersiveke makkirî nestandiyê.

Niha, loma berbirî birayê xwe yê mezin dibin û tika dikin, ku alî me bikin. Em bawer in ku hûn ê alîkariya anegor bidine me."

Na, kurdên Laçînê ne şikestî bûne, neşikestine û wê neşikên. Dengê xwîna wan di guhê wana da bûye û nehiştiye ewana bi nêynim-nêynima biratiya derew xew ra herin. Biratî û dostaniya milletan tenê di qewl û şerdên wekhevîyê de dibe, gava mafê milletan wek hev in. Lê gava yek nehêle zarokên te bi zimanê xwe yê dê bixwîne, kurdîtiya te înkâr bike, bi zorê te tirk û azerî binivîse, gava nehêle tu serbest çanda xwe pêşda bibî, ew ne biratî ye, ew dijminatîye.

Û bila îro hinek hezar tûtika nekine devê xwe, pesn û methê wê biratiya derew nedin. Em ji wan bawer nakin.

# EM BÎRANÎNA HUNERMENDÊ ŞÎNIYAN MEHEMED ŞÊXO DI TENÊTIYÊ DE JI BÎR NEKIN

Mervanê KELEŞ



Belê delal, em ê te şiyarkin ta tu  
"bîke şînî bo me hemiyan"(1)  
Zelal tê dengê te û dîsan Adara bêbext  
tê û dîsan bîranînê kurdan, êş û şewata  
vedikin. Mirov nîzane ji ber çî vê  
mehê ewqas şînî û şahî bi ser me de  
anîne û herdem şahiyên me bi şînê  
xemgîn kiriye.

Niha bîranîna te ya çaran e û  
hîn jî gora te weke xwe dimîne. Tu  
deng ne jê re tê û ne jî jê tê. Ala ku te  
xwe jê re dikir geda hê jî li ber serê te  
nehatiye hildan. Belê hunermendê  
mirov û mirovahiyê, hîn em li bendene  
ku em gora te biguhêzin ber siya çiyakî  
Kurdistana te, ji ber ku ji guhê me

nakeve dengê te: " Gora min çêkin li ber siya çiya"(2)

Bi rastî dema tu tê bîra min, berî her tiştî tu wek mirovekî mêrxas û dilovan tê ber çavên min û tu di dilê min de dijî. Anha, di vê kurtenivîsa ha de ez nikarim weke ku ez dixwazim te bi bîr bînim. Ev demeke ku ez difikirim li ser jiyana te nivîsareke dirêj binivîsînim, te bi herawayî weke mirov tê de bi bîr bînim, lê niha vaye adara bêbext hat û ez bêçare mam ku ji bo hejmara pêncan ya NÛDEM'ê û ji bo bîranîna te ya çaran bi lez nivîsekê amade bikim.

Hunermendên welatan REWŞ û DENGÊN wan in, welatekî bê hunermend wek deşteke ziwa û wêran e.

Ger em li dîroka Kurdistanê binêrin em ê bibînin ku hunermendên mezin û navdar hebûn û hene, tevî ku dijmin bi sedsalan e ku dixwaze kultur û edebiyata kurdî ji holê rake, lê digel vê jî her dem xaka Kurdistanê nemir toven rewşenbîran çandiye.

Di pêvajoyê de rewşenbîr weke mêwe li dara çanda kurdî ketine û bi zanebûna xwe tariya demê bi şewq kirine. Di dema jiyayî de yek ji wan rewşenbîr, hunermend û muzîknasê mezin û nemir Mehemed Şêxo ye...ku di vê dema dawî de xwe wek spîndarekê di çanda kurdî de çandiye.

Di bîr û bawerîya min de kurd çiqas Mehemed Şêxo bi bîr bînin û hunerên wî geş bikin û biparêzin, dîsan ew deyndarên wî ne.

Bavê Felek... belê qurban, tu namirî, her wekî ku wê pira piştîxûz û bi gopal ku bi dû laşê te bi rê ve diçû û di ber xwe de dilorand û digot: "

Namirî bejna çiya, namirî"...

Hunera te ya giranbuha ji çand û dîroka Kurdistanê te naçe û wê hertim tê de bijî.

Xwezî- lê xwezî mîratê nayê cî- tu bi qasî çarîkekê ji gora xwe rabûya û li der û dora xwe temase bikira, ka gelo te ê çi bo me bigota!?!..

Qamîşloka porkur û sêwî ku çavên xwe bi dengê têlêl dilê te re bi kilê sibhanî gulgulî dikir anha di nava barana hêsirên poşmaniyê de maye, li ser xaçirêkên Qamîşlo bi dû çûna te de gavên dirêj, bi rûmet û bi xwe bawer mîna gavên te hê jî bi rê ve neçûne, lê her sibeh Qamîşlo porê xwe şeh dike, xwe paqij dike, hemû xeml û xêza xwe bi ser bejna xwe de berdide û di bendemana te de rûdine.

Qamîşlo her êvar derbasî oda BÛKANIYA xwe dibe û li ser bêmiradiya xwe û te digirî û ji nû ve qûçên felekê datîne.

Berî ku Qamîşloka te derbasî livîna xwe bibe balîfa te jî amade dike, tembûra te li ber xwe dirêj dike û dikeve nav xewnên xwe û te; Şîlanana li ber xwinava kaniyan diçîne, gemiyên hêviyê bi rê dike, destên rêwiyan dihejîne û bi dilovanî wan bi oxir dike, genimê sînga xwe bi aşê felekê re dihêre û bi ser goristana te dadike. Tara xerbî bêriya te kiriye, Elîfero, Camiya Qasimo, Aşê Bûzê û qûçanên HILÊLÎKA xopan ku gul û beybûnên xwe li ber serê te civandine.

Zîndanên Qamîşlokê bi dilsojî dixwazin ku çend rojan bi mêhvandariya te mijûl bibin û rûwên xwe yên reş û gemarî ji nû ve li hember te spî bikin...!

Dost û hogirên te vaye dîsan

man bêhêvî, çav li rê û li ser talriya te keseran dikşînin û şaxê zeytûnê ev cara çaran e ku ji bo koçbariya te ji nav wan bêdil li ba dikin. Pêşîra mîrata MÊRDÎNÊ li ser hewar hewara bi dû darbesta te de xûz bûye û diponije, tiştêkî ji hev dernaxe, sînoren lewîfî beşdariya we qedexe dikin û dîsan di perîşaniya xwe de dimîne!

XECOKA yar tew lal maye û dibêjin ku bênderên xwe bi dû çûna te re agir berdayê û gayên wê yên cot qidûm nadin ber xwe û ber bi zeviyên wê yên beyar de naçin.

Wê sala ku te çavên xwe li Xecokê vekirin, gotin ku saleke tev ba û baran bû; ew çend salên zarokî ku te li wir derbas kir. Xecokê di rengekî din de bû. Şahiyên xwe bi te dikir û çirên malbatên xwe bi te dadida û dergûşa te li ber çîrokên Rovî û Keroşkê, Bizinê û Gur, Kela Dimdim û wêrankirina Dêrsimê dihejandin.

Kesek ji Xecokê pê ve nizane çima di salçêbûna te de Qitik bêhawe pirr bûn, Qulung bi refan dihatin gund û bihara xwe bi te re derbas dikirin û dema ro dikete tenga esrê de devê kaniyê bi te re vedikirin û pembo av didan... Car çaran li ser milên te çend kevokên biroqankî hêlîna xwe vedidan û hêkên xwe tê de dikirin û dema Xecokê di nav havîna tije rok de dima, çêlikên kevokên te rengorengo bi firê diketin û berê xwe didan qûnaxa çiyayê Agirî û pêre silav li ezmanê welat belav dikirin.

Bi şûnde te xaçirêkên Xecokê saz kir û derbasî livîna dîrokê kir. Te Xecokê navdar kir.

Hunermendê me...te çiyayên Kurdistanê dixist nav pêçeka şîniyê û

di hêlîna dilê xwe de dilorand. Bi tiliyên te yên dirêj û nermîn awazên bêkes û jaran weke bayekî hênîk ezmanê evîndariya welat û gel tev da. Çend salî bû tu dema hewqas lehiyên şînê di dilê te de cih girtin û cenga wê baskên rivînê tê de livandin?

Carna ez ji xwe re dibêjim, gelo çima dengê te bi şîniyê mişt e? Ta dema te bo şahiyê jî distira, bêhna şîniyê bê sînor difûriya! Hinekan jî digotin: "Heger Mehemed Şêxo weke ku tê gotin gelekî jar e, çima ew tim bedil û gerefêtên bedew li xwe dike û çawa bi bedil û bi gerefêt li ser wêranbûna Kurdistanê distirê?" Tew lê lê...!

Gelo ew karîbûn têbigihêjin ku M. Şêxo çi ji bo pêşketina dîroka kurdî daye û dide? Lê ji ber ku wî serê xwe ne ji wan re û ne jî ji tu kesî din re danetanî û ji ber ku wan jî tu kêmasî tê de nedidîtin, rabûn ev rexna "mezin, kûr, giran, û cihgirtî" lê kirin, ji bo ji xwe re jê fêr bibin û hunera xwe pêş ve bibin!

Xuyaye ku "Cidanof" li Kurdistanê ji nû ve peyda dibe! Lê ji ber ku M. Şêxo mêrxasekî neditewiya, merd bû û pê re jî mirovekî dilovan bû, li ser wan kesan wer digot: "Dev ji wan berdî, ew ê bi nezaniya xwe bimirin, yan jî biteqin, lê dîsa jî dilê min bi wan dişewite, ji ber ku ew kurd in".

Lê bedaxewe û sed heyf û mixabin, ku ew kesana beşdarî meşa li dû darbesta wî jî nebûn!

Tiştên wî yên kesanî ku min ji wan hez dikir ev bûn, welatparêziya wî ya bê sînor, mêrxasiya wî ya ku neditewiya, merdiya wî ya ku li tu



sînoran ranediwestiya, dilfirehiya wî ku wek deryan bû û karîbû hewqas derd û eş tê de veşêre û di dawî de nefediya wî ji tu kesî, kêmasiyên her kesekî jê re eşkere digot û dîplomasî qet bi kar netanî. Gava yek ji me xortan bûyerek bi serî de bihata, me digot bûye weke Mehemed Şêxo ku ne ji kesî ditirse, ne ji ji kesî fedî dike.



Qamîşloka Bavê Felek, îro rûpelên bîranînê dîsan te ser û bin dikin; darên tuwan rehên xwe berdidin ser ava bîranîna te û bingeha jiyana xwe pê nuh dikin. Endeko û kulîlkên Ferhad û Şêrîn bi têla tembûra te re dilivin û leylanan tînin semayê. Lîstika tiliyên te li ser gerdena tembûrê dîsa Qendîl serçok dike û dike ku pêlên Wana dilpak ji kûr ve geryana xwe li qiraxên Dêrsimê bide.

Carna ku دنیا li serê te teng dibû, te digot: "Ez behr im, ger ez ne behr bûma ez ê ewqasî nejiyabama". Qey te zanîbû ku tu ê zû ji nav me bar bikî? Anha ew şevbuhêrkên te yên xweş mîna bilûrekê bi şewat ku ji binê çiyayekî dûr ve bê, tên bîra min û hêsirên min diherikin.

Te digot: "Ta felek jî bi me re xizaniyan dike", û te navê keça xwe kir Felek, loma ev bû pîrsek û di dilê min de ma. Lê ez nizanim bê ji bo çî min newêrîbû ew pîrs ji te bikira? Û tu çû lê pîrs ma!



Ger mirov li stiranên Mehemed Şêxo binihêre, berî her tiştî şînî û bi şûnde

kûrbûna maneyên gotinên wan di dilê mirov de birînên bêbinî dikolin; çî stiranên evînî bin, çî jî yên welatperwerî... Di destpêkê de ev hunermend bi xurtî hatiye meydana hunerê, ku em li stiranên wî ên kevin jî vegezin em ê bibînin ku çiqasî bi xurtbûn û zanebûn dest bi riya xwe kiriye û çiqasî jî jîr bû di hilbijartina helbestên ku bi deng û tembûra xwe saz kir û em ê bibînin ku dengê wî ji dil û kezeba wî dertê û bi evîndariya welat û mirovan ve mişt e.

Berî çendakî min kaseteke wî diyarî miroveke swêdî kir; bi dû çend rojan de wê ji min re got: "Min tiştekek ji gotinên stiranên fêhm nekîr, lê ez fêrî tişteki kirim, ew e ku divê hunermend tev mîna wî ji dil û kezebê bistirên an jî bêdeng bimînin".

Yek ji sedemên pêşîn ew bû ku Mehemed Şêxo ewqas zû û xurt dengê wî li Kurdistanê tevî belav bibe ew jîrbûna wî ya bê sînor di hilbijartina gotinên stiranên wî de bû û ya didwan ew şîna mezin ku ji dil û zimanê wî dibariya weke baraneke hûr, sist û ji nişkê ve bi berbangê re bibare û pêre dengê bilûra şivanekî kevnar ji bilindbûna ARARAT bê bû...!

Ez ne rexnegirekî muzîkê me û qet di vî warî de zanebûna min jî tune. Ji ber vê yekê ez Mehemed Şêxo tenê weke mirov bi bîr tînim. Ez nikaribim têkevîm warê lêkolîna hunera wî û ez wî bi bîr tînim. Ji ber ku mîletên ku hunermend û nivîskarên xwe neparêzin di baweriya min de wê ew mîlet ji dîroka cîhanê bê birîn û wînda bibin.

Bavê Felek...Te çawa karîbû hewqas perîşanî hilgirta? Hewqas jarî,

bêxwedîti û derbederîti tu çawa tê de jiyayî? Em tev li hember te gunehkar in, kêmaniyên me di der mafê te de gerek me tevan herdem serberjêr bike.

Du caran tenê em li te xwedî derketin, roja tu vegeriya Kurdistanê biçûk û roja ku te ji nava me bar kir û çû dilovaniya xwe. Ewqas salên dijwar û kor ku bi ser te de hatin, te bi tena xwe, bi dilê xwe yê mezin li ber xwe da û bejna Kurdistanê xwe bi awaz û dengê xwe yê nemir rengîn kir... Ta ku

Beşîr, Mehemed Şêxo awaz, govend û stiranên folklorî baş zanîbû lê stiranên govendan nedigot, ji ber ku kêmanî li dawetan distira û tim digot: "Ez ne dengbêjê daweta me" Heger carna li dawetan stirabe, ew jî ji bê çarî bû. Min bi xwe dîtiye, ku wî awaz, lawik û stiranên folklorî gotine û hinek ji wan li cem min hene, wek: MIHEMEDO, QULINGO... û hinekî din jî hene...! Bi dû de tu dibêjî ku dostên wî yên hunermend nebûn. Lê



kurd hebin ew deyndarê te ne...!

Dibistana te ya muzîk û welatniştimaniyê di dîroka berxwedana welêt de cihê herî bi rûmet girt û wê ew bo nişên dema tê re bê xwendin û fêr kirin.

Di hejmara REWŞENÊ ya 6'an, zivistana 1991'ê kek Beşîr Botanî du-sê rexne li hunermendê me girtine, pêşî, ez wî ji dil û can spas dikim, ji bo ku wî hunermendê me bi bîr anîbû, bi dû de bersiva rexnên wî didim: Kek

ez dibêjim ku ew pirr bûn, an na tu ê jî ne hevalê wî bûya û ez dikarim di vî warî de bi dehan navên din bihejmêrim. Tu dibêjî ku wî ji xwendina kurdî hez nedikir. Bi rastî ez nizamim te ev li ser çî bingehî gotiye, lê gorî ez dizanim wî pirtûk, rojname û kovarên kurdî baş dixwendin û xwendina zaravayê soranî ku bi tîpên erebî û kurmanciya bi tîpên erebî jî zanîbû. Careke din kek Beşîr, te spas dikim ji ber ku te dostê xwe ji bîr nekiriye û te ew bi bîr anîye,

lê ez dixwazim tiştêkî bo te bêjim: Mehemed Şêxo dost û hevalên xwe hildibijart, bi her kesî re nedida û nedistand, ji ber vê dostên wî bi tevayî kêmbûn, lê dîsa mala wî ji her kesî re vekiribû û şevbêrkên wî tim tije û germ bûn.

Di dema dawî de berî çendekî ji çûna Mehemed Şêxo bi ser dilovaniya xwe de TUMARGEHA wî ji alî sîxurên-tevlî ku ew nuh û cara yekem bû ku karekî aweha dike- Sûriyê, li bajarê Qamîşlo hat girtin û hemû tiştên tê de hatin mûsaderekirin bi mana ku wî kaseteke rêxistineke kurdî çap kiriye. Tevlî ku ew rêxistina ha li Sûriyê eşkere bû û bi zanebûna dewleta Sûriyê kar dikir, lê xuyabû ku wan kaset kirin mane, ku pê derbekê li M.Şêxo din!

Digel ku ew di wê demê di rweşeke pîrr nebaş de bû jî û gelek caran jê re hat gotin: "Bavê Felek, tu pîrr kesên mezin nas dikî, ji wan re bêje bila vê problema te hal bikin". Bersiva wî ev bû: "Her kesî li Qamîşlo ev bûyer bihîstiye, ez ji kesekî re nabêjim, ger ew bixwazin ew karin ji ber xwe ve bikin". Ew bûyer wilo ma û wî tu alîkarî ji kesekî nexwest û dema ku me jê re digot: "Tu bi xwe dikarî vê problemê hal bikî", wî digot: "Ez karim lê ez nakim. Ez zanim ku ez carekê tenê herim Komîta Muxabarata (Sîxurên dewleta Sûriyê) ew ê mesela min hal bikin û ji xwe ew jî vê yekê dixwazin. Lê ez vê yekê heta ku ez li jiyane bim ez nakim. Û dawî, ta ku ew çû dilovaniya xwe jî tomargeha wî girtî ma.

Mehemed Şêxo wilo jiyaneke tal jiya. Talî tim beşa wî bû û te digot qey talbûna dinyayê tev ji bo wî çêbûye,

lê tev li wilo jî ew her dem bi rûmeteke mezin bû, serê xwe bo kesî danetanî, tim rûmeta wî mîna bejna wî bilind bû.

Roja bergorkirina wî Qamîşloka wî tev bi dû laşê wî de qoriya; ne zarok, ne pîr, ne jin, ne mêr, ne dar, ne gul, ne kulîlk, ne toz, ne av, ne deng, ne bêdengî, ne mêwe, ne sebze, ne ezman û ne xak, ne Xwedê û ne Ebd li mala xwe neman, darbesta wî li ser destan bilind û bilind dibû, ta ber koça Xwedê, lê bedaxewe, ji ber sedemin ku mirov şerm dike bêje, ew baş li Qamîşloka wî negerandin.

Li ber goristana wî zor û zehmetî çêbûn. Xortên ciwan yên ku rahiştibûn darbesta wî û yên ku li dora wê civiyabûn, li ber gorê ew li ser destan bilind dikirin û nedixwestin ku wî dahijin gorê û her qîr dikirin: "Bijî, bijî Kurdistan. Namire Bavê Felek". Û her û her ew bilind dikirin û weha demeke dirêj hiştin, te digot qey ew li benda hêviyekê ne ku Bavê Felek serî ji darbesta xwe rake, silava spasiyê vede û doza anîna tembûra xwe bike û bi wî awayî çend awazên şînê bilorîne.

Bavê Felek, dara ku te çandiye wê rehên xwe berde ser cobarên Ferat, Dicle û Xabûr û hêrs û dîdara xwe ji wan bigire... "Ferat, Dicle û Xabûr...bi ser bejnê de berdane"(3) Te weha pesnê welat da Welat wê bi çi awayî pesnê te bide?

Ewqas awazên te li ser xwezaya Kurdistanê lorandin, ne şiyar û ne di xew de ji bîra me naçe, çawa em ê ji bîr bikin:

*Bilind e bejn û bala te û li ser taca te ezman e*

*Kitanek reng spî dayim li serê  
zozan û Sîpan e*

*Li jorê kanî û cobar wek ku  
hêstir dibarin xweş*

*Li jêrî te dibînim ez bihişt û bax  
û bîstan e.(4)*

Û em ê çawa ji bîr bikin:

*Cana min cana min  
Tu î êş û jana min  
Kî zane ez kî me  
Bê te çi ye mana min  
Hemrîn û delalê  
Mehabad û Wana min.(5)*

An em ê çawa ji bîr bikin:

*Hey Felek, ka ew sera û birc û  
qonaxêd min*

*Ka rez û bîstan û dar û kanî û  
baxêd min*

*Çîçek û nêrgiz û herijtin tev ji  
bîna sorgulan*

*Sorperî nayên semayê, kanî  
kozaxên di min*

*Qebqeb û dengê kewan nayê li  
ser lat û çîyan.(6)*

Ji ber ku tu bejna çîyan bû û çîya natewin, tenê dema kezeba wan mişt ar dibe, volqanan di bilindahiya xwe de diçînin...Tu jî wer bû; her dem mîna bejna Sersing bilind, bi rûmet û li ser piyan dima. Hunermendekî ji dil û ceger bi evîna welat dikeliya û tîlên sazbandê li ser rîya hevîrtina av û axê saz kir û bi tiliyên nermîn dîlana çîçek û minminîkan bi hev re dada.

Werlêvên te dilivîn: Bila teyrok

sermîni ji çiyê re berçavekê bi libên xwe yê camîni bidirû. Te ji bo hemû bedewiyên Kurdistanê stira; bo dehl, devî û kanî, çemê Xêbûr, xelbexelba Dicle û Ferat di rehên şeraniya şebeşên Amedê de, bo gund û bajaran, kuç û keviran, genim û ceh, nîsk û nok, nesrîn û Şîlan, xalxalok û berberok, sînorên di nav mayinan de hêviya jîne çandine, keleh û çiya, şehîdên ku xwîna xwe tev li xwêdana gel kirine, Ristemê Zalê Zêrîn, Keyxisro û hogirên wan Şêx Seîd, Qadî û Berzanî û bo zerzûr û qitikên deşta Qamîşlo, bo wan heinan te awazên xwe li ser gerdena tembûrê bi RAMÛSANAN dagirt û bi ser bejna Kurdistanê de barand.

Te hewarên welat tev de di êşa çavên xwe de civandin û lêvên birînen wî bi leylanan givaştin. Te xwe avêt pêxêla felekê û xwe jê berneda, te jê re digot: "Yan ez û yan tu" ta ku mîrateke mayî te di nehê Adara 89'an de ji nav destên welat berî çend rojan ku Helepçe bi xerdela mişt istirî û lapûşkê qeşa germ de bihêntje revand! Wey li şensê kurdan be!!!

Heger te Helepçe bidîta te ê çawan ew bi tîlên sazbanda xwe re bihejanda?! Te ê ji kê re bistira? Ji şalûlên ku bi gazên gembûn û bariyan bi ser çîmena di nav bîhna xerdela mîratok digevizî, yan ji bo zarokên di hewarê de li ser derencên mala şînhatî re biloranda, lê carna ez ji xwe re dibêm ku tu ê lal bimaya, ji ber ku tu hosteyekî şîne yî, gerte şîni di ser devê xwe re here / û nelive/ û kêr bighêje kolana hestî, êdî şûrê xwe ji sînga kalana hewarê dikşîne û di ser gerdena şêrîn re dajo...!



ÇEND SALÊN CIHGIRTÎ DI JIYANA  
MEHEMED ŞÊXO DE

Yek ji sedemên pêşketina miletan ew e, ku her nîfşekî dîroka xwe dinivîsîne û yên ku tên bi giranbuhayî lê dinêrin û jê fêr dibin. Yek din jî ew e, ku hunermend, rewşenbîr û kesên bo gel xebatên mezin kirine, wan wek qehremanan herdem bi bîr tînin û cihê herî bilind di dîroka xwe de didin wan; wek nimûne bi zarokên xwe didin nasîn û ji zanahiya wan fêr dibin.

Mehemed Şêxo di sala 1948'an de li gundê Xecokê, li Qamîşloke hatiye dinê. Navê wî yê rastî Mihemed Salih Şêxmû ye. Herdu navên pêşîn ê wî bi xwe ne û Şêxmû navê bavê wî ye, lê ew bi navê Şêxo tê naskirin û ji malbateke cotkarên biçûk e. Navê diya wî Fatimê ye. Pênc bira û şeş xwişkên wî hene. Navê jina wî Nisrîn bû û ew niha li ba birayê wî yê hêja

Beha dimîne.

Sê zarokên wî hene, keçek bi navê Felek û du law yek bi navê Îbrahîm û ê din bi navê Birûsk e. M. Şêxo zaroktiya xwe li Xecokê derbas dîke. Ew di sala 1964'an de xwendina xwe ya destpêk li Xecokê kute dîke. Ew di sala 1965'an de ji bo xwendina xwe ya navê tê Qamîşlo. Di sala 1966'an de nexweş dîkeve, çavên wî pîrr qels dibin û mecbûr dimîne ku berçavkan bikar bîne. Ew di sala 1967'an de ji ber jar û belengaziya bavê xwe û nerazîbûna bavê ji beşdariya M.Şêxo li gel munasebên kurdî û tîrsa wî ku ew bê girtin, ji ber vê ew vedigere Xecokê û digel bavê xwe di avdaniya pembo de kar dîke. Beşdariya wî digel munasebên kurdî bêtir di warê muzîkê de bû. Ew di hevpeyvîneke (7) xwe de dibêje, ku di zaroktiya wî de mereqa wî li ser muzîkê hebû û radyoya Yêrêvanê roleke mezin di wê demê de ji bo pêşketina mereqa wî listiyê û ramana

nuh pê daye naskirin. Di eynî salê de diçe bajarê Helebê eskeriyê, lê ew ji ber qelsbûna çavên xwe ji eskeriyê tê effûkirin û vedigere Qamîşlo. Sala 1968'an birayê wî Beha dibêje ku yekem care ku M. Şêxo tembûreke pak bi perên xwe dikire û bi firehî dest bi lêxistina stiranê folklorî dike, lê bi pirranî li stiranên Mehemed Arif, Îsa Berwarî, Kawis Axa û yên din dixê û hinek caran muzûka erebî jî saz dike. Gotina Beha diji gotina kek Beşîr Botanî ya ku di hejmara REWŞEN'ê ya 6'an hatiye: "Folklorê kurdî (awaz, govend û stiranên folklorî) jî ne dizanî" tê. Min di pêş de jî ev qal kir. Ew di sala 1969'an de diçe bajarê Beyrûdê û dikeve Navenda Xwendina Yekîtiya Muzûkê û li wê derê zanahiya muzîkê dixwîne. Beşdarî Komika Serkewtinê ya muzîka kurdî dibe, li hunermendên din mîna Mehmûd Ezîz, Remedan Nicim, Rifatê Darî û hinekên din, ku xebateke baş bo muzîka kurdî kirine. Ew di sala 1972'an de dibe endamê Hevgirtina Hunermendên Libnanî û li wir hinek stiranên xwe mîna Gulîzer û Heps û zîndan tomar dike. Di vê salê de jî vedigere Kurdistanê Sûriyê û nav û dengê wî wek ewrê baranê ezmanê Kurdistanê şêrîn tevî dipêçe. Li Rimêlanê (8) dest bi kar dike û dibe serokê komika wê ya muzîkê. Di eynî salê de cara yekemîn e ku berê xwe dide Kurdistanê Iraqê û çend stiranên xwe li radyoya Bexdayê, li beşa kurdî diweşîne. Bi şûnde careke din vedigere Qamîşloka xwe, vê carê sîxurên dagirkerên Sûriyê neynûkên xwe yên bi gemar davêjin bejna wî, da ku dengê wî vemirînin, lê heyhat, çiya natewin. Di vê salê de û di salên 1973 û 1974'an

de ew dikeve tengasîne mezin. Ji bilî hejarî û belengaziyên xwe ew pirr caran jî ji aliyê sîxurên Sûriyê ve tê girtin, li wî îşkence tê kirin, an jî tim veşirtî û derbeder dimîne. Lê her dem dengê wî bilind û bilind dibe, ranaweste û çiya û newalên Kurdistanê bi vîxana bilbilan mest dike û bi qeqeba kewekî rebat mîrxasiyê dixwîne. Di sala 1973'an de ji destê astengên sîxuran dev ji karê Rimêlanê diqere û careke din berê xwe dide nav pêşmergeyên axa welêt, li Kurdistanê Iraqê. Serokê Kurdistanê yê mezin rehmetyê Berzanî mûqabela wî dike û spasîyên xwe diyarî wî dike bo xebata wî ya çandî û netewî. Ew li wir nêzikî sê mehan dimîne û bi şûnde dîsa tê Qamîşlokê. Kek Beşîr Botanî dibêje, ku di vê salê de jî M. Şêxo çend stiranên xwe li radyoya Bexdayê weşandin. Di sala 1974'an de ew careke din berê xwe dide Kurdistanê Iraqê û ta şikestina şoreşê ew li wir dimîne. Berî ku ez dest bi sala 75'an bikim ez dixwazim tiştêkî bibêjim: Nizanim ji ber çî Mehemed Şêxo di hevpeyvîna xwe ya bi Armancê re negotiye, ku ew di sala 1972'an an jî di sala 1973'an neçûye Kurdistanê Iraqê, wî tenê qala çûyina xwe ya 1974'an kiriye. Kek Beşîr Botanî jî tenê qala hatina wî ya sala 1973'an kiriye û di hatina wî ya dawî bo Kurdistanê Iraqê, şaş bûye û gotiye ku ew di sala 1975'an hatiye wir, lê a rast ew e ku ew di sala 1974'an de çû wir û ew bû cara dawî. Ew di sala 1975'an de dilşikestî berê xwe dide Kurdistanê Îranê, li wîlayeta Mazdiranê bi cî dibe û li wir dibe mamostayê muzîk û zimanê erebî, lê wek ku herdem tengasî bûye pişka wî

''Savak'' wî di pirr qiriktaliyan re derbas dikin, da ku dengê wî bînin jêr. Di sala 1977'an de bi keçeke kurd bi navê Nisrîn Hisseyan re dizewice û çar zarokên wan çê dibin. Yê pêşîn bi navê Bêkes bû, lê ew zû mir û yên ku sax mane jî me di destpêka nivîsa xwe de navên wan anîbûn ziman. Ew di sala 1982'an de vedigere Sûriyê, di 26.12.1982'an de digihêje Şamê û di 03.01.1983'an de digihêje Qamişloka Bavê Felek. Di çarê Adara derewîn û bêbext, sala 1989'an de Bavê Felek nexweş dikeve û ji ber nezaniya doktoran, ku dermanên şaş dabûnê û ji ber nemberbûna doktorên kurd-nêzîkî sed doktorên kurd li Qamişlo hebûn-

ku li wî baş xwedî derneketin û wê ev li eniya wan wek şermeke mezin bimîne. Nehê Adara 1989'an, saet di pêncê sibehê de ruh ji canê Bavê Felek dire, bejna dirêj ku xwe li ber Felekê netewand serî datîne û dema rok tariya şevê ronî dike Qamişlo wek ku ji sergêjekê şiyar be, tev radibe serpiyan, ta bi kevir û kuçên xwe li pey darbista Bavê Felekê diçin û wî li mezalê Hilêlîka mîrat peya dikin.

Erê Bavê Felek: ''Ne ji bo mirin, bimire bo jîyan''(9) te weha digot, de bijî Bavê Felekê û xwezî bi dilê te, tu ê di hênavên Kurdistanê de her bijî...

Swêd, 28.12.1992



#### Nîşe:

1, 2, 3, 4, 5, 6, 9 ji stiranê Mehemd Şêxo hatine girtin.

7) Armanc, Îlona 1986'an.

8) Rimêlan herêmek ji Kurdistana Sûriyê ye, petrol lê dertê.

Nivîsên ku min fêde ji girtin ev in:

1) Namek ji destê Beha Şêxo

2) Dengbêjekî ji Kurdistana Sûriyê M. Şêxo, Armanc, îlon 1986

3) Ji bo ku em gula berbiro di berfê de ji bîr nekin, Ehmed Huseynî, Berbang

4) Mihemed Şêxo Kewekî mişext û stembar, Beşîr Botanî, Rewşen hejmara 6'an, zivistan 1991

5) Dengê xelkê Kurd Mehemed Şêxo, Birindar, Kurdistan Press, Nr 69 (15) 13.04.1989

Di dawiyê de ez dixwazim bibêjim ku ez ji demderketina kasetên M.Şêxo û hejmara wan baş ewle nebûme. Ji ber vê ez neketim vê naverokê.

# NAKOKÎ

## Hesenê Metê

Yekî ku xweşk an jî birayê wî hebe, bi vê nakokiyê dizane. Ne xem e ku ev xweşk an jî birayê ha jê mezin an jî piçûktir be. Ya girîng, di navberê de zêde sal tune bin. A wê çaxê, di demên zaroktiyê de nakokîyek ê di navîna wan de pêl bide. Tew ji bextreşî re, ku ew xweşk û birayê ha jî hemcinsek bin, ev bêyomiya ha ê xurtir bibe.

Ji rojan paşnîvroya rojêke payîza navîn e. Karên ku di vê demê de li gundan were kirin, hemû jî ji bo amdadeyên zivistanê ye. Li hewşa me ya mezin, bavê min qoncekî gir daye ber xwe, ji kêşa êzingên me yên hewşê, hemêz bi hemêz tîne datîne ber vî qonçê û yek bi yek li ser hûr dike. Diya min jî beroşek şorbe daniye ser argûnê hewşê, anuha jî ji bo şorbê xerîkî sorkirina pîvaz û qelî ye. Herweha vatîniya kişandîna wan êzingên ku bavê min hûr dike, li ser min û birayê min e.

Birayê min bi xwe neh salî ye û bi qasî salekê jî ji min piçûktir e. Ev rengdêra piçûktiyê ji bo wî dayîneke Xwedê ye, şûr û mertalekî parastinê ye. Vê yekê ez dûre têdigêhîjim. Çi bixwaze, çi bike û bibêje, divê ez bi ya wî bikim. Dema ku ez bi ya wî nekim, qêrîn û giriyekî wusa dike, ya sitar, meriv dibêje qeyê mar pê girtiye. Wê çaxê jî bavê min di hewara wî de tê, bêyî ku bizani be çi bûye û çi qewumîye, peyvî li ruyê min dixê, li min hêrs dibe û dibêje: «Tu mestûmezîniya î!» A di wê gavê de ez ji mestûmezîniya xwe şerm dikim, di hundurê xwe de ji xwe hêrs dibim ku çima ez ji wî mezintir im, çima ez bi dû wî re ne hatime dunyayê. Di her demên weha de diya min dibîne ku ez çiqasî li ber xwe dikevim û ji xwe dêşim. Loma piştî bûyerên weha diya min tê, bêyî ku nola bavê min li min tenê hêrs bibe, bi dilovanî destên xwe yên qertûşî di serê me herduyan re dide û dibê: «Çima hûn bi hev nakin, ez bi qurbana we, qaşo hûn



birayên hev in? Divê hûn ji hev hez bikin ku Xwedê jî ji we hez bike.»  
Ji min û wî, bavê min bêtir li wî xwedî derdikeve. Ne ku ez çavnebarê vê yekê me. Lê di her carên weha de, ji ber vê piştgiriya bavê xwe, ez dibînim bê birayê min çiqasî pozbilind, kaw û nerind dibe. Bi taybetî jî dema ku dibihîse bavê min bi navê Qumandar banî wî dike û dibê: «Ka Qumandar li kuderê ye?» Mîna ku bi rûmeta vê rengdêrê ha bizani be, di her carên weha de ew jî bi serbilindiya Qumandarekî ber bi hemêza bavê min dibeze.

Ez û Qumandarê xwe î piçûk em wan êzingên hûrkirî ji hewşê dikişînin hêla hundur û li aliyekê xaniyê me î malê em dinijînin ser hev. Di kişandina êzingan de her gava ku em li hundur pêrgî hev tîn, ji bo ku ez bêsim çî ji destê vî Qumandarê min î piçûk tê, ew dike. Ji xwe ew êdî bike jî û neke jî, ez bi her tevgerê wî dêsim. Bi rêveçûna wî, peyivîna wî, listikên wî... tew carina bi giriyê wî jî. Dema ku digirî jî, bi min wusa tê ku ew dixwaze min biqahirîne. Lê ji bo ku bavê min li min hêrs nebe û ji min re nebêje: «Ma tu piçûk î!» heta ku ji destê min jî tê, ez xwe ji van şeytaniyên birayê xwe î piçûk dûrdixim, pîrî caran bi wî re nalîzim û napeyivim jî. Mîna ku anuha tew birayekî min î weha tune, bi wî re êzingan nakişînim, hebûna wî ya nuha bala min nekişîne bi awurên tûj em di ber hev re derbas dibin.

Bêhna pîvaz û qeliyê ku diya min di rûn de sor kiriye, ne tenê li hewşa me, herweha heta hewşên cîranan jî belav bûye. Baş xuyaye ku ev bêhna ha li xweşa bavê min jî tê û loma her cara ku dasa tûj bera ser êzingên ter dide, fişîl û perçên piçûk ji ber devê dasê dipengizin û li hawirdor belav dibin.

Ber bi tariya êvarê re diya min ji bo min û birayê min î piçûk şorbê dixê namkiyekê û datine ser sekûka hewşê ku hinekî sar bibe. Piştî deh deqeyekê jî bi kêfxweşiya karê ku me kiriye, bi min û birayê min dide zanîn ku em biçin ser sekûkê û beriya ku tarî bibe, em nanê xwe bixwin. Ez û birayê xwe diçin, li ser sekûkê li ber xwarina xwe rûdinin, lê wekî du jîjminan. Tariya êvara payiza navîn xwe dagirtiye ser erdê, lê meriv xwarina ber xwe ji hev derdixe.

«Diya min ev perçê ha ji bo min xistiye namkiyê.»

Vî dengê ha ez ji nişka ve ji birayê xwe an jî wek ku bavê min dibêje, ji Qumandarê xwe dibihîsim û dibînim ku perçekî wekî nîvgoşt û nîvhestî di namkiyê de ye. Di wê gavê de dilê min dike gurpegurp. Ez dizanim ku ev perçê ha ê di navîna min û birayê min de bibe sedemê çî naxoşîyan. Di dilê xwe de ji diya xwe ya şêrîn hêrs dibim û dibêjim: «Diya min jî êdî fêrî xwiyekî nû bûye!» Lewra ne xwiye diya min e ku perçên qelî tomarî bavêje şorbê. Tiştê ku ez dizanim, heta nuha jî wê perçên qelî tomarî navêtiye ber şorbê. Hertim çend cî qelî tîne bi tiliyên xwe yê pîrozwer ji hev vediçire û wusa davêje ber şorbê. Navekî jî li vê şorba xwe dike û dibêje, Şorba Qelî. Lê anuha mîna ku diya min jî bixwaze vê nakokiya di navîna min û birayê min de mezintir bike.

Ya rastî diya min dizane ku em zêde li hev nakin, lê bi meziniya nakokiya me nizane û weke diyên hemû zarokan, ew jî guh nade vê pîrsa me. Loma pîrî caran weke anuha xwarina min û birayê min di namkiyekê de dide ber me û tew vê

carê perçekî goşt tenê jî xistiyê. De were safî bike! Bi kêmanî du perçe têxista namkiyê an jî ew perçe ha bi du ciyan bikira, dîsa dibû. Lewra ez dizanim ku ez ji bo perçekirinê jî li wî perçeyî binêrim, birayê min ê biqîre û êdî hûn dizanin bê ew ê çi bibe. Loma hîn di serî de ez biryara xwe didim ku xwe têkilî wî perçe nîvgoşt û nîvhestî nekim.

Ez û birayê xwe rûniştine û em bêdeng şorba xwe dixwin. Ya rastî ez tenê bêdeng im. Birayê min carina qeşmeriyên dîke: «Diya min pir ji min hez dîke.» dibêje, kevçiyê xwe bi wî perçeyî dîke, pê dilîze ku ez jî tiştêkî bibêjim. Lê wek ku min got, hîn di destpêkê de min xwe ji xwarina wî perçeyî kiriye û ez nayêm provakasyonê. Bêyî ku ez bi wî re bipeyivim an jî li wî binêrim, şorba xwe dixwim. Li gel ku ez rû nadime wî jî her ew qeşmeriyên xwe dîke: Kevçiyê xwe li binê namkiyê dixîne, ji bo ku balkêştir be dîke firefir, fena kalên bêdiran dîke milçemilç û carina jî kevçiyê xwe bi wî perçe nîvgoşt û nîvhestî dîke û dibê: «Divê tu bizani bî ku ev goştê ha diya min ji bo min xistiye şorbê.» Ez di hundurê xwe de dikelim, şeytan ji min re dibê, yekî li kursiya devê wî bixîne û hew! Lê ez naletê li çavê şeytên jî tînim û dengê xwe nakim. Ez baş dizanim ku mebesta wî ne xwarina wî perçeyî ye, lê ew dixwaze ez bi wî re bipeyivim an jî bêşim. Piştî çend kevçiyên bêdeng, birayê min dîsa kevçiyê xwe bi wî perçeyî dîke û dibêje: «Divê tu ji bîr nekî ku ev perçe goşt, yê min e.» Lê min bêdengî kişandiyê serê xwe û ew jî her didomîne: «Ev goştê ha, yê min e û ez ê bixwim...» Ez jî nizanîm bê çawa bû lê ew hemû êş û hêrsa ku ji piştî nîvro û heta nuha min di hundurê xwe de berhev kiriye, ji nişka ve ji devê min derdikeve û ez dibêjim: «Tu dixwî bixwe, şeytan lawê şeytan!» Çawa ku zikê merivan ji xwarina nokan dinexwe û piştî baberdanê rihetiyekê digire ser meriv, bi gotina vê hevoka xwe re ez jî tiştêkî wusa hîs dikim. Lê tavilê li xwe divarqilim ku herdu peyvikên min yê dawîn ne baş in. Gumanek bi min re çêdibe û xwe bi xwe dihejmim: «Nebe nebe, ev firqûza anuha giliyê min bike.» Bi vê gumana min re birayê min dîke qêrîn û dibê: «Bavo!» Gwîne min divemire û dilê min dîke gurpegurp. Dengê bavo jî bilind dibe û dibê: «Çi ye, Qumandar?» Vê carê jî Qumandar di ber xwe de ji min re dibêje: «Ez bibêjim?... Kero welle ku ez bibêjim, bavo ê li te hêrs bibe!» Ew tîrsa min hinekî dadikeve, bavo li pîrsa xwe xwedî dernakeve û wusa xuyaye ku Qumandar jî bi qasî du sê hilman xwe ji bîra dîke. Di vê fesalê de ez zûzûka ji ber namkiyê radibim, tev wî perçe ku tê de ye ji birayê xwe î piçûk re dihêlim û xwe vedikişînim.

Heta ku bavê min destê xwe dişo û ew jî tê li ser sekûkê rûdine, ev birayê min firqûziyan dîke. Piştî ku ez dibînim bavê min tê, êdî ez yekser bêdeng im. Di vê gavê de jî di dilê xwe de banî Xwedê dikim û gelekî dixwazim ku birayê min hinek nerindiyên bike û bavê min bi xwe jî bibîne. Bi xwe bibîne bê ew çi firqûzek e. Lê ji şeytanî re maqûliyê wusa bi birayê min digire ku tew nepirsîn. De qeyê firqûzên herî firqûz jî di jiyana xwe de carekê maqûliyê dikin! Bi gotineke din, bi awakî ku piçûkiya xwe bizani be, bi milçemilçeke zarokane nanê xwe dixwe. Ev yeka ha nayê wê manê ku birayê min î piçûk ji bavê min

ditirse, na. Heta nuha jî min ne dîtiye ku ew ji bavê min tirsiyaye. Ji xwe min ne dîtiye bavê min jî li wî xistiye an bi awakî ku ew bitirse lê hêrs bûye.

Di vê navberê de diya min ji bo bavê min jî namkiyeke şorbe tîne û le ber datîne. Bavê min weke hertim dîsa bi bextiyarî li birayê min dinêre, ji serbilindî lêvên wî dilerizin, serê xwe ber bi diya min bilind dike û jê re dibêje: «Qumandarê min alifxweş e.» Qumandarê alifxweş ji vê gotina bavê min kêfxweş dibe, di bin çavan re li bavê min dinêre, mîna ku bixwaze gotina wî rast bipeyitîne, bi destê xwe radihêje wî perçê nîvgoşt û nîvhestî berwar ber bi devê xwe î piçûk dibe û gez dike. Bi gezkirinê re qêrînek bi birayê min dikeve, bi hêrs û girî wî perçeyî ji devê xwe derdixe û ber bi pêş davêje. Ew perçê nîvgoşt û nîvhestî, bi gotineke din, ew perçê ku xwendevan pê dizane, li hundurê namkiya ber bavê min dikeve. Şorba ku ji namkiyê dipijiqe serçavê bavê min, ew girî û qêrîna ku ji nişka ve bi birayê min dikeve, bavê min dîn dike. Na, dîn nake, lê bi hêrsa dînekî radibe û xwe dikêşe birayê min.

Heta nuha jî min ne dîtiye ku hêrs li bavê min wusa mezin bûye. Gerçî du sê caran diya min weke kevoka aşitiyê di navîna bav û birayê min de xuya dibe, lê bêkês e. Ez êdî baş têdigêhîjim ku di rewşên hêrsbûyînen weha de ne tenê Qumandar, Generalên herî mezin jî nikanin xwe ji destê bavê min bifilitînin. Dest û devê bavê min nahewe û her dibê: «Ev çi çêlrûtî ye, kûçik lawê kûçikan!» Birayê min li ber şîlpîna silên bavê min wekî cêwrekî kûçikan dike kûzekûz. Dilovaniya diya min pê digire, dîsa xwe davêje ser birayê min î piçûk, li ber bavê min digere: «Xwedê dihewîni, de bes e!» dibêje û di ber re jî dike ku birayê min bihewîne: «Çi bû, ez bi qurbana te? Ew çi bû te havêt, bi qurban?» Birayê min bi kûzekûzeke dilşewat dixwaze tiştina bi diya min bide zanîn, lê hîskehîska wî rê nade gotinên wî û nîvçe dimînin. «Ew... perçe... ne... goşt... êzing...» Diya min bi bal û şikebarî li namkiya bavê min dinêre û fişilekî ber devê dasî tê de dibîne.

Ez tavilê têdigêhîjim ku ew perçê ha, ne perçekî nîvgoşt û nîvhestî bû, diya min ew ji bo birayê min î piçûk ne kiri bû namkiyê. Beriya ku em li ber namkiya xwe rûnin, fişîlek êzing ji ber devê dasa bavê min pengiziye û hatiye ketiye namkiyê. Piştî ku bûyer tê famkirin, diya min bi dilovanî destê xwe di serê birayê min re dide û dibê: «Raweste, ez ji lawê xwe re ne tenê perçeyekî, namkiyek tije qelî bînim! Ava reş di çavên min de were, çima min ji lawê xwe re du perçe qelîyê tomarî navêt ber şorbê!»

Xwedê dizane dilê bavê min jî ji van gotinên diya min nerm dibe û tişteki weke poşmaniyê xwe lê dide der. Berê xwe bi birayê min de dike û dibê: «Qumandarê min baqil e, mêr e, lê... ev fişîlê êzing serê xwe bixwe!» Bavê min wî perçê êzing ji nav şorba ber xwe derdixe, piçekî bilind dike ku em giştik lê binêrin, dûre bi aliyekî de davêje û herdu destên xwe vedigirê û bi bergerîn banî birayê min dike: «Were, Qumandarê min, were! Were hemêza bavê xwe!» Lê Qumandarê bavê min naçe. Mîna qumandarekî ku ji apoletên xwe bûbe, ew di hemêza diya min de bi awurên bêhêvî û vala li hemêza bavê min dinêre.

# LI BAJAREKÎ PIÇÛK XEBATÊN HÊJA

Nûrî ALDUR

Berî ku em ''xebatên hêja'' bi nav bikin, pêwîst e ku em bajarê xwe yê piçûk (Sala) bidine naskirin.

Belediya Sala bajarekî ku nêzîkî 23 000 kes tê de dijîn. Sala jî wek gelek bajar û bajarokên din yên Swêd, xwedî tarîxeke kevin e. Di dema xwe de çandinî yek ji çavkaniyên herî girîng bû li Sala. Endustrî zêde tune ye. Herçiqas kar û aletên çandiniyê nûjen bûne jî, çandinî îro mijûliya gelek kesan e, ku pê jiyana xwe didomînin.

Berê li vî bajarî ocaxa madena zîv hebû. Wek fenomen ev ocax bi serê xwe babeteke mezin û fereh e. Îro ev cih ji bo xwendevan û turîstan bûye wek muzexane û ziyaretgeh. Di demsalên bihar, havîn û payizan de zarok, xwendevan, personal, turîst û hwd. tîn vê ocaxa madena zîv (ji bo zanebûna xwe ya tarîxî, arkeolojîkî û civakî zêde bikin) ziyaret dikin. Ji xwe yekemîn tiştê ku Sala îro jî pê tê naskirin ''Ocaxa madena zîv e''.

Piştî van çend gotinên realîte heyî, em karin werin beşê civakî, an jî kulturî ku ji xwe esas babeta me jî ew e; "Xebatên hêja". Meclîsa belediya bajêr, cara yekemîn bû, di sala 1987'an de biryar da ku di salê de 50 kurdî penaber qebûl bike. Erê, ji wê salê û vir de her sal 50 kes, li vî bajarî tê bi cih kirin. Û ji ber ku kurdên me otomatîkî têkiliyên xwe bi muesesên Swêdî re (zarokxane, dibistan, pirtûkxane, post, bank, komelên humanîter, dêr, polîs, daîra sîgortê û hwd.) re datînin-dîyalogeke otomatîkî jî peyda dibe. Di vê dîyalogê de rola herî girîng ya "buroya kar û barên biyaniyan e".

Bi hevkarîya "buroya biyaniyan" û "pirtûkxanê" her sal (ji sala 1989 an û virde) nivîskarekî kurd têt dawet kirin û ew nivîskar li pirtûkxanê semînerekê dide me kurdên li Sala. Ger em van nivîskaran yek bi yek bi xwendevanên **NÛDEM**'ê bidine naskirin-hingî wê hêjabûna van xebatan dîyartir bibe:

Di dawîya sala 1989'an de nivîskar me *M. Emîn Bozarslan* du semîner dan. Yek bi zimanê swêdî û yek jî bi zimanê kurdî bû. Ya bi zimanê swêdî li ser dîroka trajediya me kurdan bû. Gelek swêdî hatibûn. Mamostê me ji dema Selaheddînê Eyyûbî heya dewleta Babana, ji dema dawîya împaratoriya Osmanî heya biserketina Kemalîstan, Şêx Mahmûdê Berzencî, Cumhûriyeta Mahabad û rewşa Kurdistanê Îranê di dema Xumeyniyan de û hwd. anî zimên. Wî bi wê dewlemendiya

hezîna zanyarî û nazikiya xwe bala guhdarên swêdî dikişande ser dîrok û jiyana gel û welatê xwe. Mamosta *Bozarslan* semînera xwe ya duyemîn jî li ser rojname "JÎN" da. Wî ev rojname jî tîpên erebî wergerandine tîpên latînî. Ev xebata ha ji aliyê mamoste ve hatiye kirin. Wî di vê semînera xwe de bê çawa materyal peyda kirine, gelek problem û zehmetiyên teknîkî û praktîkî, wergerandin û lêkolîn li ser bûyer û nûçeyên rojnamê hate axaftin. Ji van malûmatan gelek tişt nehatibûne bihîstin. Wek nimûne: Ku hê hingî (piştî şerê cihanê yê yekemîn) jinên kurdan komele ava kiribûn.

Di sala 1990'î de mêvanê me yê hêja helbestvan *Şêrko Bêkes* bû. Gelek kurd beşdarî vê civînê bûbûn. Berêz *Şêrko*, dest bi xwendina helbestan kiribû. Guhdaran bi xemgînî, dilşikestî lê bi xweşî û rûgeşî jî-helbestvanê xwe yê mezin guhdarî dikirin. Dema helbestên li ser Helepçe, *Yilmaz Güney* û întresa Ewrûpa û dinyayê li ser Kurdistanê hatin xwendin- helbet hin kesan nikarîbûn hêsirên çavên xwe bigirtana. Wî wek hozanekî ku bi tembûra xwe li hember hezaran, wek ronakbîrekî ku bi pênûsa xwe dijminê bêbext û bê ol îspat dike û wek pêşmergekî ku di şerê şeref û namûsê de ye- helbestên xwe dixwendin. Û niha jî em hêvîdar in ku mamostê me *Şêrko Bêkes* wek wezîrek û dîplomatekî kurd di karê xwe de bi ser keve.

Sala sêyemîn 1991, dora nivîskarê me berêz *Kerîm Husamî* bû. Di wê demê de rewşa Kurdistana Iraqê pirr germ û aktuel bû. Ji bo wê yekê, berêz *Husamî* babeta semînera xwe kire "Rewşa Kurdistana Iraqê Ya Îro". Wî di axaftina xwe de da diyarkirin ku ji bo başbûn û pêşkeftinê wî baweriyên xwe name bo bereyî Kurdistan rêkirdine. Lê helbet ji aliyê *Kerîm Husamî* ve rexneyên hevaltî û dostanî li "bere" hatin kirin. Wek nimûne: Dizî û krîmînalîteta ku wê demê çêdibû, hate zimên.

Semînera me ya çaremîn û ya dawî di tarîxa 10.12.92 an de çêbû. Vê carê mêvanê me ronakbîr *Omer Şêxmûs* bû. Kek *Omer* li ser babeta "Di Jiyana Kurdî De Rola Zanyariyê" semînerê da. Gelek kurd hatibûn vê kombûnê. Kêman caran semînerên di vî babetê de tene organîzekirin- ev jî zeîfîyeke me ya mezin e. Kek *Omar* di 45-50 deqîqeyên pêşîn de li ser zanyariya umûmî, an jî realîta ilmî sekinî. Ew li vir li ser gotin û naveroka "analîz", "teknîk", "materyal" û hwd. rawesta. Dawî jî xwest ku van teoriyan bixe qalibekî kurdî. Û ew gihîşte wê armanca xwe jî.

Dema kek *Omer* rewşa bûyer an jî peryodine li welatê me tanî ziman, wî ew gotin û termên zanyariyê dikire malê wan bûyer û peryodên kurdî. Ji xwe hingî kesên

kurd wê bikaribin nesîbên xwe ji van berheman bigirin. Kek *Omar* ne wek siyasetvanekî (wek alimekî kurd) qise dikir. Semîner bi awayekî neutral û objektîv bû. Lê helbet gelek pirs û pirsgerêk di serê hin kesan de çêbûn. Ji xwe armanc jî ew e ku kes teşebusî van babetan bibin. Ronakbîr ne wek daxwaziya kes an jî kesan dixebitin. Ger ew wa bikin, hingî navê wan dê ne ronakbîr be. Realîte çî be pêwîst e ew tişt bêne gotin û bêne kirin. Nimûneke ku Kek *Omer* anî ziman ev bû: Eger du hêl şer bikin û ger em bixwazin bê heq û neheq kî ye, pêwîst e em li herdu rexan guhdarî bikin. Em ê lêkolîna bikin bê ma herdu rexan berê çî gotine, çî nivîsîne û çî kirine. Û dawî dîtî û baweriyên kesên/rexên derveyî van herdu rexan girîng e ku bête zanîn. Hingî mirov kare bigihîje netîceyeke ilmî.

Kek *Omer Şêxmûs* ev jî got: Herkes, weke ferd kare û heta pêwîst e jî bi awayekî ilmî meselên xwe û yên gelê xwe/welatê xwe bimeyzêne û teşebus bike da hal bike.

Erê, weke me li jor jî got; piştî van semîneran em bawer in ku van kesên me (*Bozarslan, Bêkes, Husamî* û *Şêxmûs*) berhemê hêja dane me xelkê Sala. Spas ji bo wan.

Û em ji niha ve, bi çar çavan, li benda dawîya 93' an in -bê ma hingî wê kî bê û wê babet çibe. Di xweşiyê de bimînin.

# MELE EHMED BATEYÎ

1417-1491

---

## Zeynelabidîn ZINAR

**B**ayê evîna dilan geş dibe, hêlîna jiyana reş xweş dibe, kevnewarên qeşagirtî germ û ruhn dibin, kunêrên ragirtî hinbihin hêsan dibin û em ber bi dinyayeke nû ve diçin. Lê eger ew jiyân û giyan bi serbestî û bi azadî bêtin domandin, bab û bapîrên dilbikûl jî wê li jiyânê vegerin û têkilî nava govend û şahiyên çand û edebiyatê bibin. Ewçax em ê hêj rindtir dê xweşiya jiyânê binasin û bibin guhdarê pend û şîretên çand û zimanê xwe.

Ev rastî jî heye ku kula wan şêst û heft salên reş zû bi zû nayê jibîrkin, birînên axivî dereng têne kewandin, jana xerdel û jehriyê di dilan de didomîne, û nav û nasnavên kevin û yê nû timî xwe nişanî dîrokê didin. Êdî ew nav û ew nasnav nema dikarin di binê axa sar de bihêwirin. Hemû bi yek derbê, bi yek carê dixwazin ku derkevin ser ruyê erdê û temaşe li dîrokê bikin; ka di mêjû de çiqas par ji wan re hatiye veqetandin û çî qeder rûmet û siyanet bo wan hatine dayîn.

Dema av digîjin ser avan, dibin çem. Çem digîjin ser çeman, dibin firat. Firat jî digîjin ser firatan, dibin şet. Nexwe Elî Herfîrî û Mele Ehmed Bateyî dema gihane Cizîrî û Feqiyê Teyran, û dema ku Feqiyê Teyran silava xwe gihande Ehmedê Xanî, firatên Kurdistanê

jî mezintir bûn û avên rewan ber bi demepêşê ve dest bi reqs û colanan kirin. Ha wisa bi saya wan, hetanî dema niha gencîneya çand û zimanê kurdî deriyayine bêserubîn di nava xwe de wenda kirin. Lê eger em vegerin ser Şêx Riza Telebanî heta bi Şêx Evdîrehmanê Axtepî ku werin, her çiqasî em behsa Xelîfe Êsiv nekin jî, dîroka çand û zimên wê xwe ragihîne ber perrên feleka xayîn.

Îro eger ez zimên nizanibin, ne eyb e! Eger min bab û bapîr jibîr kiribin, ne kêmasiya min e! Eger çavên min li kêlikên kevnare neketibin, ne ku ez kor im! Lê eger ji niha û şûnde ez ziman nizanibin, bab û bapîran li bîra xwe neynim û kêlikên kevnare nebînim, helbet û helbet kêmasî û lengî di min de heye.

Bêguman çî gava ku mirov berê xwe dide dîrokê û li mêjûya Kurd dinere, tê de gelek tişt têne xuyakirin. Ew, riste bi riste dirêj dibin û digîjin dawiya Sed-sala Bîstî. Îro jî pêbipê hevraz hildikişê û heta wan kevnedeman diçe. Ji ber ku zimanê wî zemanî her çiqasî bi sedsalan dem bihurîne jî, li hember dema niha zêde kevnîtîne cuda demaxînin holê. Ji berê ve ye ku esalet û dewlemendiya ziman û çanda kurdî rewneqa xwe li cihanê dilefinin û me di gerîneka dîrokê de serbilind dihêlin.

Hêjayî pesn û serbilindiyê ye ku vê carê em navê Mele Ehmed Bateyî li bîra xwe binin. Lewra ev nêzî pêncsed salan e ku wî bi keysetê helbestvanekî duyemîn ji me re helbest, xezel û qesîde nivîsîne. Pêşî em ê ji xwendevanên NÛDEMê re bi kurtî behsa jînenîgariya wî bikin û piştê jî çend helbestên wî binivîsin:

Li gorî gotina Profesorê gorbihîşt Qanadê Kurdo ku ji Alexandir Jaba wergirtiye, herweha Mîr Celadet Elî Bedîrxan jî di HAWARê de wisa nivîsiye, ku: Mele Ehmed Huseyn Bateyî di 1417- an de li gundê Batê yê girêdayê bi Hekariyê ve ji diya xwe re çêbûye û di 1491- ê de jî çavên xwe ji dinya ruhnîk girtine. Bateyî bi eslê xwe ji Eşîra Ertûşîyan e. Niha ew Eşîr li nav aqarê Hekariyê û Wanê rûdine. Lê kovara HÊVIYA WELÊT tarîxeke din ji mirina wî re daye pêş û gotiye ku di 1465- an de miriye. Nivîskarê bi navudeng M. Emîn Zekî Beg jî di Tarîxa Kurdistan de nivîsiye ku, Bateyî di nav salên 1417-1495- an de jiyê. M. Emîn Zekî Beg li gotina xwe didomîne: "Bi rada edebî ya diduyan Dîwan û Mewlûdeke wî hene. Mewlûda Bateyî di 1903- an de li Berlînê A. Von Le Coq çap kiriye. Piştê jî li Misrê Kurdîzade Ehmed Ramîzê Licî çap kiriye."

Mewlûda Melê Bateyî heta niha li gelek deveran, di demên cuda-cuda de û bi tîpên erebî pir caran hatiye çapkirin. Lê cara pêşî min ew ji tîpên erebî wergerande tîpên latênî û di 1987- an de ji aliyê Jîna Nû ve li Stockholmê hate çapkirin. Di wê çapa latênî de 19 beş e û 582 beyt hene. Bi temami pirtûk 63 rûpel e. Ew çapa latênî cara diduyan jî di 1992- an de li Stenbolê ji aliyê Weşanxaneya Fîrat ve hatiye çapkirin.

Erê herçiqasî dibêjin ku berhemên

Melê Bateyî Mewlûd û Dîwanek hene, lê mixabin heta niha jî dîwana wî wek pirtûk nehatiye dîtin. Lê belê gelek helbestên wî li nav xelkê hene û piraniya wan hatine çapkirin. Di 1985- an de gava min dest bi berhevkirina destnivîsên klasîk kiribû, min çar helbestên Melê Bateyî jî peyda kirin. Û min ew di pirtûka xwe ya bi navê "Nimûne Ji Qencîneya Çanda Qedexekirî" de çap kirine.

Mewlûda Melê Bateyî, her çiqas bi dirêjî jînenîgariya Mihemed Pêxember beyan kiriye, lê jê zêdetir pirtûk mînaye romanekê. Û di destpêkê de rewşa afirandina dinê jî li gor felsefa olî bi awayekî pir xweş aniye zimên.

Ev berhema Melê Bateyî ya bi navê Mewlûda Kurmancî li Kurdistanê pir menşûr bûye û nav û deng daye. Piraniya xelkê ew jiber dizanin. Her maleke misilman ji bo bipaşxistina bela û siqûmatan di salê de çend caran xwarin didin der û cîranên xwe û li serê Mewlûda bateyî didine xwendin.

Pêşî em ê ji destpêka Mewlûdê bo xwendevanan çend malik li jêrê binivîsim:

*Hemdê bê hed bo Xwedayê 'alemîn  
Ew Xwedayê daye me dinê mobîn*

*Em kirine ummeta xeyr-ul beşer  
Tabî'ê wî muqtedayê namuwer*

*Ew Xwedayê malikê mulkê 'ezîm  
Daye me mîrasa Qur'ana kerîm*

...

Çewa ku me li pêş jî got, Melê Bateyî di beşa çar û ya pêncan de rewşa afirandina dinê beyan kiriye. Îcar min berî du salan şirovêya wan herdu beşan wek çîrok nivîsîbû. Ez ê wê çîroka xwe jî li jêr binivîsim:



## AFIRANDINA DINÊ

### - I -

Bi çend milyar sal berî niha hêj ev dinya me çênebûbû, carekê Xwedayê li banî xwe bi xwe fikirî, ramiya û sêwra çêkirina hin tiştan kir. Piştê xwe bi xwe got: *Hewqas valayî li ber destên min heye û hemû malê min e, tu hevalbend û ortaxine min jî nînin, nexwe divê ku ez hin tişt biafirînim û piştê jî wargehekê ava bikim û tê de hin cûre mirov û heywanine pirtexlût biafirînim. Ew wargeh dê bi wan afirandinên min wisa xweş û şên bibe, ku hempayên wê hiç nebin. Eger ew mirov wê wargehê ji xwe re xweş bikin dê pir xweş bibe, yan eger ne xweş bikin dê pir ne xweş bibe. Lê ez hiç têkilî navbera wan jî nabim; divê ku ew xwe bi xwe xwe ragirin û wekhevîti, birati û perwertiyê têxin mabeyna xwe û bi jiyaneke dilovan bidomînin.*

Piştî sêwirandina bo afirandina wan tiştan, Xwedê ji nûra xwe bi qasî çengekê girt û gotê: *Ya nûra min, bibe xweşiya min!*

Piştî wê gotina Xwedê, ew nûra pîroz dest bi ricfê kir, hem jî lerizî û li wê reqş û lertzê domand, domand heta ku 624 hezar sal bihurîn. Piştî hewqas salên dirêj, Xwedê ji wê nûra xwe ya ricfok re duwazdeh wargeyên nazenîn çêkirin. Lê belê ew wargeh her yekê ji ya din delaltir û xweşiktir bû, dû re jî Xwedê her yekê wan navek lê danî. Ew navên pîroz ev in: Şênîti (Qudret), Mezinatî (Te'zîm), Dilovanî (Minnet), Qencikiroxî (Merhemet), Başîti (Se'adet), Tîjîfehmtî (Keramet), Şeref (Menzilet), Rêrastî (Hidayet), Peyambertî (Nubuwwet), Perestîni (Ta'et), Mehdertî (Şefa'et), û Xweşribserî (Rif'et). Ew nûra ricfok,

di her yekê jî wan duwazdeh wargeyan de gelek sal hêwirî û ji Xwedayê mihrîban re zîkr û perestîniyan kir.

Piştê îcar Xweda ji wê nûra xwe re çar deryayên mezin afirandin û her yekê navek lê danî. Navê yekê *Deryaya Alîkariyê*, ya din *Deryaya Qencyê*, ya dîtir *Deryaya Şaneşintiyê* û ya dîtirkê jî *Deryaya Xwenasîne*. Ew nûr piştî ku ji wan wargeyên xwe derket, îcar bi rêzê kete wan deryayên mezin û tê de gelek salan zîkr û perestîniyan kir. Piştê Xweda wê nûra xwe ji Deryaya Xwenasîne derxist derve. Ewçax ji nûra pîroz 124 hezar dilop daweribîn. Û wê xist şûfê cewherekî, lê niherî û awirne tîj danê.

Cewhera nazenîn li ber awurên Xwedê semax nekir; werpixî û di nava xwe de keliya, berfireh bû, valahiyeke mezin dagirt û piştê ji fihêtan teqiya, bû du seq. Wê hingê Xwedayê mezin îcar li şeqeke wê cewherê bi çavine mexof niherî û li nivê din jî bi çavine dilovan niherî.

Ew nivê ku lêmêzekirina mexof lê çêbûbû, ji tirsan xwe ranegirt û liviya, rihilî, lerizî û di şûna xwe de reqîşî. Wê, kir û nekir xwe ranegirt û di nava xwe de şewitî, peritî û weke lehiya êtûnê herikî çû. Ew av û alav hin bi hin ruhn bû, li hev geriya û serobinê hev bû, kef û kunc pê ketin, dû û dûxaneke reş-tarî jê hilkişiya, û hilf û gulfa wê li dora hev hate lefandin.

Bi wê rewşa ku me gotî gelek sal bihurîn ew êtûn hin bi hin hênik bû û di şûna xwe de sekinî; ruhn bû, tenik bû û bû aveke sar û cemidî. Ewçax kefa wê bû ax, ava wê bû derya û ket rewşeke girover, lê bêsekan dîsa li dora xwe sergeşte zivirî, reqîşî û li hawîdorê xwe pergar çêkirin. Ew dûmana wê jî li jor pahn bû, rengêkî heşîn girt û hişk bû. Piştê navê wê giroveriyê bû dinya, navê ava wê bû

zerya, navê erda wê bû bej û navê wê hêşinayiya hişk a li jor jî bû asîman.

Ew nivê cewhera nazenîn a ku Xwedê bi dilovanî lê niherîbû, jê çar tişt afirîn; Erş, Kursî, Qelem û Lewh.

Îcar hin bi hin nêz dibû ku gelek tişt bêtin holê û ji êkdu biafirin. Piştî Xwedê fermaneke tûj da Qelemê, ku dest bi nivîsandinê bike. Lê belê Qelema jar li ber wê fermana Xwedê semax nekir û şermizar bû; bêhiş ma û di şûna xwe de mîna vizikê serserkî geriya.

Di wê navê re demeke pir dirêj bihurî, hêj nû Qelem bi hişê xwe ve hat û rabû dest bi nivîsandinê kir. Wê, ew fermana ku Xwedê dabû bêkêmasî bi cih anî û her tişt nivîsî. Piştî jî Qelem hema ji nedî ve nepenî bû. Ha ji wê demê ve heta îro, êdî dengê Qelemê hiç nehatiye bihîztin û behsa wê nehatiye kirin .

## - II -

Piştî afirandina wan tiştan, îcar Xwedê xwest ku mirovekî çêbike, da ku ji dola wî zêdeyî çêbibe, nifş bi nifş û qor bi qor mirov werin holê, da xweza bi wan xweş û şên bibe. Wê hingê Xwedayê bihêz fermaneke xweş da milyaketê xwe Cebrâil, da ku here çengek axa sipî ji nav cergê dinyayê bîne.

Cebraîl çû çengek xwelî anî. Xweda got: Wê xweliyê bi gulavê bike hevîr. Cebrâil ew xwelî bi gulavê hevîr kir, erçiqand û jê gilokeke mîna cewherê fiq-sipî derxist. Piştî Cebrâil ew gilok bire bihiştê û çend caran di avê de niqo kir û deranî, dû re jî bir li çarnikalê dinyayê gerand, û dîsa şûnde vegerande bihiştê, ew ni-xumand da ku bimeye. Ha bi wî awayî hezarsaline dirêj bihurîn, heta ku ew

hevîr rind meyiya û xamîfî jê derket.

Piştî wê yekê, Xwedayê bihêz ji wê giloka hevîr buteyekî pir delal çêkir û piçek ji giyana xwe bi pifê xist navê. Bi wê pifkirinê Bute zînde bû û giyan ketê, xwe livand û rabû ser nigan. Ewçax Xwedê ew Bute bi ADEM navdar kir û piştî jî wî avête nav bax û bostanên bihiştê.

Adem bi tena serê xwe di nava bihiştê de geriya; her cûre fêkî xwar û av vexwar. Xwedayê comerd destûra Ademî li her tişû dabû, tenê xwarina berê dara genimî lê qedexe kiribû, yan jî xwarina sêvê... Wekî din wî çî bixwarina, çî vexwarina û bi çî awayî kêfa xwe bikirina serbest bû.

Li bihiştê Adem tenê bû, hedana wî nedihat. Wî diviya ku jê re hevalek jî hebe. Gava ku Xwedê ew vîna di dilê wî de ferq kir, ji binçenga wî ya rastê hemcinsekê afirand û navê wê danî HAWA.

Li bihiştê Ademû Hawa bi hev re geriyana û kêfa xwe kirin. Îcar evîna Ademî ji Hawê re çêbû û dil ketê. Piştî fermana zewaca bi Hawê re hat. Daweta wan dest pê kir; govendgêriyên dawetê hemû milyaketên bijare bûn, berbûrî horî û perî bûn. Bûk û zava di nava xişr û zegeran de xemilandin û li gor sazûmana yezdanî mehra wan hate birîn. Milyaketa bûk û zava li nava koşk, sera, bax û bostanên bihiştê gerandin û şahiyêke mezin kirin. Li wir Adem û Hawê çî tiştê ku dixwarin, tev dibû xwîdan û bi bihneke mîna ya misk û mawerê di laşê wan re diavêt derve.

Tu nabêjî ew xweşjiyana Adem û Hawê pir li zora Ebrehemî diçû û wî ji wan zikreşî kir. Ebrehem rojekê xwe bi xwe digot: Heçîka ez im, ez ji êgir afirî me. Adem ji axê afiriye. Çima ew li cem Xwedê pîroz e û rûmeta wî

heye, lê ya min nîne?

Ebrehem dixwest ku siqûmatekê bîne serê Adem û Hawê. Lê wî nika-ribû rasterast û eşkere bi wan xirabîna bike. Îcar wî xwe bi dostanî nêz kir. Ha bi wê dostaniya xasûktî Adem û Hawê hatin xapandin û çûn berê dara genimî xwarin.

Piştî xwarina genim, îcar diviya ku wan destava xwe ya mezin bikira. Li bihiştê jî cihê destava mezin nebî.

Gava Adem û Hawê berê dara genim xwarin, pêre-pêre xişr û zegerên bihiştê jî wan hilfiriyan û hemû nepenî bûn. Dû re Xwedê ferman da, ku wan jî bihiştê bavêjin. Û milyaketan ew ferman bi cih anî. Adem, Hawê, Mar û Ebrehem jî bihiştê avêtin derve.

### - III -

Çaxê ku Adem jî bihiştê hate avêtin, li ser girava Serendîbê ya di nav Deryaya Hindê de li erdê ket. Jina wî Hawa jî li ser girê Erefê yê di çola Erebaştanê de li erdê ket.

Gava Adem li erdê dikeve, heta diguliyê tê re diçe xwarê û diçike. Lê ew ne dikare derkeve û ne jî kesek hebûye ku wî derxîne. Ewçax Adem jî belen-gaztiya xwe re digirî û hewar û feryadin dike. Ha bi wê şîn û girînê gelek sal dibihurin, heta ku jî ber ruhnîkên Ademî herî çêdibe û di erdê de dar û giya şîn dibin. Piştî Xwedê li Ademî tê rehmê, û wî jî wê derê difilitîne.

Adem bi hiş ve hat, rabû xwe jî erdê derxist û li jina xwe geriya. Lê wî ew Girav serobin kir, jina xwe nedît.

Piştî biryara xwe da ku jî Giravê derkeve û here beja mezin, bi umîda belkî ku jina xwe bibîne.

Adem da nav ava Deryaya Hindê û çû. Ew kete ber pêlan, ha ku dît li bejayîyeke silekan rast hat. Lê belê wî ne devereke dinasiya û ne jî dizanibû ku wê here kur. Hema berê xwe çolebir da wê deşta bi sîl û çû.

Tu mebêj çaxê ku Hawa jî li ser Girê Erefê ketiye erdê, weke şûyê xwe ew jî bêhiş bûye û demeke dirêj wisan maye. Çaxê ew bi hişê xwe ve tê ku Ademî li cem xwe nabîne, radipe lê digere. Lê ew newêre ku xwe jî Gir bera deştê bide. Wek mesela ku dibêjin: "Dema ku li te bû tengasî yan xwe bavêje bextê zilamekî çê, yan jî pişta xwe bide çiyayekî asê." Lê hatibe.

Adem bi wê deştê ve diçe û her qasê carek-didu navê Hawê hildide gazî dike. Ha wisan rojek, didu, sisê... Adem diçe ha ku dibîne digîje quntara çiyayekî û li wir rûdine. Lê pîrî ku westiya ye, êdî jî rêveçûnê ketiye û nikare rabe ser nigan.

Hawêya jina wî çaxê ku li ser Girê Erefayê dengekî bi şewat jî jêr ve dibihîze, pêre-pêre dinase ku ew deng yê Ademî ye. Îcar ew xwe li dengê wî digire û berjêr diçe, diçe heta ku digîje cem. Li wir herdu hev dibînin û bi hev şa dibin, dest bi jiyanekê nû ya bi şeq û deq dikin.

**H**elbestên Melê Bateyî gelek xweş in, bi nika xwe pir lihevhatî ne û rewan in. Em ê vê benda heftmalîkên pêncrêz jî "Nimûne Ji Gencîneya Çanda Qedexekirî" werbigirin û jî xwendevanan re li jêr binivîsin:

**BEND: 4**

*Subh û êvarê şeva tarî, şemala kê yî tû?  
Leylet-ul Qedr û Berat in, nûra mala kê yî tu?  
Çîçeka Baxê Îrem, şox bejn û bala kê yî tû?  
Bo Xwedê kî bêje min, kanê şepala kê yî tu?  
Dêm kitêb e, zulfî haşî, şerhê halê kê yî tu?*

*Dîlbera gerdensefîq î, danuwa durr a 'Eden  
Nazik û mewzûnletîf î, nexliya selwa çemen  
Gullîbas î, gulçiyas î, gulênî, gulpîrehan  
Ahuya Deşta Tetar î, rehzena aska xeten  
Horiya baxê bihişt î, çavxazala kê yî tu?*

*Qîblegaha aşiqan î, şengela ebrûzirav  
Hate burca şanuşînî, sed melayik çûn silav  
Dax û kovana evîn î, sotî canê min tevav  
Extera subha se'îd î, reşrihana tabelav  
Fulfula hindûsitan î, zulf û xala kê yî tu?*

*Ew çi dêm e, şahebax e, gulşena dar-ul qerar  
Sedhezaran nal û awazîne bulbul çarkenar  
Helqe pê da best û hatin 'eqreb û îlan û mar  
Nêrgîza şehlaşepal î, asimîna murxîzar  
Lebxemûşê, meyfiroşê, dêmpeyala kê yî tu?*

*Pencî salî şehlewendî keftime çaha resed  
Min nizanî çerxê dîme, tê heye burca esed  
Çengelek avête dil kun kir li min, dad û meded  
Qelbekî hişk û sefalîn min divêt can tê ebed  
Şah li textê dîlberê fikr û xiyala kê yî tu?*

*Sefhe kêşa katibê xeybê ji nûra Layezal  
Xalek e wa l'gerdenê, mislê Berê Reş mah û sal  
Sedhezaran rukbe hacî tèn tewafa zulf û xal  
Netrik û şetrî û îlan dane ber ayê şemal  
Laubalî, çardehxal î, çardehsala kê yî tu?*

*Şehkitêb e min divêt behsê mehebbet bît`temam  
Sed tilism û sihri tê da pêkve Suryanîmeqam  
Ebceda işqê mi xwend û eqlî wenda kir û mam  
Horiya baxê bihiştê, tûtiya tawusxeram  
Xeyrî Batê padîşaha min, delala kê yî tu?*

# HELEBÇE

---

Derwêş M. FERHO

Dayê, ez rabûm biçim Mûsilê  
Helebçe ket ber min, xerab û wêran  
Hawar hey hawar, Helebça şîrîn  
Zarok û jin û pîr, dil di nav agir de

Dayê, ez rabûm biçim Kerkûkê  
Helebçe ket ber min, kaniya şehîdan  
Felek li me hawar, Helebça delal  
Çiya û mêrg, erd û ezman, ceger dişewitin

Dayê ez rabûm biçim evînê  
Helebçe ket ber min, warê mîrate  
Dewran li me hawar, Helebçe rengîn  
Dengbêj, bilbil û kew, kurd xwîn digirîn

Hey Helebçe, Helebçe, te ji bîr nakim  
Navê te li ser zarokê xwe radikim  
Tu nîşan bo min, ji dijmin re dijmin  
Di dîroka min de, li ser dil û canê min

## ADARA 88'AN

Çiya bi birîn  
Bêkes!  
Bêxwedî li paş mayine  
Gelek şkêr  
Laşên bînpêketî  
Malên wêrane  
Hêstir tev xwînê  
Ev e Helebçe  
Ev e milkê Berzan  
Li pey hebûnek dijwar  
Bê hêvî man?

# HUNERMEND MIHEMED ELÎ ŞAKIR

## Siyamend BIRAHÎM



*''Sed Stiran û Sed Awaz'' navê dîwana min a nû ye; Mihemed Elî Şakir dibêje û hevpeyvîna me ya ji bo NÛDEM'ê li Serê Kaniyê, li roavayê bajarê Hesîçê di şevbuhêrkeke xweş de li mala wî wilo destpê dike. Piştî ku me li stiranên birayê Mihemed Elî, Mehmûd Ezîz Şakir guhdar kir, helbestvan û tembûrvanê me kul û derdên xwe, jiyana*

*hunerî ya tembûrvan û dengbêjên kurdan, kêmasiyên wan ên diravî, tunebûna stûdyoyan, rewş û nîrê ku roja îroyîn muzîka kurdî tê de dibuhure me dest bi hevpeyvînê kir:*

**Siyamend Biraheîm:** *Di her destpêkê de em dixwazin tu hinekî li ser jiyana xwe bipeyivî?*

**Mihemed Elî Şakir:** *Ez di sala 1946'an de li bajarê Dirbêsiyê hatime dinê. Birayê min yê mezin li bilûrê dixist, kalikê min bi dengê xweş quran dixwend, bavê min jî bi dengê xwe yê xweş li mizgeftê bang dida. Bavê min ji min re digot: Gava ez 12 salî bûm bavê min tembûr li ser serê min dişkand. Piştî vê koçê bûyereke nayê ji bîr kirin di serê me re derbas bû, mamosteyekî ereb ''Ûdek'' wî hebû, gava wî xwest ji gundê me bar bike xwest ku ûda xwe bifiroşe. Ez rabûm min ew ûda wî bi 25 lîrayê Sûrî kirî. Sal 1963 bû. Min ew alet anî malê û holê cîhana min ya muzîkî dest pê kir.*

**S.B:** *Di destpêkê de we çî stiran û muzîk lêdixistin?*

**M. Ş:** *Di destpêkê de me dest bi stiranên erebî kir.*

**S. B:** *Piştî koça stiranên erebî te çawa kir?*

**M. Ş:** *Ji ber ku ez xwedî tundiyeke muzîkî me û min erk û vataniya xwe didît, divabû ku ez xwedî rewşenbîriyeke mezin bûma. Ez vedigeriyam folklorê kurdî, gencîneya muzîkî ya dewlemend. Min ji vê kaniyê vexwar û ev folklor ji min re bûbû bingeha xurt û bêdawî. Ne tenê min saz dikir, lê min helbest rist dikir û ji ber ku ez li gund mamostê zarokan bûm, min stiranên xwe dida birayê xwe Mehmûd Ezîz Şakir yê ku ew jî di cîhana stiranê de xwediyê xeyal û darêmeneke xurt bû, wî stiran jiber*

dikirin û ji ber ku qata dengê me jî yek e û ji ber rewşa xwe ya mamostetiyê, ez nikarîbûm biçûma derekê, lê Mehmûd Ezîz diçû şahî û ahengan li Urdinê, Lubnanê, Iraqê û li radyoya kurdî li Bexda stiranên me tomar dikir. Di vê hevpeyvînê de ez tu carî rola mamosta Yûsif Berazî yê ku di destpêkê de alîkariya min kir ji bîr nakim. Û birayê min pênc stiran ji helbest û awazên wî stira.

**S. B:** *Stirana pêşî ku te saz kir kîjan bû?*

**M. Ş:** Helbesta pêşî ev bû: Were dînê, min digot li min, te digot li min/ Were dînê, min digot destê xwe bi min de, were ba min/ Û stirana: "Gulçînê dilê şikestî" bû.

**S. B:** *Tu di derheqa danûstandina xwe û muzîkê de çi dibêji?*

**M. Ş:** Em vê dispêrin guhdarên kurd û ew dikarin dîtina xwe bibêjin. Ez bawerim ne pêwîst e, ku em danûstandina xwe ya di cîhana saz û stiran de bidin naskirin.

**S. B:** *Min bihîst te demekê biryar da, ku tu bi tena xwe bistirê?*

**M. Ş:** Belê, rast e. Ez di sala 1983'an de bi danûstandineke wilo bi rê ketim û stirana "Dotmam" ya pêşî bû ku min bi tena xwe stira. Paşê min helbesta Seydayê Cegerxwîn "Ala rengin Pîroz" saz kir û ew stira. Piraniya stiranên min neteweyî û welathezî ne. Ji ber ku ez xwe hunermendekî ku bi doza gelê xwe ve girêdayî dibînim.

**S. B:** *Tu rewşa stirana kurdî çawa dibîni?*

**M. Ş:** Mixabin, rewşa muzîka kurdî trajedî ye, lê bi awarte em dikarin navên çend sazbandên mezin yên kurdê Sûrê bêjin: Aram, Seîd Yûsif, Mihemed Şexo, Mihemed Teyib Tahir e. Lê yên

mayî çend denbêjên ku hawê dengbêjên mezin dikin û tu rewşenbîriya wan a muzîkê tune ye û vana stiranên kurdî kirêt kirine. Ez dikarim bêjim, ku ew dengbêjên dawetan in û dawet û şahî bêt wan nabin. Mixabin, piraniya kurdan jî ji vî rengê sivik yê muzîkê hez dikin. Kêm jî kurdan ji stiranên kurdî yên berz û original hez dikin. Min dixwest di vî warî de rexnegirên muzîkê hebûna.

**S. B:** *Ji dengbêjên kurdan yên tu jê hez dikî kî ne?*

**M. Ş:** Mihemed Arif Cezrawî, Şivan, Gulbihar û Gulistan.

**S. B:** *Ji bilî Cegerxwîn te helbestên kê saz kirine?*

**M. Ş:** Min helbestên Seydayê mezin Cizîrî, Yûsif Berazî; ji helbestkarên kurdên Rûsan, Çekoyê Hesên, Mehmûd Berazî û Seydayê Tîrêj saz kirine.

**S. B:** *Planên te yên pêşerojê çi ne?*

**M. Ş:** Ez dixwazim kaseteke di derheqa rewşa gelê kurd ya trajîk de dagirim. Ez dixwazim serpehatiya kurdên Kurdistana başûr, ku bi aliyê çiyar ve reviyar û şerpeze bûn bînim ziman, behsa pêşmergeyên qehreman bikim.

**S. B:** *Gotina te ya dawî ji kovara NÛDEM'ê re...*

**M. Ş:** Di dawiyê de ez dixwazim ku muzîka kurdî pêş keve, NÛDEM lê bibe xwedî, piştgiriya wê bike û bi alîkariya wê rexneyên muzîkê yên rastî bêne meydanê. Ez ji kovara NÛDEM ya di her warî de pîroz spas dikim û dixwazim bi xwendevanan jî bidim zanîn ku diwaneke min "Sed Saz û Sed Stiran" di nêzik de derdikeve.

*Serê Kaniyê, 6.11.1992*



## HUNERMENDÊ PIRRHÊL: RIZA TOPAL



*Riza Topal ji Dêrsimê, ji gundê Hulmenê ye. Wî dibistana pêşî li nehiya Moxindî û li gundê xwe xwendiyê, dibistana mamostetiye jî di sala 1950-57'an de li Axcedaxê, Meletê kuta kiriye. Wî li gundê Bingolê, Ankarayê û Hekariyê mamostetî kiriye. Ew di sala 1968'an de hatiye Almaniyayê û di sala 1969'an de li Munîxê dibe şagirtê akademiye. Ew di sala 1975'an de akademiye diqedîne û dest bi mamostetiya zarokan dike.*

*Heta niha du katelogên Riza Topal digel helbestên wî derketine. Resimên wî gelekî têne ecibandin û pesinandin û ew îro yek ji hunermendên kurd yê baş tête qebûl kirin. Me ji bo xwendevanên NÛDEM'ê di derheqa hunermendiya wî de çend pirs jê pirsîn.*

**Nûdem:** *çawa bû ku te wênekari ji xwe re hilbijart? Kê tavsiyeyî te kir?*

**Riza Topal:** Min bi çûkî gelekî hêkel ji heriyê çêdikirin. Lê fikreke ku ez bibim wênekari di serê min de tune bû. Wê demê ez gelekî li ser îcadan dixebitîm. Hin îcadên ku ez li ser dixebitîm ev bûn; erebe, tifeng, ding, aş, piştî û hinekê din. Ji ber ku bal û hewesa min gelekî li ser îcadan hebû, min dixwest ez herim dibistana dûlgeran. Lê ew ne bû nesîbê min. Destpêka wênekariya min li Meletê dest pê kir. Li Meletê mamosteyên min wêneyên min baş dîtî û ez girtim atolya wênekaran. Ez li wir navdar bûm û min wênekariya xwe bi pêş ve bir.

Min li Ankarayê du caran wêneyên xwe raxistin. Wêneyên min bala rojname û hunermendan kişandin. Di navbera salên 1960-1968'an de gelek wêne û desenên min di kovarên tirkan mîna Varlik de derketin. Bi wê riyê jî ez di nava hunermend û wênekaran de hatime naskirin.

**Nûdem:** *Hunera wêne li Kurdistanê gelekî girîng e, lê gelekî jî zehmet e. Tu dikarî tiştekî di derheqa resamiya kurdan de bibêjî? Tu rewşa Kurdistanê çawa dibînî?*

**Riza Topal:** Li Kurdistanê çî hunera wêne tune. Lêgerîna wê jî karê dîrokvanan e. Ev jî demeke dirêj jê re divê. Gava mirov li dîroka Mezopotamyayê dinêre, hinek hunera kevin heye, wek hunera Sumeran, Akadan, Babîlan, Asûriyan, Elaman, Qasîtan ( Kardûnyaşan), Huriyan,

Mîtaniyan hene. Hunera Gudeya ji yên Sumeran û Akadan bi ferq e. Yên Qasîtan herçiqas di bin tesîra Babîlên kevin de maye jî, dîsa di navbera wan de ferqiyek konkret heye.

Dema Medan û Farisan huner ji bin tesîra Sumeran, Asûran û Akadan derketiye. Herdu jî piçekî nêzikî hev in.

Dema ku Îskenderan cih û der zêft kirin, dewamiya Medan, Partan di bin tesîra hunera Girêkiyan de formên nû afirandin. Ew huner (sanat) heta dema Buxyaran berdewam bû.

Di dema îslamê de destûra wêneçêkirinê tunebû, di nava hizb û şîîyan de mînyatûr hunerekî wêne yê gelekî ber ve paş bûn. Ew tenê bi navên cuihderan yên ekolan de dihatin navdayin. Dibe ku di nav wan de jî wênekaren kurd hebin.

**Nûdem:** *Te kîjan hunermend ji xwe re kiriye wekok, tu di bin tesîra kîjan tevgerên hunermendiyê de mayî?*

**Riza Topal:** Pêşî klasîkên Ewrûpayî, paşê împresyonistan li ser min tesîreke mezin kirin. Paşê gelek wênekaren mezin û gelek tevgerên hunerî mîna kubîstan, faûîstan, futurîstan, dada, nabî, ekspresyonîst, surrealîst û metafizîkan cih bi cih li ser min tesîr kirine.

Lê min di sala 1960-64'an de wêneîstikama xwe guhert. Ez ketim ser rîya prîmîtvîzmê. Hewesa min li ser hunera Mezopotamya û Misra kevin gelek zêde bû. Ez ji bo xwe li rîyeke teze geriyam û min navê wê jî bi ARKAÎSMÛS navand. Formên îlkel, rengên qedimmayî bi



kontrastxetan ew çêdikirin. Min ji wan hinek motîfên Hatiyan ( Hetav-Hetîtan) çêkiran.

Piştî tahsîla Akademiya Munixê ez dîsan ketim ser riya rengan. Min dît ku ew rê diçe ser riya abstrakê û bi wê min nikarîbû motîfên xwe û yên kurdan çêbikim, bi îfade, bi mane bikim. Hêdî hêdî ez vegeriyam ser îstikameta realîzm û surrealîzmê. Ez niha li ser wê îstikametê dixebitim.

**Nûdem:** *Rewşa te û hunera te çawa ye? Gelo tu gihîştîyî mexseda xwe, te hunera xwe kemilandiye?*

**Riza Topal:** Min nikarîbû wênekariya xwe gelekî bikemilînim. Ez di xwe û hunera xwe de gelek qisûr û kêmasiyan dibînim. Ez merivekî ji xwe ne razî me. Ez gelekî ji lêkolîn û lêgerînê hez dikim. Lê karê min yê mamostetiyê gelekî dema min digire. Ku ew nebûya asteng ez bawer im min ê bikarîba wênekariya xwe hê jî bi pêş de bibira û hunera xwe bikemilanda. Lê ez bi emrekî dirêj hertim destgîrêdayî mame. Ez car caran ji xwe re dibêjim, ma qey ez di zîndana jiyânê de dijîm.

Lê ez dîsan bi hemû îmkanan digirim û ez li kuderê firsendekê dibînim ez tavilê dest bi xebatê dikim. Ku ew îmkana min ya wêneçêkirinê kêmbibe, ez dixwînim, an jî bi kurdî tiştan dinivîsînim. Ev yeka ha ji min re bûye xûy, bûye bingehê qedîm.

**Nûdem:** *Tu îro rewşa wênekariya çîhanê û ya kurdan çawa dibînî, an jî wêne bi çi rengî xwe xurt û kamil dike?*

**Riza Topal:** Wênekariya jî îro weke çandê, muzîkê xwe vekirîye, li hemû riyan digere û diceribîne. Ji klasîk heta pop-aksiyon huner hemû hatine ceribandin. Bi rastî ev yeka ha bûye weke nexweşiyekê di nav hunermendan de. Hemû dixwazin zû navdar û dewlemend bibin. Ji ber vê yekê gelek hîle, dubare û sextekariya ketiyê nav wan, loma hinek di quncikan de dimînin û şerpeze dibin. Di dîrokê de em li navê gelekî ji wan rast tîn, mîna; Van gogh, Rembrandt, Vadelf...

Weke hemû gelên gerdûnê îro kurd jî ketine vê govendê û wênekariya me jî hemû riyan diceribînin. Hunera wêne li Kurdistanê tişteki nû ye, ew hê li Kurdistanê tam bi cih nebûye. Hinek wênekariya kurdan dixwazin bi motîfên kurdan yê nû senetekî derxînin, rewş û karakterên kurdan bidin naskirin. Ev tişteki ne xerab e. Divê em jî derkevin, derdora xwe nas bikin, neteweya xwe nas bikin, problemên me yê polîtîk, bindestî, tade bi reng û motîfan binin ziman. Em bi xwe jî hê gihîştîkamil nebûne, ku em tiştên bi qîmet û giranbûha biafirînin û pê navdar bibin. Hin wênekariya me bawer dikin ku ew ê vî kariya zû hal bikin û bi nav û deng bibin. Wekî din di gerdûnê de nexweşiyêke mezin heye, ku her kes dixwazin modern bibin. Ji ber wê jî ew xwe zû davêjin nav hunera mode û ji ber wê jî ew qabîliyeta xwe ya rastî berhewa xerc dikin.

Ez bi xwe dibêjim gelek rêgerîn, hunera nû tişteki ne mumkun e, çêtir e mirov hunera xwe ji dîroka xwe bigire, wê xurt bike û ber bi pêş ve bibe. Ez

dibînim yên ku dibêjin em modern in, lingên wan erdê nagirin, ew nikarin tişteki baş biafirînin. Sebeb ew e, ku bingehzanîna wan ya wênekari ya kûr nîne û gelekên wan kêr kultur in.

Divê em civata wênekaran saz bikin. Hêdî hêdî hemû xwe bi cih û bingeh bikin. Ne di bin tesîra partî û grûbên polîtîk de bin, xwe li gerdûnê bidine naskirin. Ji vê re jî alîkariyeke madî lazim e. Heta îro ev mesele

**Nûdem:** *Te heta niha di vî warî de çi kiriye? Çi kar û zerara te di hunermendiya te de çêbûye?*

**Rıza Topal:** Wênekariyê tenê madî zerar daye min. Min di jiyana xwe ya mamostetiyê de çi pere bi dest xistibin, min ew hemû di riya hunermendiya xwe de xerc kirine. Min hemû zemanê xwe di riya



çareser nebûye. Partî û sîyasetvan jî dixwazin bi me bileyizin û careke din jî me di goşan de xerc bikin. Bi rastî min tu caran nedîtiye ku ew bi me re alîkariyekê bikin, an jî me re bibin piştîvan. Berevajiya wê, ji xerckirinê pê ve tişt di bin fikrên wan de tune ye. Yên zeyif û naîv teslîmî wan dibin, da jî xwe re di goşeyan de bibin xwedî nav û şohret. Ez vê yeka han xelet dibînim. Ew mirovên wilo hem xwe û hem jî hunerên xwe pûç dikin.

hunermendiya xwe de xerc kiriye. Ji ber vê yekê jî ez heya îro qet teslîmî çi kesî nebûme. Min gelek zerar jî ji polîtîkayê kişandiye. Ji xeynî çend humanîstan min tu fêde ji kesî nedîtiye. Ez tevî sîyasetvanên me jî xebitî me, piraniya wan jî zerara madî dane min.

**Nûdem:** *Ji bilî wênekariyê çi xebat û mijûliyên te hene?*



**Riza Topal:** Ez gelekî ji çand û edebiyatê jî hez dikim. Ez dikarim bibêjim ku min gelek pirtûkên klasîk û yên modern xwendine. Ji wana gelek jê edebî, helbest, ilmzanî û yên felsefî ne. Min hinek ji wan wergerandine zimanê kurdî, zaravayê kurmancî. Weke çîrokên Isaak Bashewis Singer, Oscar Wilde, H. Böll, Wilhelm Busch û 75 çîrokên din. Ji hozanên Almanan jî ji Luther heta Günter Grass nêzîkî sed helbest min wegerandine.

Min bi xwe jî nêzîkî 200 helbest û 20 fabil, çîrokên zarokan yên dirêj min nivîsandine. Ji bilî van jî min zêdeyî 3500 helbest nivîsandine. Hemû jî bi kurdî, bi zaravayê kurmancî ne. Ji van helbestên min hinek polîtîk, çîrokders, fikirî, ilmî, felsefî û di her cûreyî de hene.

**Nûdem:** Çi gotina te ji wênekarên kurd re heye, pêşniyarên te ji bo wan çi ne?

**Riza Topal:** Gotina min ew e ku her wênekar divê haya wî ji dîroka wan hebe û xwe di aliyê zanebûn û ilim de bigihîne. Pişt re bila li ser klasîkan bixebitin, ji wênekarên bi nav û deng gelek kopiyên bikin, ku ew tê de şareza û zanehuner bibin. Bi vî awayî lingên wan dikarin erd bigirin û bibin wênekarên baş. Tabîî qabiliyet jî roleke mezin dileyize.

Gotina min hemû ev e. Ez kovarê û xwediyê kovarê gelekî spas dikim û serfiraziya we dixwazim.

# GOTINA PÊŞÎ YA ZERDEŞT

Friedrich NIETZSCHE

---

Werger: Firat CEWERÎ



*Friedrich Nietzsche*

Zerdeşt di sî (sih) saliya xwe de welatê xwe û golên welatê xwe terk kirin û bi çiyar ket. Wî li wir tama ruhê xwe û tenêtiya xwe derxist û deh salan jê aciz nebû. Lê di dawiyê de di dilê wî de guhertin çêbû; - û sibehekê bi rohilat re rabû, derket hemberî rojê û wilo got:

- Hê stêrka mezin! Ger şewqa te tunebûya, wê dilşahiya te çiqas pirr bûya!

Ev deh sal in ku tu li ser şikefta min bilind dibî. Ger ne ji min, ji qertel û marên min bûna, tu ê ji şewq û rêwîtiya xwe aciz bibûya.

Lê em her sibeh li bendî te bûn û te ji tiştê ku me dipa bêtir da me û ji bo vê me tu pîroz kir.

Binêr! Ez mîna mêşhingivîneke ku gelek hingiv daye hev, ji zanebûna xwe aciz bûme; ji min re destên ku dirêjî vê zanebûnê dibin lazim in.

Heta ku careke din zane bi dînîtiya xwe û feqîr jî bi dewlemendiya xwe dilşa bibin, ez dixwazim vê zanebûna xwe belav bikim.

Hê stêrka rijyayî! Eyn mîna ku tu êvaran di pişt behran re dadikevî jêr û bi şewqa xwe dînya xwarê rohnî dikî, ez jî dixwazim dakevim kûrahiyan!

Mîna ku mirovên tu dixwazî dakevî nava wan dibêjin; divê ez bi te re herim ava!

Hê çavên rawestyayî yên ku ji dilşahiya herî mezin jî nadexisin, min pîroz bikin!

Wê qedeha ku dike bi dev re here pîroz bike, ku zêr jê birije û bila biriqandina dilşahiye li her derê belav bike!

Binêr! Ev qedeh dîsan dixwaze vala bibe û Zerdeşt dîsan dixwaze bibe mirov.

Daketina Zerdeşt wilo dest pê kir.

Zerdeşt bi tena xwe ji çiyar daket û pêrgî tu kesî nebû. Lê gava ew kete nava daristanê, ji nişkê ve kaloyekî ku ji silûka xwe derketibû û li rehan digeriya derkete hemberî wî. Û kalo ji Zerdeşt re wilo got:

- Ev gerrokê ha ji min re ne biyanî ye: berî niha bi salan di vir re derbas bûbû, navê wî Zerdeşt bû; lê ew hatiye guhertin.

Te wê rojê xwelî dibir çiyar: ma tu ê niha jî agirê xwe bibî geliyan? Ma tu ji cezayê şewitandinê natirsî?

Erê, min Zerdeşt nas kir. Çavên wî zipîzelal bûn û cihê kirêtiyê di devê wî de tunebû. Ma rêveçûna wî ne mîna reqsê bû?

Zerdeşt hatiye guhertin, ew bûye zarok, Zerdeşt yekî şiyar e: Ma di nava yê razayî de tu ê çi bikî?

Te digot qey tu bi tenêtiya xwe di behrê de dijî û behr te dibe. Heyf e, ma tu dixwazî herî peravê? Heyf e, ma tu dixwazî ku tu dîsan laşê xwe bikişkîşînî?

Zerdeşt bersiv da:

- Ez ji mirovan hez dikim.

- Çima min xwe kişandiye bêdengiya daristanê? kaloyê ewliya got. Ma ne ji bo ku ez zêde ji mirovan hez bikim?

Niha jî ez ji Xwedê hez dikim, ez ji mirovan hez nakim. Bi a min mirov



zêdekêmasiyek e. Hezkirina mirovan ji bo min ketin bû.

Zerdeşt bersiv da:

- Hezkirin çi ye; ez ji mirovan re diyariyan dibim.

- Tişteki mede wan, kalo got. Ya baştir ew e, tu ji wan bistîni û bi wan re hilgirî. Wilo bêtir li xweşa wan diçe, tenê ku li xweşa te jî here. Û ger tu bidî wan ji sedeqeyekê zêdetir mede wan. Bila ew wê jî bi parsektî ji te bistîni!

- Na, Zerdeşt got. Ez sedeqan nadim. Ez ne feqîr im û hew.

Ewliya bi Zerdeşt keniya û wilo got:

- Wê çaxê hewl bide û xizaniyên xwe bi wan bide qebûlkin. Ew ji mirovên bi tenê şik dikin û bawer nakin ku me ji wan re diyarî anîne.

Dengê lingên we ji kuçeyên wan pirr hindik tê. Û bi şev ku ew di nava nivînên xwe de bin û bibihîzin ku berî rohilat yek di wir re derbas bûye, ew ê ji xwe bipirsin: Ev diz wê here ku?

Meçe ba mirovan! Li daristanê bimîne! Here ba heywanan çêtir e! Çima tu naxwazî bibî wekî min? Di nava hirçan de hirç, di nava çûkan de çûk?

- Baş e, ewliya li daristanê çi dike? Zerdeşt jê pirsî.

Ewliya bersiv da:

- Ez stiranan çêdikim û distirêm. Û gava ez van stiranan çêdikim, ez dikenim, digirîm, di ber xwe de dipeyivim. Ez Xwedê bi vî awayî dipesinînim.

Ez wî Xwedayê ku Xwedayê min e bi stiranan, bi girî, bi ken, bi nuhurandinê dipesinînim. Baş e, tu weke diyarî ji min re çi tîni?

Gava Zerdeşt ew gotinên ha bihîstin, ewliya pîroz kir û got:

- Ez çi bidime we! Ez zûka herim da ez ji we tişteki nestînim!

Û kalo û Zerdeşt mîna du zarokan bi hev re kenyan û ji hev veqetiyên.

Lê gava Zerdeşt bi tena serê xwe ma, ji xwe re wilo got:

- Çawa dibe ku vî ewliyayê kal hê li vê daristanê nebihîstiyê, ku Xwedê miriye.

### 3

Gava Zerdeş gihîste bajarekî herî nêzikî daristanê, wî gelek mirovên ku li meydana civiyabûn, dît. Di nava bajêr de belav bûbû, ku wê canbazek li ser ben bimeşe. Û Zerdeşt ji xelkê re wilo got:

- Ez bilindmirovî bi we didime nas kirin. Mirov tişteki wilo ye ku divê berjêr bibe. Ji bo ku hûn wî bixînin we çi kiriye? Hemû benderuhan heya niha ji xwe pê ve tişteki neafirandine. Baş e, hûn dixwazin ji vê bilindbûna mezin dakevin û li cihê ku mirov serberjêr dibe derbasî heywanetiyê bibin?

Li gorî mirovan meymûn çi ye? Tişteki ecêb e, an jî şermiyeye dilêş e. We ji kurmikeyê heta mirovantiyê rêwîti kir û gelek tiştên ji we hê kurmik in. Hûn demekê meymûn bûn û niha jî mirov ji meymûnan meymûntir in. Di nava we de ya herî zane jî bêahengî ye, dola pincar û xuyabûnê ye. Lê ma ez ji we re dibêjim bibin pincar û xuyabûn?

Binêrin, ez we hînf bilindmirovî dikim. Bilindmirov maneya nû ya gerdûnê ye. Bila xwestina we bibêje, ku wê bilindmirov bibe maneya rûyê gerdûnê!

Ez ji we lava dikim, birayên min, bi rûyê gerdûnê ve girêdayî bimînin û baweriya xwe bi wan kesên ku ji we re behsa hêviya dinyayêke din dikin, neynin. Ew bi zanebûn an bi nezanaî torrê li ber we vedigirin. Ew kesên genî yên di torrê de, ew jiyaneî biçûk dibînin.

Rûyê erdê ji wan aciz bûye; bihêlin bila herin!

Demekê gunehên ku li hemberî Xwedê dihatin kirin sûcê herî mezin bû. Lê Xwedê mir, ew guneh jî bi wî re mirin. Niha jî sûcên ku li hemberî rûyê erdê tê kirin sûcê herî mezin e. Herweha maneya hebûnê ya nexuyayî di ser rûyê erdê re girtin jî sûcê mezin e!

Demekê can laş biçûk didît: ew biçûkdîtin jî tiştêkî herî berz bû. Can dixwest ku laş jar, qebîh, palosî û birçî be. Lewma dixwest ku ji laş û rûyê erdê rizgar bibe.

Ax, ev can bi xwe jar, palosî û birçî bû: û îşkence xwesteka vî canî bû!

Lê hûn jî, birayên min, ji min re bêjin: Laşê we ji bo canê we çî dibêje? Ma canê we ne belengazî, kirêfî û rehetiya dilşewat e?

Erê, mirov çemekî gemarî ye. Ji bo ku mirov çemekî gemarî têxîne hundirê xwe û nexerabiyê bibîne, divê mirov bibe derya ( behir ).

Binêrin, ez ji we re behsa bilindmirovî dikim: ew ev derya ha ye. Biçûkdîtina we ya mezin dikare di vê deryayê de binav bibe.

Tiştê herî mezin ku hûn dikarin bijîn çî ye? Gotina kêmdîtina mezin e.

Gotina ku dilşahî, bîaqilî û bêhnpakîya we jî bi we palosî dixuye.

Gotina ku hûn dibêjin: "Ma dilşahiya min çî ye! Belengazî, kirêfî û rehetiya dilşewat e. Lê divê hebûna wê bi xwe dilşahiya min bi heq derxîne!"

Gava hûn dibêjin: "Ma aqilê min çî ye! Ma ew mîna bêfikirîna şêrekî ya xwarinê, bêriya ilim dike, ew belengazî, kirêfî û rehetiya dilşewat!"

Gava hûn dibêjin: "Bêhnpakîya min çî ye! Hê ez dêhn nekirim. Ez çiqas ji qencî û xerabîya xwe aciz bûme. Ew hemû belengazî, kirêfî û rehetiya dilşewat e!"

Gava hûn dibêjin: "Ma rastiya min çî ye! Ez ne agir û komir im, ez dibînim jî. Lê rastî agir û komir e!"

Gava hûn dibêjin: "Ma dilşewatiya min çî ye ku! Ma dilşewatî ne çarmîxkirina mirovhezekî ye? Ew ku dilşewatiya min ne çarmîxkirin e".

Hûn hîç wilo peyivî ne? Hûn hîç wilo qîrîyan in? Ax, min carekê qîrîna we ya wilo bibihîsta!

Ev ne sûcê we ye, qîmanîna we ji asmanan re dike qîrîn, adîbûna di gunehkariya we de qîrîniyê li asmanan dike! Birûska ku dê we bi zimanê xwe bialêse li ku ye? Bengîtiya ku rê nîşanî we bide li ku ye?

Binêrin, ez we hînf bilindmirovî dikim: ew ev birûsk e, ew ev bengîti ye.

Gava Zerdeşt wilo dipeyivî, ji nava xelkê yekî bi dengekî bilind bang kir:

''Me têra xwe li canbazê ben guhdarî kir, ka me canbaziya wî bidîta?'' Û hemû kes bi Zerdeşt kenîyan. Lê ji canbêz webû ku ew gotin ji bo wî hatibû gotin, dest bi canbaziya xwe kir.

4

Lê Zerdeşt li xelkê nihêrî û ecêbmayî ma. Paşê wilo kerem kir:

- Mirov di navbera heywan û bilindmirovên de benekî şidiyayî ye, benekî li ser kortalekê ye. Derbasbûneke bi tirs, rêwîtiyeke bi tirs, lipaşnihêrîneke bi tirs, lerizandin û rawestandîneke bi tirs.

Mezinahiya di mirovan de ew e, ku mirov bi pire be, armanc ne mirovhezkerin e, lê derbasbûna hember û windabûn e.

Ez ji mirovên ku nizanin bijîn hez dikim, ger ew bi çûyina xwe ya ava (windabûna xwe) zanibin, ji ber ku yên derbasî hember dibin ew in. Ez ji kêmdîtînen mezin hez dikim, ji ber ku ev mirovên xwedîxatir in û tîra bêrîkirina hember in.

Ez ji mirovên ku li pişt stêrkan li sedemekê digerin û dixwazin herin ava û xwe bikin qurban hez nakim. Ez ji mirovên ku dixwazin rûyê dinyayê rojekê bibe bilindmirov, yên ku xwe ji rûyê dinyayê re dikine qurban hez dikim. Ez ji mirovên ku ji bo zanîne dijîn û yên dixwazin wê rojekê bilindmirov bijî, hez dikim. Ew windabûna xwe wilo dixwaze.

Ez ji yên ku ji bilindmirov re malan ava dikin û hewl didin ku ji wî re erd, heywan û pincêr amade bike û îcad bike hez dikim. Ji ber ku ew windabûna xwe wilo dixwaze.

Ez ji yên ku ji bêhnpakiya xwe hez dikin, hez dikim: Ji ber ku bêhnpakî xwesteka windabûnê ye, tîra bêrîkirinê ye.

Ez ji yên ku ji bo xwe tenê dilopek ruh jî venaqetînin û dixwazin seranser bibin ruhê bêhnpakiya xwe hez dikim. Ew bi ruhî wilo di ser pirê re dimeşe.

Ez ji yên ku ji bêhnpakiya xwe mêldariyê û çarenûsê çê dikin hez dikim. Bi vî awayî ew dixwaze ji bo bêhnpakiya xwe bijîn, an jî ew qet naxwazin bijîn.

Ez ji yên ku komek bêhnpakî naxwazin hez dikim. Bêhnpakiyek ji du bêhnpakiyan bêhnpaktir e. Ji ber ku çarenûsa bi dardekirî girêkeke hê zehmettir e.

Ez ji mirovên destbela hez dikim; ew ne spas dikin, ne jî spasî dipên. Ji ber ku ew her didin û naxwazin xwe biparêzin.

Ez ji yên ku gava zara wan nayê li ber xwe dikevin û dipirsin hez dikim: ''Ma qey ez lîstikvanekî hîlekar im?'' - ji ber ku ew dixwaze wî bibe.

Ez ji yên ku berî destpêka karên xwe gotinên zêrînfî direşînin û tim jî sozên ku didin bêtir kar dikin, hez dikim. Ji ber ku ew dixwazin wî bibin.

Ez ji yên ku pêşerojê biheq derdixin û yên paşerojê jî azad dikin hez dikim. Ji ber ku ew dixwazin ji aliyê yên niha wî bibin.

Ez ji yê ku Xwedayê xwe tîne ser rê hez dikim, ji ber ku ew ji Xwedayê

xwe hez dike. Divê ew bi qehra Xwedayê xwe winda bibe.

Ez ji yê ku gava xemgîn e jî dilfireh e û dikare ji tiştên biçûçik winda bibe, hez dikim. Ew bi vî awayî bi kêf di ser pirê re derbas dibe.

Ez ji yê ku dilê wî difûre hez dikim, wilo ye ku ew xwe ji bîr dike û her tişt di hundirê wî de ye; bi vî awayî her tişt dibe windabûna wî.

Ez ji yê ku dilê wî û ruhê wî azad e hez dikim: wilo serê wî dibe cewhera dilê wî, lê dilê wî wî dajo ser windabûnê.

Ez ji her kesên ku weke dilopên giran ji ewrên reş yê ku bi ser mirov de daliqyaye, diniqute hez dikim: ew nûçeya hatina birûskê didin û ew bi nûçevanî winda dibin.

Binêrin, ez nûçegihênê birûskê me û ez dilopên giran ku ji ewr têne xwarê me: nexwe birûsk bilindmirov e.

## 5

Piştî ku Zerdeşt ev gotinên ha gotin, dîsan li xelkê nihêrî û bêdeng ma. "Wa ew li wir in" wî ji dilê xwe re got. "Ev e, dikenin, ew min fêhm nakin. Ez ne devekî li gorî guhên wan im.

Ji bo ew hîni guhdarîkirina bi çavan bibin, ma gelo divê mirov pêşî guhên wan biteqîne? Ma divê mirov ji wan re li defê xe û wazan bide? An jî ew tenê baweriya xwe bi laliktîyê tînin?

Tiştêkî wan heye ku ew ji ber bi gûrûr in. Ji wî tiştê ew pê bi gûrûr dibin re çi dibêjin? Kultur dibêjin, - ev e ya ku wan ji şivanên bizinan vediqetîne.

A ji ber vê ye ku ew naxwzin gotina "biçûkdîtin" ji bo wan bête bikaranîn. Wê çaxê ez jî bangî gûrûra wan dikim.

Ez ê peyva xwe ji wan re, ji ya herî layiqî biçûkdîtinê ye vekim, - ew mirovê dawî ye.

Û Zerdeşt wilo ji xelkê re got:

Dema ku mirov ji xwe re armançekê bi dest bixîne hatiye. Dema ku mirov tovê herî berz yê hêviyê biçîne hatiye. Hê jî erda wê ji bo vê yekê bi ber e. Lê ew ê ev erdê ha rojekê feqîr bibe û wê bêhêz bibe û wê qet darên bilind lê hêsin neyên.

Heyf e, wê mirov nikanibe tîra hêviyê ji mirovan wêdetir biavêje û dema kevan dengê vingîniya xwe ji bîr dike tê!

Ez ji we re dibêjim: divê di hundirê mirov de xirecir hebe da stêrkekê bine dinyayê. Ez ji we re dibêjim: Ev tevlihevî hê bi we re heye.

Heyf e! dema êdî mirov nikanin stêrka bînin dinyayê tê. Heyf e, mirovê ku herî layiqî kêmdîtinê ye, dema ew xwe hew kêmbibîne tê.

Binêrin! Ez m i r o v ê d a w î nîşanî we didim.

"Evîn çi ye? Afirandin çi ye? Hesret çi ye? Stêrkek çi ye? mirovê dawî wilo dipirse û çav dide.

Wê çaxê wê rûyê dinyayê biçûk bibe û mirovê dawî yê ku her tiştî li ser

rûyê dinyayê biçûk dike wê biqevize. Ew wek kêça axê ye, koka wê naqele. Mirovê dawî yê herî temendirêj e.

''Me dilşahî dît'' mirovên dawî dibêjin û çav didin.

Ew ji deverên ku ji bo jiyane zehmet in veqetiyane. Ji ber ku ji mirovan re germahî divê. Mirov hê jî ji cîranê xwe hez dike û xwe tê dide. Ji ber ku ji mirov re germahî pêwîst e. Bi a wan nexweşî û bêbawerî gunehkarî ye. Bi ihtiyadî tê meşandin. Yê ku hê jî lingê wî li mirov û kevîran hildikume û diterpile ew ehmeq e.

Carinan di nav re hinek jehr: ev xewnên şêrîn bi mirov dide dîtin. Û paşê gelek jehr ji bo mirinek şêrîn.

Hê jî xebat tê kirin, ji ber ku xebat şahî ye. Lê li zerarnedayina şahiyê tê nihêrîn.

Êdî mirov ne dibe zugurd ne jî dibe dewlemend. Herdu jî têra xwe zehmet in. Kî hukumkirinê dixwaze? Kî guhdarî dike? Herdu jî zehmet in.

Keriyekî bê şivan! Her kes eynî tiştî dixwaze, her kes wekhev in. Yê ku bi celebekî din bixwazin ew bi dilê xwe diçine Dêhnaxanê.

''Demekê hemû dinya dêhnûye'' yê herî ziravê wan dibêje û çav dide.

Ew biaqil in û bi her tiştên ku li der û dora wan dibin dizanin: bi vî awayî dawîya tinazê wan nayê. Ew hê şer dikin, lê zû li hevdu tên, an na ew ê mîda wan xerab bibe.

Ji bo bi roj zewqên wan yên biçûk, ji bo bi şev jî zewqên wan yên biçûk hene: Lê ew ji rehetiyê re bi hurmet in.

''Me dilşahî dît'' mirovên dawî dibêjin û çav didin.

Û li vir ew ''gotina Zerdeşt ya pêşî'' dawî hat. Ji ber ku di vî navê de qerebalixa xelkê û kêfa wan peyva Zerdeşt birrî. ''Vî dawîmîrovî bide me hê Zerdeşt!'' bi qîrîn bang dikirin.

''Me bike weke van dawîmîrovan, paşê em ê jî bilindîmîrovî bidine te!'' Û hemû xelkê li wir kêfeke bi şehwet dikirin û devê xwe dibirin û tanîn. Lê Zerdeşt xemgîn bû û ji dilê xwe re got: ''Ew ji min fêhm nakin, ez ne devekî li gorî guhên wan im''.

Xuyaye ez gelekî li çîyan mame, min gelekî li çem û daran guhdarî kiriye. Niha mîna ez bi şivanên bizinan re dipeyivim ez bi van re dipeyivim.

Sibehan çiya çawan be ruhê min jî wilo sakîn û zelal e.

Lê belê ji wan weye ez henekîreke ku henekên sar û bi tirs dikim.

Ev e, ew li min dinihêrin û bi min dikenin. Bi min dikenin û ji min nefret dikin. Kenê wan wek cemedê ye.

Paşê tiştêkî ku hemû dev dane rawestandî û hemû çav beloq kirin, bû. Ji ber ku di vî navê de canbazê ser ben dest bi canbaziya xwe kiribû. Ew li ser benê ku ji deriyekî biçûk derketibû û di nava du qûleyan de bi ser xelkê û mazatê

ve şidiyayî bû ve dimeşiya. Tam ew nêviyê rê çûbû, deriyê biçûk dîsan vebû û peyayekî bi kincên tewlomewlo ku dişibiya qirdikekî di şopa yê din de bi lez û bez meşiya. "Bi pêş ve here, kûto!" ew bi dengê bilind û ecêb qîriya. "Bi pêş ve here hîlebaz, kirêt, gwînmirin, bi pêş ve here, an na ez ê pê li te bikim. Çi karê te di nava van qûleyan de heye? Cihê te hundirê qûleyê ye. Divê tu di pişt wir de bêyî kilîtîkirin, tu rê li ber yê ji xwe mezintir digirî!" Û ew bi her gotina xwe re her ku diçû nêzikî yê pêşiya xwe dibû. Lê belê gavek mabû, ku ew tiştê ecêb yê ku hemû dev dabûne rawestandin û hemû çav beloq kiribûn, bû. Yê qirdik mîna şeytanekî kire qîrîn û xwe di ser mêrik re avête aliyê din. Gava yê din ew serfiraziya raqîbê xwe dît, serê wî gêj bû, gavên xwe şaş kirin û mirdiyaqê xwe avêt, û mîna badana mil û çimekî berî mirdiyaqê xwe gindirî erdê. Mazat û xelkên li mazatê bûbûn mîna behreke ku bahoz lê rabûbe. Tew cihê ku wê laş lê biketa, xelk jê vir de û wê de bazdidan.

Lê Zerdeşt ji cihê xwe tevnêliviya. Laşê ku perçe perçe bûbû, lê hê jî ruh jê nekîşiyabû, li ber lingên Zerdeşt ket. Piştî kurtedemekê hişê mêrikê ku perçe perçe bûbû hate serê wî.

"Tu li vir çi dikî?" Mêrikê li erdê got: "Min ji mêj ve dizanîbû ku wê ew şeytanê ha ling biavêje ber min. Ew niha min dajo dojehê: ma tu nikanî ji vê yeka ha re bibî asteng?"

Zerdeşt lê vegerand: "Bi şerefa min dosto, ew tiştên tu dibêjî yek jî ji wan tune ye. Ne şeytan heye, ne jî dojeh. Wê ruhê te jî berî laşê te bimire: êdî tu ji tiştêkî metirse!"

Mêrik çavên xwe bi şik hildan jor: "Ger ev tiştên tu dibêjî rast bin, bi windakirina jiyana xwe ez tiştêkî wînda nakim. Tu ferqa min û heywanekî ku bi lêxistin û bi pariyek nan hînfî lîstikan dibe tune ye.

"Na canê min" Zerdeşt got. "Te ji xwe re talûketî kiriye huner: di vê de tiştêkî ku tu li ber xwe bikevî tune ye. Niha jî tu ji rûyê hunera xwe dimirî: ji ber vê yekê ez ê te bi destên xwe veşêrim.

Gava Zerdeşt weha got, mêrikê ku li ber xwe dida zêde tişt negot, lê mîna dixwest ji bo spasîyê destê xwe bide Zerdeşt, wî destê xwe tevlivand.

## 7

Di vê navê de bû êvar û cihê mazatê tarî bû. Xelk belav bûn, tê gotin ku mereq û tirs jî diwestin. Heçê Zerdeşt bû, li kêleka yê mirî rûniştibû û difikirî. Dawî bû şev û bayekî sar bi ser yê bi tenê de hat. Zerdeşt wê çaxê rabû ser piyan û ji dilê xwe re got:

"A rastî Zerdeşt îro masîvaniyek bikêrhatî kir! Herçiqas yê wî girt ne mirovek, lê cesedek bû jî".

Jiyana mirovan hê jî bêmanetî û xemgîniyê dide. Serseriyek dikare bibe sedema mehûkirina jiyane.

Ez dixwazim mirovan hînfî maneya hebûna wan bikim: Birûska ku ji

mirovan û ji ewrên reş hiltê bilindmirov e.

Lê belê ez hê jî ji wan dûr im û zeka min bi kêrî zeka wan nayê. Li gorî insanan ez hê tişteki di navbera dêhnîti û cesed de me.

Şev tarî ye, riyên Zerdeşt tarî ne. Were hevalê sar û hişk! Ez te bibim cihekî ku ez te bi destên xwe veşêrim”.

8

Piştî ku Zerdeşt ev ji dilê xwe re gotin, yê mirî hilgirt û kete rê. Hê ew sed metreyî neçûbû, peyayek nêzikî wî bû û di guhê wî de kire pistînî:- û hûn li vî îşî mêze bikin! yê ku ev gotin, ew qirdikê di qûleyê de bû. ”Ji vî bajarî here , hê Zerdeşt!” digot. Yên ji te nefret dikin li vir gelek in. Yên qenc û baş jî ji te nefret dikin û ew dibêjin tu dijminê wan î, tu wan kêmbînin. Yên ji dînê heqiyê bawer dikin, ji te nefret dikin û ew dibêjin tu ji bo xelkê talûkeyek î. Şansê te hebû ku ew bi te kenyan. Ya rastî tu jî wekî vî kûçikê ha peyivî. Şansê te hebû te bi vî kûçikê ha re hevaltî kir. Te îro bi vî yekê hem canê xwe û hem jî şerefa xwe xelas kir. Lê ji vî bajarî here- an na ez ê sibehê xwe di ser te re jî bavêjim, yekî bi ruh di ser yekî mirî re”. Û piştî ku wî peyayî wilo got ew wenda bû. Zerdeşt jî riya xwe ya teng û tarî dewam kir.

Di derketina deriyê bajêr de ew li gorvanan rast hat. : wan meşhalên xwe ber bi rûyê Zerdeşt vekirin, Zerdeşt nas kirin û demeke dirêj henekê xwe bi wî kirin. ”Zerdeşt kûçikê ku cehemiye dibê, ox gorvaniya Zerdeşt çiqas xweş e! Ji ber ku destên me bi qasî ku bi vî pîsî nebin pak in. Ma gelo Zerdeşt dixwaze paryê şeytên bidize! Baş e wê çaxê! Noşican be!

Lê gelo şeytan ji Zerdeşt hê diztir dernekeve! Ew ê zora herdiwan jî bibe, wê wan herdiwan jî balêse û wan daqurtîne! Û ew di nav xwe de kenyan, henek û qeşmeriyên xwe kirin.

Zerdeşt gotinek jî negot û riya xwe dom kir. Piştî ew di ser çend daristan û avzêlkan re derbas bû, wî wilo li dengê zûrandina gurên birçî guhdarî kir, ku ew bi xwe jî birçî bû. Bi wî awayî ew gihîşt ba xaniyekî xewle û bi şewq û li wir sekinî.

Çi xuyên birçîbûna min yê ecêb hene. Hebûn hertim piştî xwarinê ji min re tê, lê îro qet nehat: gelo ew li ku ye?

Û wilo Zerdeşt li deriyê malikê xist. Zilamekî kal derî vekir. Di destê mêrik de rohniyek hebû û ji Zerdeşt pirsî: ”Yê ku hatiye seredana min û xewa min ya pîs kî ye gelo?

”Yekî sax û yekî mirî ye” Zerdeşt got. ”Tişteki xwarin û vexwarinê bide min, min bi roj ji bîr kir ku ez bixwim. Yê ku birçiyar xwedî dike ruhê xwe bi giyan dike: zanebûn wilo dibêje.”

Kalo çû hundur lê tavilê bi paş ve vegeriya. Nan û şerab keremî Zerdeşt kir. ”Vir ji bo birçiyar cihekî ne baş e” got, ”Ji ber vî yekê ez li vir dijîm. Heywan û mirov têne ba min, têne ba tenêtiya min. Heydê, ji hevrêyê xwe re bêje

da ew jî bixwe û vexwe, ew ji te bêtir betilî ye.” Zerdeşt bersiv da: ” Hevrêyê min mirî ye, ez ê nikaribim bikim ku ew xwarinê bixwe.” ”Ji min re çî,” mêmikê kal bi li dijderketinî got ”yê li deriyê min xe tiştê ku ez bidimê divê bixwe. Bixwin û oxira we ya xêrê be!”-

Bi vê yekê Zerdeşt baweriya xwe bi rê û bi baweriya şewqa stêrkan anî û du saetên din jî rê meşiya: ji ber ku ew hînî rêveçûna şevê bûbû, wî li temaşikira rûyê her tiştê razayî hez dikir. Lê belê gava dinya rohnî bû, Zerdeşt xwe li daristaneke asê, ku tu rê tê de tune bû, dît. Jê pê ve wî yê mirî danî ber qurmê dara rizyayî ya li ber xwe. - ji ber ku wî dixwest yê mirî ji guran biparêze, - wî jî xwe li erdê, li ser kevzê dirêj kir. Û bi bedena westiyayî, bi ruhê xwe yê ragirtî tavilê di xew re çû.

9

Zerdeşt demeke dirêj raket, ne tenê berbanga pembe herweha sibeh jî di ser ruyê wî re derbas bû. Lê dawî çavên xwe vekirin: ji dil li daristanê û li bêdengiyê nihêrî, bi heyranî li hundurê xwe nihêrî. Paşê ji nişkê ve, mîna keştîvanê ku reşayê bibîne ji cihê xwe hol bû û bi dilşahî qîrîya: Ji ber ku rastiyeke din ji wî re kifş bûbû. Û wî ji dilê xwe re wilo got:

”Di hundurê min de şewqek zaye: hevrêno, gerek ji min re hevrêyên bi ruh, - yên ku cihê ez dixwazim herimê ez bi xwe re bibim, ne hevrêyên mirinê, ne cesed.

Ji min re hevrêyên sax lazim in, ji ber ku ew dixwazin bişopînin, ew ê min bişopînin, - û cihê ku ez bixwazim.

Di nava min de şewqek zaye: Wê Zerdeşt ne ji xelkê re lê wê ji hevrêyan re bipeyive! Wê Zerdeşt nebe şivan û kûçikê keriyên.

Ez ji bo ku hinekan ji kerî veqetînim hatime. Wê xelk û kerî ji min hêrs bibin. Wê şivan ji Zerdeşt re bibêjin heydût.

Ez dibêjim şivan, lê ew ji xwe re dibêjin mirovên rast û qenc. Ez ji wan re dibêjim şivan, lê ew ji xwe re dibêjin yên ku baweriya xwe bi dînê heq tînin.

Hela tu bala xwe bide yên rast û qenc! Ew herî pirr ji kê nefret dikin? Ew ji yên ku lewheya qîmeta xwe perçe dikin, yên xerabiyê dikin, yên qanûnan xerab dikin: - ew ku yê afirandêr e.

Ca hûn bala xwe bidine bawermendên hemû baweriyên! Ew herî pirr jê nefret dikin, ji yên ku lewheya qîmeta xwe dişkînin, xerabiyê dikin, qanûnan xerab dikin: - ew ku afirandêr e.

Hevrê li afirandêran digerin, ne li cesedan, li keriyên, li mirovên bi bawerî. Afirandêr li afirandêrê mîna xwe digere: yên ku li lewheyên nû qîmetên nû dikolin.

Afirandêr li hevrêyan û li hevalên benderê digere: ji ber ku li gora wî her tişt ji bo teneyê gihîştî ye. Lê sed dasên wî tune ne: ji ber vê yekê ew bi hêrs hinin din dişîne.



Afirandêr li hevrêyan digere, li hevrêyên ku dixwazin dasên xwe seqa bikin. Wê ji wan re xopanker bête gotin, wê bêje yê qencî û xerabiyê biçûk dibîne. Lê belê yê bëndervan û kêfker ew in.

Zerdeşt li afirandêrên nola xwe digere, li hevalê benderê û yê kêfê digere: çî karê Zerdeşt bi keriyê pezan, bi şivanan û bi cesedan heye?

Û tu, hevrêyê min yê pêşî, di xweşiyê de bimîne! Min tu baş di qurmê darê de bi cih kir, min tu baş ji ber guran veşart.

Lê ez niha xêtir ji te dixwazim, ji ber ku dem hatiye. Di navbera du berbangan de ji min re rastiyeke xuya bûye.

Ne ez ê bibim şivan, ne jî gorrvan. Ez ê careke din ji xelkê re tişteki nebejim: ez cara dawî bi miriyekî re peyivîm.

Ez ê tevlî afirandêran, bëndervanan û yên ku şahiyên dikin bibim. Ez ê keskesorê û mêrdewana ku mirov pê diçe ba bilindmirovên nîşanî wan bidim.

Ez ê stirana xwe ji yên bi tenê û ji duduyên bi tenê re bistirê: û yên bi guh ku ev nebihîstine ez ê bi dilşahiya xwe dilê wan giran bikim.

Ez di riya armanca xwe de me, min riya xwe dîtîye; ez ê xwe di ser yên ku radiwestin û li paş dimînin re biavêjim. Bila bi pêşketina min windabûna wan be!”

## 10

Tam gava roj bi qamekê bilind bûbû, ya ku Zerdeşt ji dilê xwe re got ev bû: paşê mîna ku pirsinan bipirse wî li jor nihêrî- ji ber ku wî li jorî xwe qajîna çûkekê ya bi dilşewat bihîstibû. Ca binêrin, qertelekî li hewa xelekên fireh çê dikirin û difiriya û marekî xwe pê ve daliqandibû, ne mîna neçîrekê, lê mîna dostekî: lewra mar xwe li stûyê qertêl gerandibû.

”Ev heywanên min in”, Zerdeşt got û ji dil kêfxweş bû.

”Heywanê di binê rojê de yên herî qure û yên herî biazil- derketibûn keşfê.

Wan dixwest hîn bibin bê hê Zerdeşt sax e an na. Gelo bi rastî jî ez hê dijîm?

Min jiyana bi mirovan re bi jiyana bi heywanan re talûketir dît; Zerdeşt di riya talûke de dimeşe. Bila heywanên min ji min re rêberiyê bikin!”

Gava Zerdeşt wilo got, peyva ewliyayê daristanê bi bîr anî, bêhna xwe berda û ji dilê xwe re wilo got:

”Min dixwast ez hê biaziltir bim! Min dixwast ez bi hebûna xwe re biazilbûma, eynî weke marê xwe!

Lê belê ez tiştên ku ne mimkun e dixwazim. Ji ber vê yekê daxwaza min ji gûrûra min ew e, ku ez her bi aqilê xwe re dimeşim. Û ger rojekê aqilê min min bi tenê bihêle û here: ax, aqilê min ji çûyinê hez dike!- bila hingî gûrûra min bi dêhnîtiya min re baz de!”

Windabûna Zerdeşt wilo dest pê kir.

---

## Dr. Cemşîd BENDER



''Je ne veux pas voir je sang'' Serrano helbesta Lorca dixwend. Lorca ew helbesta xwe ji bo hevalemî xwe, yê matador, ku ji aliyê ciwangeyekî har ve hatibû kuştin, nivîsandibû. Ji her gotineke wê xwîn dipijiqî, gotinên bi

dû de dihatin jî dîsan bi xwînê dihatin xemilandin. Serronê spanyolî berê xwe dida welatê xwe, yê ku bi kîlometreya li dû xwe hiştibû. Piştî malika pêşî ya helbestê wî bêhna xwe berda. Xuya bû şerê Spanya yê hundir hatibû bîra wî. Ordiyek esker di bîbikên çavên wî de dimeşiya. Bi emrê general girtin ser mala Federico Lorca. Wê şair bi helbestên xwe yê humanîst ve bihata gulebarankirin. Wilo jî bû. Çend gulle li azadiya wî hatibûn reşandin. Xwîna ku ji dilê wî yê pak herikî bû, li erdê belav bûbû. '' Je ne veux pas voir le sang'' Serranoyê westiyayî got. Wî çavên xwe yê bi xuman firkandin.

Li dor masa xwarinê em çar kes bûn. Tchenê Vietnamî qet nedipeyivî. Ew helbesta ku Serrano dixwend ew ajotibû kûraniya fikran. Bîranînên Tchen yê ku li erdên birincê hatibûn reşandin hebûn. Rûyên termên ku heta nêvî di nav ava pirrikî de, bê mane ber bi asman ve bûn. Gulle ber bi çiyayên horikî û ber bi daristanên kesk ve difiriyên. Dengê ji makînan dihat newalek dadigirt. Te digot qey Tchen jina xwe zaroka di dest de, ji xaniyekî ku dişewite derdikeve, dibîne. Jinik bê rohnî direviya. Paşê ew terpilî û kete xwarê. Ew birîndar bûbû. Xwîn ji devê wê dihat. Tchen çavên xwe girtin. ''Bêşerefnî'' got. Paşê bêdeng ma. Aciz bû. Lê ji bo ku ew xwe ji wan dengên makînan rizgar bike şorba xwe xwar.

Serrano ji cihê ku mabû dewam kir. ''Je ne veux pas voir le sang'' got. Ji her gotinekê dîsan xwîn dinuqutî. Te digot qey ciwangeyê har ji bo ku qulonçê xwe rind lê bixe berepaş diçû, li nêçîra xwe temaşe dikir. Ji aliyê din

ve jî dîsan refek esker gulleyên mirinê ajotin ber tivingên xwe.

Giraniyek daketibû sersiframe. Te digot qey berpirsiyarê van şaşiyên em bûn. Di hêwana xwarinê de grûbên cihê cihê bi dengê bilind dipeyvîn. Piştî ku grûbeke şên ya fransîzan şeraba xwe bi ser xwe dagirin, dest pê kirin û perçeyên nên avêtin maseyên din. Ne xema kesî ji wan bû.

Mirovê sêyemîn, Henicheyê cezayirî bû. Wî nuh şorba xwe qedandibû. Wî hertim bi lez dixwar. Mîna ew li kesî guhdarî nake dixuya û rojnameya Le Mond ya ku li ser çongên xwe bi cih kiribû, dixwend. A rast hişê wî baş li helbesta Serrano bû. Wî gotinên helbestê di serê xwe de dibir û tanî. Li Telemcanê, Oranê, Algerê ji nû ve bombe teqiyabûn. Du welathez li giyotîne razandibûn. Bi koman zarokên bê kes û jinan ber bi Tunîsê ve koç dikirin. Nêviyên wan di rê de mabûn. Ji bêhnna mirov nikarîbû di serçiyên re derbas bibûya. Fransîzan du gund ji kokê de sewitandibûn. Serê Henichjî ber bi jêr bû, rojnameya li ser çongên wî şemitî û kete xwarê.

Serrano bêhna xwe digirt û berdida. Ew westiyayî gihîştibû dawiya helbestê. Wî guh nedida me kesî. Lê me ew gotinên ku di cih de hatibûn bikaranîn zebt dikirin, te digot qey ew xwîna ku bê rawestan diherike, ji damarên me der dibû. Erê, ew xwîna ku bê navbir ji helbestê diherikî xwîna me bi xwe bû. Gava wilo bû Serrano guh nedida me. Ew bi Lorca re di nava helbestê de bûn. Di her gotina "Je ne veux pas voir le sang" de axîn dikişand, diheliya. Weke ku hemû şaşiyên ji

dîroka mirovantiyê û bi vir de hatibûn kirin em berpirsiyar bûn, me bi stûxwarî uzra xwe dixwest. Serrano em nedidît. Wî xwe dabû têkoşîneke hundirê xwe.

Helbest xelas bûbû. Serrano bi navbirr dikuxuya. Wî destê xwe yê ku di binê masê de veşartibû hêdfika hilda jor. Destmala ku bi destê xwe ji hev vekiribû bir ber devê xwe. Destmala spîboz li ber çavên me spîsor bû. Serrano xwîna dikuxuya. Wî serê xwe bi hemû bêhêziya xwe bera jêr da. Paşê ew bi ser masê de ket.

Garsonê ku surehiya me nû kir, pêştî ji nalîna Serrano ya li hemberî sê kesan tişt fêhm nekir. Ji ber ku em di rawestîneke bi hurmet ya bê tarif de bûn. Me bi her tiştî dizanîbû. Garson serê xwe ber bi Serrano ve tewand, ew xwîna ku ji destmalê diherikî dît. Paşê ji bo ew bang doktor bike ji ba me baz da û çû.

Çiyayên Alperê li hember me bi rêz dibûn. Senatoryuma unîversîta Touvet ya St. Hilaire li geliyekê, li ser zinarekî bilind hatibû avakirin. Me ji hêwana xwe ya xwarinê, kanîbû kendalê ku heystsed metreyî bilind, bi hemû spehîtiyên wê yên wehşî bidîta.

Bajarvanî li vir bûbû mal, derbend, elektrîk, rê û av bi piştan ber bi gelî ve daketibû. Çemê Îsere mîna xetêke zîv ew gundên ku ji huzûrê pê ve tu nesîbê wan tunebû, kom bi kom ji hev vediqetandin. Dibû ku niha li daristana kesk ji çûkên ku dixwînin û jin û mêrên ku ji hev hez dikin pê ve, tiştêk tunebe. Gul û dar bi spehîbûneke bê sînor geş dibûn.

# ÇAME

Octavio PAZ

Wergere: Ehmed HUSEYNÎ  
Ûmîd MEHDÎ



*Du têbînî:*

*Yê ku bixwze sûdekê ji vê lêkolîna O. Paz wergire, pêwîst e wê du-sê caran bixwîne.*

*Di wergerandinê de, me di şûna peyva (poem) de, wîşeya soranî ÇAME bi kar anîye û di şûna peyva (şîr-poetry) de jî me wîşeya helbest bi cih kiriye.*

Ehmed-Hindirîn

Eger em bawer bin ku kirina helbestî (şîrî) ji kirinên dîtir cuda ye, dixwazim rohnî bikim, çawan mirov dikare vê kirina ku nayêt bişaftin tevî cihan bike: Helbest ne ol û ne raman û ne jî afsan e, lewra em dibînin ji bo ku xwe di çamê de bi gewde bike, xwe dispêre tiştêkî jê re biyan (xerîb), erê tiştêkî jê re biyan e, lê helbest nikare bêyî wî tiştê biyan berceste bibe (tecesud bibe). Çame helbest e, lêbelê ji bilî ku helbest be tiştêkî dîtire jî. Ev tiştê dîtir ne lêzedekirin û niçik in, lê beşeke ji avahiya çameyê cuda nabe. Çameya zelal ya ku peyvên wê dev ji angoyên xwe (mana) û amajên xwe û çavkanî (mesder) û delaletên xwe ên taybetî berdidin. Ta ku mebesta wê ji bilî kirina helbestî tu tiştêkî dîtir nabe. Ji ber vê yekê çame wenda dibe. Çimko peyvên ku hene tenê angoyên van tiştan an ewan tiştan in. Yan angoyên rêjeyî û dîrokî ên tiştan in. Û Çameya zelal nikare tenê ji peyvan pêk bê. Çimko rê nade têgihîştinê, di eynî wextê de em dibînin, ew çameya ku pevçûnê li dijî xurusta peyvan neke, naçare ku bi dû (xwe) ya xwe û bi dû angoyên rêjeyî de biçê. Çameya ku bi kotekî peyvan nedeHFine derbirîna (Tabîra) wan tiştên ku nayên derbirînkirin, ew dibe lîskek wişe û peyvan.

Tiştê herî girîng ê ku çamê cuda dike, peywendiya germ û gur ya bi peyvê re ye, ew pevçûna wê, ta ku peyvê bike aferîdeyekî jîndar e. Çama bi xurusta xwe yekane ye, ne tê bişaftin û ne jî hilandin, di eynî wextê de derbirîneke civakî ye ji derbirînen dîtir

ên dîrokî cihê nabe. Çame bûnewerek (kaîn) ji peyvan e, lêbelê ji peyvan durtir têt radan, eger dîrok nikaribe çameyê bi dawî bike, hebûna çameyê jî bêyî dîrokê nîne, ango bêyî wê reha ku çameyê bi xwarin dide an ya ku çame xwarina xwe jê werdigire. Peyvên helbestvan madem peyv in ew xawanê (milkê) wî ne û di eynî wextê de jî ew jê re biyan in. Herweha ji alîkî ve dîrokî ne, ên miletekî ne, ên kêlîkekê jî dîroka zimanê vî miletî ne û ji alîkî din ve jî berya dîrokê ne ango mutleq in. Wek nimûne, em dibêjin: Eger ne ji wan doxên (zirûf) giştî ên ku tiştêk bi navê Igrîk sazkirine, bûya, dê ne llyada û ne jî Odise hebûna. Belam ew rastiya dîrokî ya ku wek Igrîk têt nasîn, dê herdemî û herheyî û sepandina hebûnê (Ferz el wicûd) jê re nehata nivîsandin eger ev herdu destan nebûna.

Demek çame ew berevajiya hev girtî ye. Tevnek ji peyvên dîrokî ye, kirinek resen e (esîl), derbasî sîsîka dîroka komelane û kesane dibe. Derbirîna komelê ye (civakê ye) û merceke bo hebûna wê, ango bê zimanekî hevbeş (muştêrek) helbest nîne, herweha bê zimanekî helbestî ne komel, ne dewlet, ne kînişt û ne jî tu civakên dîtir hene. Zimanê helbestî cot-ango ye (du mane ye) her yek ji wan a dîtir tewaw dike. Ev cot-ango dijî hev in û di yek wextê de ji hevûdu ne cuda ne:

Angoya yekem: Ku helbest encameke pirjimarî komelayetî ye.

Angoya diwem: Ku helbest merceke ji mercên hebûna her komeleyê ye.

Di çameyê de, ziman di encama

xwe ya dawîn de, tenê dîrok û nîşandana cihanê dîrokî girtî ye, di çarçewêke nimûnedar î navendî de angoya xwe bi kar tîne. Takekes (ferd) yan komikek xelk û komikên peyvan û tişt û dox (zirûf) û kesên ku çîrokekê pêk tînin, angoya xwe ji ziman werdigrin, ew zimanê ku wan dike yek û wan bi hevûdu girê dide. Ev ziman dîrok nîne, herweha hîç peywendiyek wî jî bi rabirdû re nîne, herdem amade ye, herweha, herûher di tezebûnê de ye, di xwenûkirinê de ye. Tiştê ku Homeros ji me re dibêje ne dîrokek rabirdûyî ye (mazî), herweha ne tenê rabirdû ye jî, belko komine ji peyvên ronak in, bi demê re harmonî ne, rêça xwe di nava demê de diqelêşe û bi alî êste de têt. Ew tiştêkî ku her û her di xwenûkirinê de ye. Hema ku lîvên me wan /şêşîn/ ên kevnar tînin zimên yekser ew tiştê ku bi hebûna xwe herdemî ye têt vejandin û dîrok jî cîgehaku zimanê helbestî têt de berceste dibe. Çame haletêk têramandinî ye (teemulî ye). Têramandina di navbera ezmûniyêke resen û çend karên dîtir û ezmûneyên dahatûyî de ye, ên ku angoyên xwe û hevgerdanên xwe bi xwe ve nagirin eger venegerin ezmûneya seretayî ya ku çame ji bo bercestdîkirina wê hatiye pê. Ev derbirîn ji bo çameya destanî û ya stiranî û ya diramatîkî bi kêr têt. Û dema dîrokî ya ku ji zimanekî hevbeş û ji rewşêke pirjimarî û yekjimarî pêk têt, di nava wê de guhertinek dijwar diqewime: Bidûhevdehatin û berdewamiyê hew diparêze, her kêlîk dibe xwedan pêş û paş, ango tiştêk heye ku berya wê çê dibe û tiştêkî din jî bi dû wê de û pê ve girêdî çêdibe. Li vira çame rêçeke. Ev

rêç cihêbûnê dixîne navbera kêlîka taybetî û dema dîrokî, ji ber tişteke li vira heye hewl dide ta ku rehê vê kêlîkê biçesipîne: Evîn, karekî qehremanî, xewneke xwedanî, rawestaneke surdar li beramberî darekê an li beramberî aniya nerm ya Diyanayê ku wekû dîwarekî şaytok e. Dêmek ev kêlîk balkêşana xwe î taybetî ya ku wê dorpêç dike, durust dike, li vira ew bi helbestê terxanekirî ye (Tekrisdevotion) mîna kûrtirîn terxanekirin.

Çame ligel tixûbên matematîkzanan û ligel rastiyên zanyarên xurustê û ligel ramanên feylesofan di dijîtiyê de ye. Çame bi tecrûbê ranaweste, ango ne ezmûniyek (tecrûbeyek) rût e, lêbelê wê ezmûneyê bi hemî jiyana wê û bi hemî nîşanên wê ên taybetî diguhêze. Ta ku bikaribe kêlîkên teze û ezmûneyên nû ron bike.

Evînbaziyên (love affairs) SAPHO, û SAPHO jî di dîroka zemanî de tu carî dubare nabe, lê helbestên wê her bi jîndarî dimînin, çimko perçeyek in ji demê hatine birrîn, bi newayên xwe (rîtim) dikarin di hemî deman de berceste bibin, herweha bi şeweyekî herdemî jî. Bibûrin ku min navê helbestên SAPHO bi /perçe/ anî zimên çimko xwe bi xwe cîhanek xweser in û demeke hîlbijartîne, ne rabirdû û ne jî dahatû bi xwe ve digirin, belko hebûnek herdemî ne. Her ev taybetî ye ya ku çameyê dike heyinek herdemî, ya ku wê ji diyalektîka herikîn ademê û ji sînorên dîrokê diparêze. Her ew bi xwe jî peywendiya çameyê bi dîrokê re xurttir dike û çameyê bêtir bi dîrokê ve girê dide.

Ku ne di vê kêlîka anuha de be

ango ne di nav xelkê de hebe anuha bi xwe nîne, ji bo ku çame hebûna xwe di kêlîka anuhayî de bi destxîne pêwîst e di nav xelkê de amade be, pêwîst e xwe di dîrokê de bi gewde kiribe.

Çame wekû her prosesek afirandî, wek hemû çêkirinên mirov, berhemek dîrokî ye ango derbirîna (tabîra) cî û demekê ye, belam le hemû katan de (di eynî wextê de) tişteke dîrokê berz û serbilind dike û di kêlîkê de, ku ev kêlîk berya hemû dîrokan e, şûna xwe digre. Di destpêka destpêkê de, dêmek çame berya dîrokê ye, herweha ne li derî dîrokê ye. Çame berya dîrokê ye çimko nimûnedarek giranbuha ye û ji dîrokkirinê re asê ye û çame destpêkek reha ye (mutleq), dêmek giştî û xwe yî (zafî) ye, xwe bi xwe tîrkirî ye. Çame di dîrokê de ye, bi angoyek dîtir ew bi xwe dîrok e. Eger ne di jidayikbûneke nûjen de be najî û eger ne di wê dîbarekirina ku derbasî kêlîka rizgarkirina helbestî de be jî najî.

Dêmek bêyî dîrokê an bêyî xelkên ku kakila dîrokê pêktînin, ku çiyetî û mebesta dîrokê pêktînin (mahiyet û xayet) ne çame ji dayik dibe û ne jî berceste dibe. Herweha bêyî çameyî jî hebûna dîrokê nîne, çimkî bê çame em çavkanî û destpêkê wenda dikin.

Ji ber du reçavkirinan (îfîbaratan) em dikarin bêjin ku çame dîrokî ye:

1- Ji ber ku çame berhemek civakî ye.

2- Ji ber ku çame afirandineke, dîrokê ber bi berzbûnê de dibe.

Lê ji bo çame bahana hebûna xwe î berçav bi dest xîne gerek ji nû ve

di dîrokê de bi gewde bibe û di nav xelkê de jî dûbare bibe. Lêbelê reçaqkirina diwem akara berhest (sîfeta waqîî) nade çameyê, eger lanuhalya ku çame wê bi gewde dike ne lanuhalyek bi dem û cih sînorkirî be.

Çame bi xwe demek nimûnedarî ye (nimûzeczî-type). Li gor vê rewangê (munteleq-çavkanî) çame dem e, di ezmûneya diyar ya miletekî de, yan a komek mirov, yan a dibistanek ramanî de, berceste dibe. Ev hêza çameyê, angî hêza bercestebûnê di nav xelkê de, çameyê dike çavakniyek bi gîr û hêrs, ava/ anuha/ ye, ji kûrbûna/ rabirdû/ pijiqî ye/dikûrbûna/dahatû/ ya bê dawî de bi rê dikeve.

Lê rûyê diwem yê çameyê, ku dîrokî ye, rûyekî bi gelek layên berevajî ye. Lê tiştê ku çameyê dike kirinek hilbijarte tiştê ku cudabûnê dixê navbera wê û kirinên mirovane, ev xweguherîna demê î çaweyî (keyfî) di çamê de ye. Dem xwe ji rûyekî diguherîne rûyekî dîdir bêyî ku wînda bibe. Ev pirose bi xwe wa li çamê dike ku di kêlfika xwe xweguhertinê de dişê demê derbas bike.

Ji derve nêrîn li peywendiyên di navbera dîrok û çameyê de, qunaxa cudabûnê diyar nake. Mîna ku berê me gotibû, çame berhemek civakî ye. Hetanî wexta ku em cudabûnê di navbera helbest û civakê de zelal jî bibînin, mîna van rojan ku helbest di civakê de sirgûnbûyî dibe, hetanî di vê wextê de jî, çame nikare ji dîrokê bifilite, herdem, hetanî ku di vê tenhatiya xwe de be jî, dimîne wek şahidekî dîrokî. Di civakek perçebûyî de pêwîst e helbestek wekû helbesta me hebe.

Bi sala dewletê û kîniştê dikarîbûn dengê helbestê ji bo mebestên xwe yê taybetî, bîndest bikin. Ev kar û xebat ne bi rêça hêz û zorê pêk dihat, çimko helbestvan bi xwe ligel wan mebestan bûn, lewra, ta ku helbestên xwe di rêça wan mebestan de bi kar bînin, tu carî du dil nebûbûn. Husa, bi vî awayî ezmûneyên serdema xwe bi kar dianîn. "Yohena Dolakirwayê" keşe dixwest xizmeta baweriyên xwe bike, her bi rastî, bi helbestên xwe xizmeta wan baweriyên xwe kir. Lê pîrsa ku li vî belû dibe ev e: ku çawan karîbû vî ciwaniya bêtixûb terxaneyî wan mebestên lahûtî bike? Herweha PAŞO jî eger di sedsala 17'an de li Japonya nejiyaba dê nikarîbûya tiştên ku nivîsîbû binivîsanda. Lê û ji bo ku em li hemberî xwendina sê malikan ji helbesta Hayko matmayî bibin ne pêwîst e ku em baweriyên xwe bi Bûziyeta /Zin/ bînin.

Dîroka ku xwe ji me re wekû yekîtiyek giştî dide diyarkirin, ku dişê hemû karan dorpêç bike, hevcotiyê nade çameyê. Lêbelê çame xwe bi xwe vî tiştî werdigire gava ku ew çame xwedan xurusteke hevcotî be. Dêmek ev pevçûna di çamê de ne ku ji dîrokê ye lê di kûrahiya çamê bi xwe de ye, di nava çarçeva xêza duta de ya ku pirose helbesta li ser diçe, bi gewde dibe: dema dîrokî dibe demek nimûnedarî. Ev nimûnedar di demek dîrokî yî bi sînî de bi gewde dibe. Ev bizava hevcotane (muzdewec) bi xwe hebûna helbestê dadimezirfîne: rêça taybetî û dijane. Lê rêça birêveçûna dîrokê ya helbestî, diyalektîkî ye ew berbiçaviya (Takîda) ku helbest bi xwe wê sirgûn dike: dem û herikîn e.

Helbest nayê hestkirin lê têt gotin. Çêtirîn rê bo hestkirina helbestê axaftina wê ye û her axaftinek bi xwe tiştî ye, lewra axaftina li ser vî tiştî an ewî tiştî ye, lewra axaftina helbestî jî yekcar axaftinên dîtir ne cuda ye.

Ew tiştên ku helbestvan li ser wan dipeyive, ew tiştana tiştên wî ne, herweha gava ku li ser cîhana xwe dipeyive di eynî wextê de li ser cîhana ên dîtir dipeyive, wêneyên şevê beşekin ji wêneyên rojê, lê belê afirandina van wêneyan ji nêrîna qanûneke dîtir tê dûbare kirin. Û helbestvan hetanî ku bixwaze guh nade dîrokê û wê sirgun jî bike, nikare ji dîrokê derbiçe (bifilite). Ev ezmûneyên pir nehênî (tecrubeyên sirî), pir germ û dilsoz û pirtaybetî, werdirçerxin û dibin peyvne civakî, dîrokî û helbestvan di eynî wextê de û bi riya wan peyvvan tişteki dîtir dibêje. Ew mirov radigihîne, ev ragihandin bi xwe girîntirîn angoya çameyê ye û pir caran şeweyê şirovekirinê bi xwe ve nagire, lêbelê ji bo goya (qewl) helbestî weke bingeh dimîne, ji wêne û newayên (rîtm) çamê ye, car caran bi awayekî serberdayî, serberdayîbûnek ku xwe naspêre axaftina peyvvan, eşkere dibe, lêbelê xwe dispêre tişteki pêşane, ku peyvên çameyê vî tiştî ji xwe re dike palpişt, ev jî rewşa mirovê, rewşa wî ya li dûtirîn sînorê giranbuhayî ye. Ev kirina ku herdem mirovan bi pêş de didêhîne, mirov ber bi alî nebûnê de jî dehf dide, ta ku hebûnê û nasnavêki bide mirov. Ta ku herdem bikaribe herêmên teze dagir bike, lê hema hema ku mirov destê xwe xiste navê an lingên wî hingivîninê, ew dibin xwelî. (Mebest ew herêmên teze ne).

Ew pirosesa pêşxistina mirina di xwenûkirinê de ye û vejîna di xwenûkirinê de ye. Lêbelê ev serberdayiya ku helbestvan wê radigihînin bi şeweyeke hevdemî di çamê de berceste. Bi taybetî ew peyvên hestdar (hisî) ên ku piştigiriya vê çamê an evê çamê, dikin, bi mercê ku beşdarbûna helbestî ne mehal be, ji bo ku peyv bikaribin li ser ewî tiştê dîtir ê ku çame li ser dipeyive, bipeyivin. Pêwîst e ku li ser ewî tiştî an ewî tiştî jî ji me re bipeyive. Dijîtiya veşartî ya ku di her çameyê de ye, merceke ji mercên xurustiya wê, ne ku perçebûn û terikandin mîna ku hin kes bi şaşîti tê digihîjin.

Çame yekîtî ye, ev yekîtî nikare heyina xwe bi dest xîne ku ne bi rêça hilîna yekdijan be. Pevçûn di çamê de ne di navbera du cîhanên biyanî de ye. Lê pevçûna çamê xwe bi xwe ye. Ji vê çavkaniyê çame bûnek nemir e û ji vê pevçûnê bêdawî sîmayên vê yekîtiya giranbuha pêk tên. Sîmayên şahîtokî, girêdayî û tîran e ta ku mirov bikaribe bibêje ku xêza helbestê bi gewde dibe.

Digel ku ê helbestvan xwe pêşkêş dike ta ku xizmetê ji serjêkiringeha civakî re bike. Digel ku beşdarî bîr û baweriyên serdema xwe dibe, lê bi tena xwe dimîne, bûnawereke, bi hêza qedera xwe tiştê dîtir dibêje, her bi wan tiştên ku xelk pê dipeyivin ew tişteki dîtir dibêje.

”Lê neewlebûna” eşkere ya ku dewlet û kunişt di danûstandinên xwe de li hemberî helbestê bi kar tînin, ne ji niyaza (niz’eta) împeryalîzma resen e (esîl) ya di van herdu desthilatdaran de ji dayik bûye, lêbelê ew encama axaftina helbestî xwe bi xwe ye,



xurusta axaftina helbestî bi xwe "Lê ne ewlebûnê" diafirîne, tirs û sawa ji wan tiştên ku helbestan nabêje, lê di nava me de ji dayik dibin, em jî bi awayê xwe wan bi ser axaftina helbestvan ve dixînin. Ev tişt, encama durûtiya tund û dijwar e, ya ku tu carî têk naçe û ya ku tama ezmûneyê (tecrube) pêşkêşî peyvan dike.

Helbestvan mirovine bê agahî ne, sergêj in, li vê cîhanê ne amade ne, bi van peyvan helbestan têne sûcdarkirin, renga (belkî) ku ev peyvana vedigerin xurusta axaftina helbestî bi xwe, wîşeya helbestî tu carî nebûye ji vê cîhanê, çimko herdem me diguhêzin cîhana metafizîkî, me diguhêzin şûnên nû, asmanên nû û rastiyên nû, ta ku helbest-mîna ku diyar e- lê derî qanûna bizava dîrokî raweste, çimko wîşeya helbestî bi awakî giştî nabe dîrokî. Wêne (di helbestê de) ne tenê ev tişt û ew tişt e, lê renga ku ev tişt û ew tişt bi hev re be, ji wilo bêtir, renga bibêje, ku ev tişt ew tişt e, an ev bi xwe ew e.

Ev merca cotalî (mûzdewec) ya wîşeya helbestî, hergîz (tu carî) ji merca xurustî ya mirovatîyê cuda nabe. Mirov, bûnewarekî demî î rêjeyî ye (kaînekî zemanî î nisbî ye). Herdem di rêçûna xwe de, berê xwe dide mutleq û ev pevçûn bi xwe ye ku dîrokê diafirîne, lewra û li gorî vê çavkaniyê, tu carî nabe, ku mirov tenê herikîn be, an bidûhevdehatin be.

Eger sîsîka dîrokê di herikîna kêlikan de bi çarçew dibe, kêlik bi dû kêlikê de û di herikîna mirovantiyê de, mirovek bi dû mirovekî de û herikîna şarîstaniyetan, şarîstaniyek bi dû adin de, li vira, gerek /guherîn/ bi yek

şêweyê, bi rê ve biçê, ta ku dîrok bibe xurust û çiqasî jihevcihêbûnên babetî di navbera tiştan de hebin jî, dara kajê herweha wek dareke kajê ya dîtir e, herweha ku çîkek wek ê din e, lê li ber dîrokê bervajî vê rû dide.

Herçiqas akarên (sifat) di nav tiştan de hevbeş bin jî, mehale ku em bikaribin wekhevîyê di nava wan xînin, yanî mirovek wek mirovekî nîn e, ê ku kêlikê dike kêlik û demê dike dem, mirov bi xwe ye. Mirovê ku di wan dihile ta ku wan derbas ke girovera tenhatî û rehayê (mutleq) ye.

Dîrok bizav e, dîrok karekî qehremanî ye. Dîrok hemû kêlikên lertzokî ye, kêlikên ku bi rêberiyên xwe teqînokî ne. Mirov (însan) her kêlikê dike tiştêkî bi serê xwe. Bi vî awayî îro ji do cuda dike, mirov di her kêlikê de hewl dide ku "ez" a xwe pêkbîne, hewl dide ku her katjimêrekê bike çarçewek bo herdemiyek demane (ebediyetek mûequet), ji bo ku mirov bikaribe ji vê rewşa zemanî azad bibe, rêçek bi تنها li pêş wî heye, ew jî ku di demê (zeman) de bixeniqîne. Ango rêça mirov ta ku pişt demê bişikîne, ew e ku di demê de tarûmar bibe. Û gava ku hest dike, ku neşê bigihêje edebiyatê, kêlika xwe ya yekane diafirîne, ew kêlika ku tu carî dubare nabe, bi vî awayî mirov rê dide dîrokê ku ji dayik bibe. Ev dox (wezi') wa li mirov dike ku bibe tiştêkî din, dema ku dibe ev tiştê din, ew bi xwe bi ser piyan dikeve, an dibe "Ez" a xwe, her li ser vê "Ez" a xwe ranaweste an bêyî ku /serbixwe/ ya xwe rawestîne, dibe wêneya xwe jî.

Afirandina helbestî bi xwe ezmûneya (tecrûbe) serbestiya

mirovatiyê ye. Ezmûneya helbestî bi xwe diyaxistina (keşfa) rewşa mirovatiyê ye û giranbuhayiyê mutleqe ku azadiya mirov ya rastîn tê de ye.

Dêmek serbestiya mirovatiyê bizava bûnewer(kañe) e, serbilindahiya herdemî ya mirov e. Pêwîst e ku hergav xwe bispêre tiştêkî (mebest serbestiya mirovatiyê ye), ev serbestî li bihayekê an li ezmûyekê bi sînor digire, helbest jî vê yasayê (qanûnê) derbas nake, çimko cudawaziya (mîzeta) kirina helbestî axaftin e, axaftina hertiştî, bêguman e, axaftina tiştêkî bi xwe ye jî. Dêmek ev tiştaya wê çi be? Ev tiştaya wê dîrok be, dîroka ku têt dîrok-kirin.

Ën ku helbestvan wan dibêje, îcar evînbaziyên wî ligel GALLA be an dorpêçkirina /Tîrwadot/ yê be an mirina HAMLET be an tama meyêk êvarî be, an temek (perçeyek ewr) li ser deryayê be, helbestvan taybetmendiyên (xisûsiyeta) dide ezmûneya dîrokî, taybetmendiya kesane be an ya komelane be an herdu bi hev re bin. Lê dema ku helbestvan li ser van bûyeran, van pêjnan û van ezmûneyên kesane dipeyive, di eynî wextê de, ji me re li ser tiştêkî dîtir jî dipeyive, li ser ka ew bi xwe di wê demê bi xwe de çi dike û tiştêkî dîtir jî, ka di wê demê bi xwe de çi di me de û çi li hemberî me ji dayik dibin. Helbestvan ji me re li ser çameyê dipeyive, li ser kirina afirandinê û li ser kirina pîrozweriyê ji me re dipeyive. Ji wilo bêtir jî, me dehf dide ta ku em çameya wî ji nû ve biafirînin, ku em pîrozweriya wî pîrozwertir bikin. Bi vî awayî ê helbestvan "Çiyetî" ya me

(mahiyeta me-cewherê me) ji me re ron dike. Ez naxwazim li vir bêjim ku gerek helbestvan helbestê bi helbestê biafirîne, an, ta ku axaftina xwe ya taybetî pêşkêş bike, rabe û di dema peyivîna helbestî de bi awakî kitûpirî (ji nişkê ve-mûvace) derbas bibe.

Belam divê me bêjim, ê me, dema ku em karê helbestvan dixwînin, em serserîtiyên wî li gel wî dijîn. Em wê serbestiya ku rewşa me ya mirovî di çarçewa wê de pîroz dibe, em wê bikar tînin, yanî em di kêlîkê de tînin bişaftin ta ku em bi awayekî ciwantir bikaribin wê derbas bikin, û gava ku em hest bikin ku em bûne "xwe" ya xwe angû "ez" ya xwe, em hest dikin ku em bûne ên dîtir angû em bûne "ewana".

Ew ezmûneya (tecrûbe) ku me li jor ron kir, ew e ku xwendevan wê dubare dike; bêguman ew dúbarekirin wê "nemîne" û ne jî li beramberî helbestvan be. Nirxdariya xwe jî, dêmek, ji vê taybetiyê werdigre. Xurustiya ku xwendevan angûya çameyê bi hûgilî tê negihêje. Ev çameya ku berî çend salan an berî çend nîşan hatiye nivîsandin, zimanê wê hatiye guhertin, renga (belkî) ku li herêmeke cografî î dîr û bi zimanekî cihê hatiye nivîsandin. Lêbelê girîngiya van tiştan tevan nîne, çimko eger bersivdana helbestî pêkhat û çameya hêza ronîkirinê di xwe de parast û eger xwendevan bişê xwe dade naveroka wê ya efsanewî, wê gavê dúbarekirina afirandinê-bivê nevé- dê çê bibe. Wek hemû-dúbare afirandinan dê çameya xwendevan ne çapek ji çameya orjînal ya helbestvan be, ew jî (mebest çameya xwendevan e) dema ku wê wekhevîyê di çarçewa

kirina afirandinê bi xwe de, hilnagire, li vir xwendevan kêlikê ji nû ve diafirîne û dúbare dike û afirandina "xwe" ya xwe, "Ez" a xwe jî dúbare dike.

Came her gav ne karekî kamil e, bi her xwendevanekî nû re dikare kamil bibe. Berzî û rûmeta helbestvanên mezin, nûjenbûna wan ya herdemî ji vê tê: Dişên bibin "ên" dîtir bêyî ku naskirina "xwe" ya xwe rawestînin, ango dibin "ewana" bêyî ku "ez" a xwe ji bîr bikin, lewra tiştê ku helbestvan li ser diaxive (-bo vî, bo wî, gul, mirin, nîverojek hetavî, destbiserdegirtina kelehekê, jena alên hevgyrtî-), ev tiştana hemû tiştên ku di axaftina helbestî de veşartî bin pêşkêşî xwendevan dike û sîsika axaftina helbestî pêşkêşî wî dike. Yanî rohnîkirina rewşa me û lihevanîna vê rewşê bi "xwe" ya wêre. Ev rohnîkirin ne tişteki hişyarî ye (marifî) û ne jî bi tu tiştî ve girêdayî ye, ji ber ku eger gihîşt vê qonaxê dibe felsefe. Lê belê vegera li rastiya heyina me ye, rastiya ku helbestvan wê rohnî û eşkere dike û tu carî jî şeweyê rewayî an bingehî (hukum û qaîde) wernagire. Helbest kirin e, ku ne xwe bi xwe be nayê şirovekirin. Tu carî şeweyê rûtawî (absratct) wernagire. Ne şirovekirina doxekê ye (mebest helbest e) lê ezmûneyeke rewşa me eşkere dike û alîkariya wê rewşê dike ta ku bi gewde bibe. Lewra helbest bi awakî pirr dilsoj girêdayî ye bi axaftina berhest ya girêdayî bi "vê" û bi "wê".

Ezmûneya helbestî çî resen be (esîl) û çî encama xwendin be, ne me hîn dike û ne jî tişteki li ser azadiyê ji me re dibêje. Ji ber ku ew bi xwe azadî

ye. Azadiya ku dibişkive û azadiya wê kêlikê (a bişkivîne) dide mirov. Ev rengerengbûna bê sînor ya çameyên ku di dîrokê de nemir in, li ser ezmûneya helbestane ya taybetî pêk tên. Ev ezmûne li layekî din ve ezmûneya "Ev" e û ya "Ew" e û ev rengerengî bi xwe bingeha yekaneyî ye jî, ji ber di her "Ev" î de û di her "Ew" de doxa mirovî made ye.

Doxa me (rewşa me) li ser nakokiya di navbera tişt û tişt a ku tê de bi gewde dibe, pêk tê û li ser hebûna tiştan a ku tu carî pêk nayê, eger tişt li derî "Ez" a xwe bi gewde nebin, yanî ku "ez" di "ew" de bi gewde nebe.

**EDÎP POLAT:**  
**"DIVÊ BI HEZARAN**  
**NIVÎSKAR Û BI SED**  
**HEZARAN JÎ**  
**XWENDEVANÊ**  
**KURD BIGIHÊN"**



**NÛDEM:** *Pirraniya nivîskarên NÛDEM'ê xwe di hejmara çaran de dabûne naskirin. Bi niyeta ku xwendevan û nivîskarên me te ji nêzîk ve nas bikin, tu ê jî kanibî ji kerema xwe re bi kurtayî behsa çîroka jiyana xwe bikî?*

**Edîb POLAT:** Ez di sala 1962'an de li gundekî Bismilê hatime dinyayê. Navê kalikê min Reşo bû. Malbata me bi navê wî tê nasîn. Ji aliyê diya xwe ve ez Xerzî me. Alî bavê em ji Eskîfê hatine. Bavê min giyandaran (heywanan) xwedî dike. Carna jî cenantiya xelkê dike, tûtînê datîne. Hêja jî sax e û hêj jî xizan e.

Zaroktiya min bi xizani derbas bû. (Niha jî ez carna bê pere dimînin!) Dibistana pêşî min li gundê Çoltepeyê xelas kir. Ji bo ku ez biçim dibistana navîn, divêt ez li bajarekî din bi cih bibûma. Mala xweyê feqîriyê bişewite, bavê min nikanîbû ji min re xanî kirê bikira. Li Batmanê mala kirîvekî me hebû. Kirîvê bavê min bû. Ez li mala wan bi cih kirim. Çi heyf ku ew jî cenan bû û aboriya wan ji a me xerabtir bû. Gelek çaran em bê nan diman. Bavê min ji bona diviyahiyên min î heftayî 5 banqnot dixiste bêrika min. Ji vî 5 banqnotî jî 3 wereqe ji bona bilêta trêne bû. 3 salan nizanîm bi çî awayî axir min qedand. Di sala 1976'an de ji wê dibistanê me 2 xwendevanan îmtihana dibistana mamostetiyê qezenc kir.

Li bajarê Amedê lîsa mamostetiyê di destê faşîstan de bû. Her roj şer û pevçûn bû. Me salekê di bin bandora wan de xwend. Hevalekî me yê şoreşger ji aliyê wan ve bi kêrê

hate birîndarkirin. Navê wî Xetîp Kibçak bû. Ew heval paşê kete hefsa Amedê û bi salan raket, li ber xwe da. Ew sê meh berê ji aliyê Kontrgerilla ve li Mazîdaxê hate kuştin. Di sala 1977'an de dibistan kete destê şoreşgeran

Di sala 1979'an de min lîse xelas kir, lê belê heqê me yê mamostetiyê hilanîn. Ez ketim îmtîhana unîversîteyê, lê wê salê îmtîhana Amedê dane rawestandî. Sala 1980 ez cardin ketim îmtîhanê, vêca min unîversîta Dicle, Fakulta Fenê beşa Biyolojî qezenc kir.

Jiyana min ya fakultê pêşî baş meşiya. Dû re, di sala 1982'an de leşkerên Cûnta Îlonê ez girtim. Piştî du meh îşkence, ez avêtim girtîgeha taybetî ya Amedê. Ji wir re digotin "5 no'lu". Hevsa bi nav û deng, bexçê şehîdan.

Ez naxwazim cardin behsa wê derê bikim, gelek hate gotin.

Dadgerên leşkerî di sala 1985'an de di meha çileyê pêşîn de ez berdama. Azadî tiştêkî xweş bû. Lê ne di welatêkî mêtîngê de. Çûk difiriyan, gul û çiçek û sosin vedibûn. Beybûn kirasê spî li xwe dikirin, lê ev ne bes bû. Asîmanê şîn têra her tiştî nedikir. Ewr cardin hebûn, ewrê min yê pêşî "eskerî" bû. Cardin min girtin, xwestin ku min bişînin leşkeriyê. Min li ber xwe da.

Di sala 1986'an de cardin ez girtim dibistana bilind. Min xwendina biyolojî domand. Ji qedandina min re du sal mabû. Axir vir de wir de, bi keftelefa dirêj, di sala 1987'an de ez ji fakultê mezûn bûm. Lê çi bikim? Bê kar û bê emel?

Wê salê payîzê vatiniya mamostetiyê biyolojî dane min. Dewletê min şand bajarê Gümüşhanê. Nava komîza faşîstan. Ez çî bikim, ji bêçarî ez rabûm çûm. Du meh di lîsa Meraşal Çakmak de min mamostetiyê biyolojî kir. Paşê min ji vêtîniyê avêtin. Xwedê giravî ez "sakîncalî" bûm. Min cardin paşika stûyê xwe xurand. Ez zîvirîm Amedê û min du salan li Dersxana mamostetiyê taybetî kar kir.

Di sala 1988'an de min ger pirtûka Diyarbakir Gerçegi neweşandaya, niha ez ne nivîskar bûm. Ew roj ev roj e ez dinivîsînim. Carna hinek ji min dipirsîn, dibêjin gelo tu çend salî yî? Bersiva min ev e: "Ez di sala 1988'an de hatime dinê".

Yan her sal, yan jî ji du salan carekê ez dikevim girtîgehê, polîs her li dû min in.

**NÜDEM:** *Tiştê ku em dizanin, heta niha pênc pirtûkên te bi tirkî, bi navê; Diyarbakir Gerçegi, Newrozladik Şafaklari, Afganistan'da Halk Demokrasisi Mücadelesi, Devletsiz Ülkeden İzdüşümler û Bilim Dilinde Kürtler ve Kürdistan derketine. Di derheqa hinekan ji van de cezayê girtîgehê û yê peran ji te têne xwestin. Li hin deveran ev pirtûkên te hatin hevdan. Gelo kîjan ji van pirtûkan in? Çend sala ceze û çiqas pere ji te têne xwestin? Mehkeme çî sedeman nîşan dide?*

**Edîb POLAT:** Pirtûka min a yekemîn **DIYARBAKIR GERÇEĞİ** (Rastiya Diyarbekrê) di sala 1988'an hate çap kirin. Sê mehan bi azadî hate firotin, lê

belê piştî sê mehan hate qedexekirin. Min di vê pirtûkê de qala (behsa) serpêhatiyên xwe yê girtîgeha Amedê kiriye. Behsa çend îşkencevanan (Yekî mîna E. Oktay Yildirim) di wê pirtûkê de tê kirin. Di wê demê de Q. K. T (T. C. K) de 141 û 142 hebûn. Ez ji 142'an derketim dadgehê. "Sûcê" min ev bûn: "Bölücülük propagandasi yapmak, devletin güvenlik kuvvetlerini teröre hedef göstermek". Ez ji ber vê pirtûkê hatim girtin. Sê mehan di girtîgeha Ankarayê de mam. Piştî salekê bi şûn de ez beraat bûm.

Piştê min kîjan pirtûk nivîsî hate qedexe kirin. Berhemên min bi pirranî di derheqa pirsgirêka kurd û Kurdistanê de ne. Ji wê yekê dozger û dadgerê Ankara xişma min kişandin. Di sala 1991'ê de bi navê "Newrozladik Şafakları" (Me berbang bi Newroz kirin) pirtûkeke min hate weşandin. Ev pirtûk jî di derheqa zarokek keça kurd ku li girtîgehê ji diya xwe welidîye de ye. Ev pirtûk pêşî li Stembolê hate weşandin û 8 mehan bi serbestî hate firotin. Paşê çapa duwemîn li Ankara hate kirin. Vêca di meha sibatê de, di sala 1992'an de hate hevdan. Piştî qedexebûnê li min dawê vekirin. Li gora qanûna anti-terorê (qanûna 3713) beşa 8'an em hatin darazdandin. Di 23'ê çileyê pêşîn de darazdan xelas bû. Min du sal cezayê girtîgehê û pêncî milyon cezayê peran xwar. Xwediyê weşanxana min Hîkmet Koçak jî milyarekê 728 milyon cezayê peran xwar. Li gora wan sûcê me: "Bölücülük propagandasi yapmak" bû (Kirina propaganda cihêkirina

Dewletê bû). Me ev ceze şande dadgeha bilind (yargıtay). Ev ceze di Komara Tirkîyê de ji bo pirtûkekê REKOR e.

Di meha çûyin de daweyek din li min hate vekirin. Ev dawê jî di derheqa pirtûka min a ku bi navê "Bilim Dilinde Kürtler Ve Kürdistan" tê nasîn de vebû. Pirtûk hêja nehatiye hevdan. Xwedê giravî min di vê pirtûkê de "Propaganda cihêkirina Dewletê" kiriye. Li gora qanûna 3713 (Bi navê anti-teror tê nasîn) beşa 8'an dawê li min û li Dr. İsmail Beşikçi (Mamosta Beşikçi jî vê pirtûkê re pêşgotin nivîsandîye) û li xwediyê weşanxanê Vedat Yenîçerî hate vekirin. Di 23'ê sibatê de em ê derkevin dadgehê. Ji bo vê pirtûkê jî di nava 2 û 5 salan cezayê girtîgehê û 50 milyon jî cezayê pere dixwazin. Ji Dr. Beşikçi re jî ewqas ceze dixwazin û ji xwediyê weşanxanê Wedat re nêzîkî 5 milyara cezayê pere dixwazin.

Mijara vê pirtûkê zanyariya biyolojî ye. Nebat û giyandarên (heywanên) Kurdistanê ku bi navê "Kurdî" di zimanê latînî de cih girtine di pirtûkê de tînin behs kirin. Mînak: *Vulpes vulpes kurdistanicus*- roviyê Kurdistanê ye).

**NÜDEM:** *Mijarên pirtûkên te bi tevayî çî ne? Tu dikarî bi kurtayî ji naverokên pirtûkên xwe mînakên bidî?*

**Edîb POLAT:** *Mijarên pirtûkên min bi pirranî pirsgirêka kurdî û çanda kurdî ye. Pirtûka min a yekemîn di derheqa îşkence Amedê ku li dinyayê meşhûr in, de ye. Kuştinên ku tu kesî behs nekiribû pêşî me di vê pirtûkê de*

nivîsî. (Li gora şerdên sala 1987'an bifikiran). Ji bona çî nêzîkî 60 mirovên welatparêz hatin kuştin? Gelo di devereke dinyayê de ev bûyer çêbûne? Ji ber ku me RASTIYA DIYARBEKIR da nişandan em ji wan re bûn armanc. Pirtûka min a "Newrozladik Şafaklari" du birr e. Birra pêşîn ji bûyera Şêx Seîd dest pê dike heta Newroza sala 1991'ê, di rojên Newrozan de çî tiştên girîng bûbin hatiye zimên. Ev axaftin bi keçek biçûk re tê kirin. Navê keçikê Hêlîn e. Ev keçik li girtîgehê di nava îşkencê de ji diya xwe re çê dibe. Ji sedemê wê yekê çî bela tê serê diya wê, wisa tê serê wê jî. Keçik mezin dibe, dertê derve û dibe şahidê xweşewitandina ZEKIYA ALKAN. Zekiye li serê bircên Amedê di Newroza 1990'î de canê xwe ji Newrozê re kir alav. Xweşewitandina di sala 1988'an de jî li Amedê çêbûbû, vêca Salîha Şener û Rahîme Şahîn li kolanê agir bi xwe ve danîbûn.

Birra duemîn qala serhildan û berxwedanên girtîgeha Amedê dike. Şeş berxwedan tîn zimên. Birra pêşîn bi zimanê romanekê hatiye nivîsîn.

Mijarê pirtûka "Bilim Dilinde Kürtler ve Kürdistan" bersiva zanyariya biyolojî bo îdeolojiya fermî ye. Di vê berhemê de ez li ser 83 nebat û 9 giyandaran disekinim, ku evan di latîni de li gerdûnê bi navê "Kurdistanica, kurdicus, kurdicum, kurdistanicum, kurda, carduchorum û hwd." tîn nasîn. Ev niha li unîversîteyan tîn bikaranîn. Lê li unîversîteyên Tirkîyê tîne veşartin. Ez bîyolog im. Min ev pirtûka li gora prensîbên zanyariyê nivîsî ye. Mêjiyên genî û yê "konikê pîrê" lê

danîne, tehamula biyolojî nakin.

Pirtûkek min bi navê "Devletsiz Ülkeden İzdüşümler" tê zanîn. Ev pirtûka di derheqa pirsgirêka netewî û sosyalîzmê de çend nivîsar civandiye serhev. Nivîsarên min yê ku di kovaran de derketine tê de cîh girtine.

Pirtûkek di sala 1988'an de min da weşandin. Ev pirtûk di derheqa Afganîstanê de ye. Li gora hal û mercên wê demê hatiye nivîsîn. Weke ku tê zanîn li Afganîstanê gelek şer li dar ma. Rêxistinên olperest li wir gelek xurt in. Rêveberiya Afganîstanê ya kevin û van rêxistinên tîn şirovekirin. Di derheqa vî welatî de bi tirkî pirtûk zaf hindik in. Şerdên Afganîstanê niha hatine guhertin. Sedemê vê yekê dîtî û ramanên min jî ne yên berê ne. Ez niha ne di wê fikra xwe ya kevin de me.

**NÛDEM:** *Gorî çîroka te ya bi navê "Şorbe" ku di hejmarê NÛDEM'ê ya çaran de derketibû, kurdiya te ya nivîsandinê baş e. Gelo tu nafikirî ku tu berê nivîskariya xwe ber bi kurdî ve bizîvirîni, berhemên xwe bi kurdî biafirîni?*

**Edîb POLAT:** Belê ez dixwazim. Ev nêzîkî salekê ye ku ez li ser kurdiya xwe dixebitim. Gelek nivîsarên min bi kurdî di kovarên mehane de derketine. Mînak: rexneyek li ser filmê Mem û Zîn hate weşandin. Çend helbestên min yên ku anonîm in di kovaran de weşiyên. Du meh berê min pirtûkek bi navê "Gundê Şano" nivîsî. Di vê pirtûkê de 12 çîrokên pêkenî hene. Ev çîrok ji nava gelê me hatine civandin. "Şorbe" ya ku di NÛDEM'ê

de derket yek ji çîrokên wê pirtûkê ye. Ev pirtûk wê di meha adarê de di nava weşanên Koral de derkeve. GUNDÊ ŞANO di şaxa xwe de berhemek ji alî pêkenînî ve bi serê xwe ye.

Ez dixwazim pirtûkên xwe yên bi tirkî jî bikime bi kurdî. Lê mixabin wextê min tune ye. Divê wergervanên kurd vî karî bi cih binin. Ez destûr didime wan. Ez dikanim bi kurdî bêjim ku nivîsandina min ya bi kurdî wê bidome.

**NÛDEM:** *Rewşa çapemaniya kurdî li Tirkiyê çawa ye? Çi ji pêşeroja ziman û edebiyata kurdî li Tirkiyê dikeve serê te?*

**Edîb POLAT:** Pêşî bi navê ROJNAME kovarek hefteyî derket. Tenê hejmara taybetî weşiya û sekinî. Niha hûn jî dizanin ku WELAT dertê û ew jî rojnameyek hefteyî ye. Ez wê dicibînim. Kêmasiyên wê jî hene, çawa be yek li ser (Berdewamî) dertê, ev yek zaf baş e. Ji alî din ve AZADÎ heye ku ew bi kurdî û tirkî dertê. Gramera wê li gora min çewt e. Li Tirkiyê rojname an jî kovarên li derveyî politikayê tune ne. Serketin, Newroz, Newroz Ateşî, Medya Güneşi, Rewşen, Nûbihar, Deng û Welat... û hwd. Ev hemî her yek ya rêçekê ye. Îro du alfabe têne bikaranîn. Alfaba Celadet Bedirxan û alfaba ku rêça Deng û Azadî bikartînin. Feqî Huseyn Sagniç jî mîna beşa diduya dilive. Alfaba Celadet Bedirxan ji bo zimanê kurdî bingeh e. Ev divêt neyê guhertin.

Ji alî din ve çend weşanxane hene. (Mînak: Melsa, Pelê Sor, Deng, Koral, Komal, Doz, Med û hwd.) Ev weşanxane pirtûkên bi kurdî derdixin, lê mixabin ew hindik tên firotin. Pirtûka bi nav û deng pirr pirr hezar hebî difiroşe. Ev jî ne tiştê e. Xwendevanê nivîsandina kurdî hindik in. Rewşenbîrên me sersariyê dikin, zexel in, xwe hîn nakin. Li qehwan, li ser masan pirr diaxivin, lê gava tê livandinê tune ne. Ez hêvîdar im ku wê hêdî hêdî nivîsandin û xwendina bi kurdî li gel belav bibe. Bîponijîn, heta du sal berê ev jî tune bû. Em ji ku hatine ku?

Heta ku bi sedhezaran xwendevanên kurdî û bi hezaran jî nivîskarên kurdî negihîjin em nabin netewe. Em ji talûka windabûnê xelas nabin. Ji alî din ve ev pirsgirêkên me yên li jor, gava têkoşîna neteweyî baş û rast here wê çareser bibin. Pirsgirêka çandî, wêjeyî û zimanî bi politikayê ve girêdayî ye. Divê têkoşîna niha têk neçe, bi serfirazî here serî.

Rewşa çapemaniya kurdî wê baş bibe. Lê çalakiyên ji dil divêt. Ji bona ziman û pirsgirêka gramera kurdî di pêşerojê de konferansek divêt. Civatek zanyarî ji pisporan divêt ku bicive û biryarên girîng yên ku zexm û qet nayên guhertin bistîne. Ew biryarên li ser ziman û gramerê divêt ku li hemî aliyê Kurdistanê bê birêvekirin. Li gora dîtina min alfabeyek latînî ( niha ya C. Bedirxan baş e) standard me divêt.



# ÇEND GOTIN LI SER FILMEKÎ BAŞ

---

Şahîne Bekirê SOREKLÎ



Pirtûkin hene ku mirov bi xwendina wan jî aciz dibe, hinin din hene ku mirov wan bi kêfxweşî dixwîne, lê piştî kurtedemekê ji bîr dike. Li milê din, di jiyana xwe de mirov rastî çend pirtûkan tê ku bi şewekê yan ya din ta roja mirinê bandoreke biçûk yan mezin li xwendevên dikin, yan bi kêmasî xwendevan bûyerine di wan pirtûkan de cîh girtine nikare ji xwe bîr bike.

Gotina li jor hatî diyar kirin dikare herweha di derheqê filman de jî were kirin. Di cîhana me ya îroyîn de salê bi sedan, heye ku bi hezaran, filmên curbecur têne çêkirin, Li hejmareke ji van filman, bi taybetî hinên li Dewletên Yekbûyî yên Emerîka têne çêkirin, bi sedan milyon dolar têne xerckirin. Tevî ku hinek filmên wisa bi milyonan kes dikişînin sînemayan jî çend hefte najon ku mirov bûyerên tê de cîh girtine ji bîr dike, yan di kûraniya bîranîna xwe de dike çalê û çî sûdê ji wan nagire.

Di nav filman de filmên dramayê, pêkenînê, propagandayê, muzîkê, katderbaskirinê, filmên pêşeroja xeyalî (Science Fiction), yên îcramê û gelek babetên din hene. Di nav van babetan de filmine hene ku bi dîtina wan mirov tişteki nû fêr dibe, îbretêkê ji bûyerên wan digire, yan tew bêtir ber bi mirovatiyê

diçe. Di vê cîhana me ya îroyîn de, ku bi xwîn, hejnekirin, nijadperestî û ezotiyê mişt e, filmên wisa wek çîrûskên di xaniyekî tarî de ne. Yek ji van filman filma Bajarê Şahiyê, CITY OF JOY, e.

Çîroka filmê Bajarê Şahiyê ji romanê Dominique Lapérre hatiye girtin; dîrektorê film Ronald Joffé ye. Du bokeyên serek yê film doktorekî emerîkî, Maks (Patrick Swayze) û gundiyeke hindî, Hesarî (Om Puri) ne.

Film bi du bûyeran dest pê dike: 1) Doktorekî di karê xwe de serkeftî li dû mirina nexweşekî zarok di bin emeliyateke di nexweşxaneyê emerîkî de xwe ji wezîfeya xwe paşve dikişîne, 2) Gundiyeke hindistanî ku gundê xwe li dû dihêle û tev jin, keç û du kurên xwe berê xwe dide Kalkata. Nivîskar herdu bokeyên xwe li vî bajarê Hindistanê digihîne hev û bi riya bûyerên di çîrokê de cih digirin bi şêweyê jîr ramanên cuda yê felsefeya jiyânê û şêweyên jiyîna mirovan dide hember hev. Li berevajiya gelek filman, ev film baş dide xuyan ku jiyîna rehet û hebûna pereyan nikarin bextiyariyê misoger bikin. Tiştên herî girîng ji bo şahî û bextiyariyê hebûna armançê ji bo jiyînê û alîkariya yê din e.

Maks û jina xwe hevûdin berdane. Karê wî, şêweya jiyîna wî ya bi "sters" di bajarekî mezin de, li Dewletên Yekbûyî yê Emerîka, wî dilsar dikan. Ew dixwaze ji bo demêke diçe şûneke dûr. Hesarî, li milê din, ji neçariyê gundê xwe û bavê xwe yê kal li dû xwe dihêle. Wek bi milyonan gundiyeke welatên belengaz hêviya wî jî ew e, ku li bajarê mezin kar bibîne, pereyan bide hev û li gund vegere. Armanca wî ya yekem ew e, ku qelenê zewaca keça xwe bide ser hev, da bikaribe wê bizewicîne (li Hindistanê xwediyê keça qelenê didin xwediyên lawan). Ji bo xatirê vê amancê ew amade ye her karî bike, ji her diwartiyê tehmûl bike. Maks, li milê din, Emerîkî ye. Ne hewceye wî wek Hesarî weqa bi kesên din heye, ne jî hestên wî û hejkirina wî ji bo xelk û warê wî wek yê Hesarî germ in. Hesarî li gel xwe qutiyeke ji xweliya gundê xwe dibe û kulîlkekê di wê xweliyê de diçîne.

Wek diyar e, "hesabê mal û sûkê li hev nayên." Kalkata bi belengazan û nexweşan û serseriyên û dizan mişt e. Ew nikare kar bibîne. Kesekî diz bi dek û dolaban piçek pereyên bi wî re jî jê didize. Ew û jin û her sê zaroyên xwe di taxekê de li ser erdê radizên.

Maks digihê Kalkata. Karkirekî otêleke arzan hema-hema bi zorê keçekê dixwe odeya wî. Keçik wî dibe meyxanekê û wî serxweş dike. Yê keçekê bi kar tînin li derve li wî dixin û tiştine wî didizin. Hesarî diçe alîkariya wî, wî hildigre û dibe "nexweşxanekê" kesên belengaz. Nexweşxane li beşê herî belengaz yê Kalkata ye, ku navê xwe Bajarê Şahiyê ye. Nexweşxane bêdoktor, bêderman, bêtext û bêhacet e; bi nav nexweşxane, lê ji navendeke alîkariyê bi sînor bêtir ne çî tişt e. Ya ev alîkariya bi sînor bi rê ve dibe Joan (Pauline Collins), jineke dora 45 salî e. Ew jî li welatê xwe, Îngilîzistanê, ji jiyînê ne razî bûye û jê reviyaye, lê wê şêweya jiyîna hindiyên pejirandiye, ketiye ser felsefeya jiyana wan, bûye yek ji wan. Bi dîtina Maks tenê kesê dîn dikare wek Joan bike û

li şûna wisa bijî, lê Joan di karê xwe de û li warê xwe yê nû jiyîneke bi mebest dibîne. Bi dîtina wê alîkirina kesên hewcedar ferz e. Maks pasporta xwe wenda kirî û divêt demekê li benda gihîştina wê û pereyan bimîne, li dawiya dawiyê dipejirîne ku ji bo şeş hefteyan alîkariya Joan bike û nexweşxaneyê piçekî organîze bike.

Hesarî jî li Bajare Şahiye karekî dibîne, wek "hespê du ling." Gelek ji kesan li vir vî karî dikin. Dewlemendekî xwedan rêxistineke wek yên Mafya erebeyan dide wan. Yên wek Hesarî jî van erebeyên duteker wek hespan li dû xwe dikîşînin û rêwîyan, wek taksiyan, dibin şûnên ew dixwazin.

Bajare Şahiye tijî kesên birçî, belengaz û kincqetiyayî ye. Li wir herweha hejmareke kesên bi nexweşiya cuzanê ketine dimînin. Gelo çima navê Bajare Şahiye li vê dojhê hatiye kirin?! Nedizanim eger hevêrkeke bi navekî wisa li Kalkata hebe, lê amanca nivîskarê serpehatiyê baş diyar e. Li Bajare Şahiye hemî asteng û diwariyên jiyînê hene, lê belengazên wê ji hev hej dikin, bi hev re dikenin, bi hev re digirîn, alîkariya hevûdin dikin û tiştêkî biçûk wan dilşa dike. Nivîskar û yên ku film çêkirine çirokên cuda di hundir çirokekê de pêşkêş dikin û bi riya van serpehatiyên raman û felsefeya xwe diyar dikin. Yek ji wan serpehatiyên xûzekî bêling e. Dema Maks, Joan û jina Hesarî, Kamala (Shabana Azmi) diçin hawara jina wî ya li ber mirinê, wê û zaroyê wê yê nû ji mirinê xilas dikin, hemî cîranên kesê bêling bi wî re şa dibin...

Di dema ku Joan şêwe û felsefeya jiyana hindiyên fêhm dike de, Maks, tevî rindiya dilê xwe jî, nikare tehmûl bike. Ew kesên karê hespan dikin li dij patronê wan dihêvoce û ji wan dixwaze ku ew şertên wî nepejirînin, li dij wî serî hildin. Bi dîtina Joan, ya herî baştir ew e, ku ew li gor rê û şertên jiyana hindiyên biçin. Maks: "Ez ji rê û şertên jiyana wan nefret dikim." Hesarî dibêje Maks: "Ez wek mirovekî biçûk hatime cîhanê." Maks napejirîne û li wî vedigerîne: "Tu ne biçûk î, lê tu tirsonek î." Kurê patron, li milê din, hewl dide Maks bitirsîne, da ji wir bireve. Peyayên wî lêdixin, lê Maks, wek bijîşkekî ji bajarekî emerîkî, nikare van rêçik û şertan bipejirîne. Patron dibêje Maks: "Ji bo te pere biçek kaxiz e. Bi vê kaxizê tiştê tu bixwazî tu dikarî bikirî. Ji bo min pere hêz e. Ev hêz min diparêze û ji yê bêhêz cuda dike..."

Tevdêr û planên Maks encamên xirab li gel xwe tînin. Patron kiriya nexweşxaneyê bêtir dike. Patron çiqas dilreş e jî, ew karê xwe bi siyaset û bi zanistî bi rê ve dibe, ne wek kurê xwe, yê ku ji tade û lêdanê hej dike. Polîs li aliyê wan e. Li dû mirina wî kurê wî dest bi stemkariyê mezîn dike, nexweşxaneya belengazan bi destên xwe lêkiribûn hildiweşîne, kesên bi wî re nedilsoz dide kutandin û erebeya Hesarî ji dest digire. Ev biryara wek birûskê li jiyana Hesarî dikeve. Ji jiyana xwe, ya ku di nexweşxaneyê de alîkariya Maks dike re dibêje: "meçe alîkariya wî; ew ne ji me ye, ew dareke bêyî reh e, jê dûr keve." Dema Maks hewl dide wî aşt bike, Hesarî dibêje wî, "tu wisa texmîn dikî ku hejkirin dikare bi lêkirina nexweşxaneyekê û dayina diyariyekê were kirin; hejkirî nayê kirin, di dil de ye."

Nivîskar dixwaze xuya bike, ku tenê xwediyê birînê bi êşa birîna xwe dizane, ku tenê yê bindest dikare xwe azad bike. Bi zorê û bi hêvotina yên din tenê, yê bindest ji bindestiyê xilas nabe. Dema patronê nû hewl dide li pêş çavên Hesarî rûyê keça wî bi şefrayê birîn bike, da dersek baş bide wî, Hesarî nema dikare xwe rawestîne û êrîşî wî dike, wî radimedîne û hindik dimîne wî bikuje. Hesarî bi hêza xwe dihesê û tevî ku birîn dibe jî li pêş çavên xelkê çavê patron dirijînin. Ev yeka cesaretê dide yên din jî û heta bi hakima dadgehê be piştgirîya wî dike...

Fîlm bi xweşî dawî tê. Baran dawiyê dide germahiyê, û tevî ku zirarê digihîne malan û lehiyê bi rê dixê jî, ew dibe sîmbola dawîya stemkariya patron. Hesarî dibe xwediyê erebaneya xwe, qelenê keça xwe dide ser hev û wê dizewicîne. Berî ku bûk ji mal biçê der, bavê wê gula niha mezin bûye raber wê dike: "A binihêr, keça min. Ev kulîlka çeleng ji mestek xweliya gundê me û bizreke biçûk hatiye der." Di êvara zewacê de ew Maks li ber bavê xwe dide rûnişkandin û wî wek dostekî malbatê dipejirîne. Dema Maks dibîne ku ji birîna wî xwîn tê der, ew dixwaze bi şeweya xwe ya emerîkî biqîre û wî rake nexweşxaneyê, lê Hesarî wî kerr dike û dibêje: "Ev civîneke şahiyê ye. Kêfayên din xirab nake; hêdî-hêdî," û ew xêtir ji mêvanan dixwaze û bêyî ku kesî bi xwîna birînê bihesîne ji temaşeyê diçe der.

Dostaniya Joan û Maks jî kûrtir dibe, lê ew bi sal û ramanên xwe ji hev dûr in. Bijîjkekî frensî li rê ye, ew ê bi şeweyeke fermî bibe doktorê nexweşxaneyê Bajarê Şahiyê. Maks dikare êdî li welatê xwe vegere.

Tiştêkî din ku romana Dominique Lapérre û filmê Rolan Joffé xuya dikin ew e, ku jin dikarin ji peyan bêtir xwedan sebir û cesaret bin. Di film de sebir û cesaret mentiqî ya bi Joan re heye, li nik Maks tune. Li milê din, sebir û cesareta Kamala, ji ya mêrê wê bêtir e. Di eynî demê de hurmeta Joan ji Hindiyan re û hurmeta Kamala ji Maks re li cem peyan ta ew rade tune. Jê bêtir, nivîskar û dîrektorê filmê Bajarê Şahiyê, li berevajiyê gelek filmên roava, bi hurmeteke mezin li şênîyê vê hevêrka belengaz dinihêrin û rola boketîya rast didin wan. Erê, Joan alîkariya van belengazan dike, lê ew jî wê wek endameke ji civakê dipejirînin. Qîmeta wê bilind digirin. Erê, Maks xwe davêje nav ava lehiyê, da kesê bêling ji ser xaniyê wî daxê jêr, lê dema dareke bi ser wî de dikeve Hesarî jiyana xwe dike tehlûkeyê û wî ji mirinê xilas dike.

Li dû dîtina filmê CITY OF JOY mirov digihê wê encamê, ku kesên ji nijad, ol û çandên cuda dikarin li gel hev bijîn, dikarin ji hev hej bikin û alîkariya hevûdin bikin, lê tenê bi şertê ku ew hurmeta erf û edetên hev bigirin, bi şertê ku ew guh bidin hevûdin û hevûdin fêhm bikin.

Fîlm bi vê hevoka Hesarî xilas dibe: "Hertiştê neyê dayîn wenda ye."

Sydney, 12/92

# ŞEFEQ

Husên ARIF

Amadekar: Ferhad PÎRBAL

*Husên Arif le nawerastî salanî syekan le şarî Silêmanî le Kurdistanî Iraq da le dayik bûwe. Yekemîn komele çîrokî xoy la salî 1959 da be nawnîşanî "Le rêy xebat da" bilaw kirdewe, paşan le dûmahîy salanî şêstekan da komele çîrokî "Kilafe y janêkî tûre".*

*Le salî 1970 da, legel komelêk nûserî din, şair û çîroknûs, govarêkyan be nawnîşanî "Riwange" bilaw kirdewe, ke bûwe binaxey bilawbûnewey edebatekî newjen û taze le Kurdistanî Iraq da.*

*Husên Arif le salî hefta bewlawa gur û henasp û nawerokêkî tazey be çîrokî kurdî bexşî; emro be yekêk le pêşrewanî çîrokî kurdî dejmêrdîrêt. Takû êsta sê romanî bilaw kirdawe: "Gele Gûrg", "Şar" û "Endêşey Mirovêk".*

Hêšta şefeqî nedabû. Tarîkî û xamoşiyekî êkcar kip, şepolî kizabayekî sard, bê şine, deyda be ruxsarîda û têdeperî. Em ewsate taze xebery bibûewe û çawî kirdibowe. Hestî be serma dekird. Betaniyekey beser xoyda rakêşa û emla û ewlay xoyaxîni. Teqelay da binwêtewe, bêşûd bû. Taseyek le qulayî naxida birûskey da. Betaniyekey leser xoy ladayewe. Rûy be lay rast da wergêra. Tase bû be arezû.

(Çiwar şewe le yektir dabirawin. Emeş serbarî mandûbûnî çiwâr roj rêgabin, be naw şax û kêw û dol û deşt da. Eweyan wa... Êy emeyan le pay çî?! Dinya hêšta tarîke, kes bexeber niye. Heste biço xot biaxine jêr lêfekey...).

Helsa û anîşkî dadaye ser serînekey. Kemêk bemla û bewlada helîrwanî. Bomawey kemêk satêk gwêy helxist. Ewsa serinci daye şiwên cêgey jinekey. Li cem herdu mindalekey leser tenîşt xewtibû. Le xoy dûdil bû. Çend satêkiş birî lê kirdewe. Dawîn car tîunî daye ber xoy û kişa. Be tenîşteyewe şanî dada. Demî xiste binagwêy û be çirpe witi:

- Xawer..!

Xawer le şîrîn xewî xoyda bû. Boynehate welam. Ewsa destîşî lê xiste kar, hênay be ser û qijî da, încâ sîng û memkî û încâ... û încâ witiyewe:

- Xawer...Xawer...!

Hêšta şefeqî nedabû. Tarîky û xamoşiyekî êkcar kip, şepolî kizebayekî sardî bê şine xoy axiniye bawesî Ewla. Ewlaş be perošewe bawesî pêda kird.

## II

Şefeqî da. Lêle rûnakiyek lewdîw kêwekey beramberiyanewe diyarî da. Dirrî be tarîkiy emdîw îş deda. Wilax û

bar û cestey rakişawî koçerekanî dekirde komelêk tarmaîy têkel û pêkelî xamoş. Ewsate, tenanet tarmaîy her dû cestey têkalawî Ewla û Xawer îş xamoş bibûnewe.

Zîrey giriyanî korpeyek, lenakaw, le nawcergey ew xamoşiyewe berizbowe. Zîregiryaneke çend hengawêk lewlay Ewla û Xawer ewe bû. Xawer raçenî. Bêdeng, Ewla şî raçenand. Ewla serî berizkirdewe bikşêtewe ser cêgakey xoy, belam her xêre xoy axîneyewe pal Xawer. Gulçîn î dît daniştibû, korpekey nabûe koşiyewe û leweda bû memkî bidatê. Be çirpe be Xawer î wit:

- Ewe çiyey?! Xo şefaqî dawey!  
Wa diyare xewman lê kewtibûewe.

Xawer witi:

- Xetay to bû. Ewsa pêmwiti  
"helse biçorewe ser cêgakey xot",  
neçûyt.

- Êsta çi bikeyn?!

- Xot mat ke! Çawî lêman niye.  
Çawerê bike ta denwêtewe!

Gulçîn korpekey jîrkirdewe.  
Palkewtewe binwêt. Xawer serêkî  
berizkirdewe û helîrwanî witi:

- Nustewe... helse dey!

Ewla nebizwa. Baweşî pêda kird  
û nûsandî be xoyewe. Xawer dûbare  
witi:

- De helsa... wa xerîke dinya  
rûnak debêtewe.

Ewla maçî kird, witi:

- Hezim lête!

III

Roj le kêwekey  
bermaberianewe wederkewt.  
Rûnakiyekî geşî da be naw doleke. Ewsa,  
teniya korpe û sawakan nebin, sercem

koçerekanî din le xew helsabûn. Wekû  
şaremêrûle be yekda dehatin. Serlenwê  
kol û bariyan depêçayewe û le  
wilaxekaniyan bazdekirdin.

Hacî Mehmûdî mamî Ewla, be  
ser û rişey sipyekewe, beseryanewe  
desûrayewe û deywit:

- Dey qurbantan bim... Dey aza  
ken! Her emroman mawe. Êware legel  
bangî şewande degeyne cê û rizgarman  
dibêt.

Ewla le zûwewe legel Xawer kal  
û barî xoyan pêçabowe û le ker û  
bargîrekey xoyan barkirdibûn. Bigre  
yarîdey malî xezûrî xoy şî dabû. Em bû  
ke çu qale y jinbray xebekirdewe.  
Pêkewe kel û pelakanî ewanişiyân  
pêçayewe, baryan kirdin.

Roj hêştay rimêk serûy demkêw  
nekwetibû, ke Hacî Mehmûd fermanî  
da:

- Dey, bikewne rê!

Karwanî koçerekanewterê. Zor  
dûr kewtinewe. Gulçîn xoy geyande  
Xawer, çirpandî be gwêyda û witi:

- Bexilît pê debem!

Xawer wisti xoy lê gêl bikat, lêy  
pirsî:

- Bo çî?

Gulçîn witi:

- Xotim lê gêl meke... dîmin...

Kak Ewla le Tale azatire...

- Xawer pêkan. Lay kirdewe be  
lay çepîda, Ewla y dît. Ewiş pêdekenî.

1975.09.02

Serçaweyê: Husên Arif, Twêşûy û Seferêkî  
Sexît, Bexda: 1979

# HUNERMENDÊ KURD HEJAR (Hemîd Derwêş)

Amadekar: F. PÎRBAL

Hemîd Derwêş le salî 1954 le Kerkûk, le Kurdistanî Iraq le dayik bûwe. Dîplomî hûnere ciwanekani Bexda y le salî 1975 da wergirtiwe, herweha dîplomî Académie des Beaux- Art le salî 1980 da le şarî Florence û dîplomî Maitrise de L'art plastique le salî 1989 da le Paris.

Pêşanga:

- |  |   |
|--|---|
| 1972 Hunermendên éxprésonist ên kurd, Hewlêr- Kurdistanî Iraq. | (Îtalya)  |
| 1973 Pemangay hunere ciwanekan le Bexda.                       | 1987 Peupole Gallery, Dixon Gallery, London.  |
| 1975 Gravûr, Bexda.  | 1988 Enstitu î kurd le Paris  |
| 1977 J. F. I., Bexda   | 1989 Espace 13, strasbourg ( Fransa).   |
| 1979 Hunermendên kurd, Florence (Îtalya)                       | 1990 Espace U. V. A. 18, Paris.   |
| 1980 Anniversaire de la libération de L'Italie.                | 1991 Rue Mont-Cenis, Paris.   |
| 1981 Hunermendên kurd, Vienne (Autriche).                      | 1991 F. des Halles, Grand galerie, Paris.   |
| 1983 Hunermendên kurd, Amsterdam (Holand)                      | 1992 Galerie Gignac, Gignac.  |
| 1985 Festivalî Newroz le Venîz                                 | Hejar endamî destey serokayetiye le komeley Hunermendani kurd le Fransa ( A. A. P. K. F.): 45, Rue Boindon; 750 18 Paris, France. |





# KOVARÊN KURDÎ LI EWRÛPA

Lokman POLAT

Di vê demê de li Ewrûpa bi dehan weşanxane û kovarên kurdî hene. Ew di hêla ziman, edebiyat û çanda kurdî de karên hêja dikin. Bi sedan nivîskarên kurd li ser ziman, çand û dîrokê lêkolînan dikin, berhemên hêja diafirînin.

Ji bo pêşdeçûna zimanê kurdî, kovar û pirtûkên kurdî roleke girîng dilîzin. Di her awayî de pêşveçûn bi xebata xwendekar û ronakbîrên kurd ve girêdayî ye.

Ev bûye bîst-sih sal ku kurd ji ber sedemên aborî û siyasî koç kirine û hatine li Ewrûpayê bi cî û war bûne. Hinek bûyerên girîng wek şerê di navbera Îran û Iraqê, li Tirkîyê hatina cûntaya leşkerî bûn sebeb ku kurd terka welatê xwe bikin û bên Ewrûpa. Yên piştî sala 1980 derketin Ewrûpa pirraniyê wan mirovên siyasî bûn. Kesên ronakbîr di nav wan de pîrr bûn. Kabîliyeta wan ya nivîsandinê hebû. Wan dest pê kirin di kovarên kurdî de nivîsandin. Ji bo gramatîka zimanê kurdî û ronahîkirina dîroka kurd û Kurdistanê xebateke baş hate kirin û hê jî tête kirin û berdewam dike.

Di sala 1960'î û vir ve nêzîkî sed kovarên kurdî derçûne. Ji wan kovaran henek jê niha dernakevin.

Em ê danasîna kovarên kurdî di sê demên salbûrî de bidin û dawiyê jî li ser ew kovarên kurdî yên ku hîn jî derdikevin bisekinin. Beriya ku ez ji dema 1960'î dest pê bikim, ez ê bi kurtayî qala kovara "Dengê Kurdistan" bikim. Li gorî ku Dr. Nûreddîn Zaza me agahdar dike, ev kovar, bi tîpên latînî, kovara kurdî ya pêşîn e ku li Ewrûpa derketiye.

Kovara "Dengê Kurdistan" kovareke mehane bû. Ji sala 1949 heya 1950 dom kiriye û 12 hejmar derketine. Ji sala 1950 hetanî sala 1956'an li Ewrûpa tu kovarên kurdî derneketiye. Di sala 1956'an de civata xwendevanên kurd li Ewrûpa kovara

''Kurdistan'' derdixin. Lê ev kovara pîrraniya nivîsên wê bi zimanê îngilîzî û hinek jî bi kurdiya soranî bûye. Hetanî sala 1963'an tu kovar bi kurmancî derneketiye. Di sala 1963'an de kovara ''Hêviya Welêt'' derdikeve.

## DI NAVBERA 1960 - 1970 DE KOVARÊN KURDÎ

### HÊVIYA WELÊT

Di sala 1963'an de di bin berpirsiyariya Hemreş Reşo de ev kovar derketiye. Kovara Hêviya Welêt tenê sê (3) hejmar hatiye weşandin. Di van hersê hejmarên kovarê de gelek helbest, çîrok, metelok, meqalên siyasî û li ser dîrokê nivîs derketine. Vê kovarê çanda kurdî dewlemend kiriye.

### ÇIYA

Kovara çiya di navbera sala 1965 û 1970 de heşt (8) hejmar derketiye. Li ser qapaxa kovarê dinivîsîne ku ''Çiya kovara çanda kurd e''. Çiya kovareke hêja bû. Wê di dema xwe de ji bo ziman, dîrok û çanda kurdî xebateke hêja kiriye. Di kovarê de quncika dîrokê, ya çîrokan, ya bûyeran û pîrr beşên din hebûn.

## DI NAVBERA SALÊN 1970-1980 DE KOVARÊN KURDÎ

### RONAHÎ

Di sala 1971'ê de derket. Hetanî sala 1978'an hat weşandin. 24 hejmarên ronahiyê derçûn. Bi zimanê kurdî û tirkî bû.

### BRÛSK

Di sala 1977 - 1978'an de şeş hejmar derketin. Bi kurdî û tirkî bû.

### STÊRKA SOR

Bi sê zimanan; kurdî, tirkî û swêdî di sala 1977 û 1979'an de neh hejmar derketin.

### AZADÎ

Ev kovara ha xwerû bi zimanê kurdî bû. Ji sala 1978'an heta 1979'an neh hejmarên wê derketin.

### ŞOREŞGÊR

Bi zimanê kurdî û erebî di sala 1978'an de hejmareke wê derket.

### RIZGARIYA KURDISTAN

Ji sala 1979 hetanî 1982 bi zimanê kurdî û tirkî nozdeh (19) hejmar derketin.

### DENGÊ KOMELÊ

Di sala 1978'an de bi kurdî û erebî hejmareke wê derketiye.

### ROJA KURDISTAN

Xwerû bi zimanê kurdî bû. Di sala 1979'an de du hejmarên wê derketine.

### PÊŞREW

Bi zimanê kurdî û erebî di sala 1972'an de hejmareke wê derketiye.

### RÊYA RAST

Xwerû bi zimanê kurdî bû. Ji sala 1977'an hetanî 1981'ê panzdeh hejmarên wê derketin.

### PALE

Bi zimanê kurdî û tirkî ji sala 1978

hetanî 1981'ê neh hejmar derket. Kovara pale hem bi forma xwe kovareke xweşikbû, hem jî bi naveroka xwe kovareke dewlemendbû. Ev kovar wek hemû kovarên din di hêla ziman, dîrok, çand û edebî de xizmeteke baş kiriye. Naveroka kovara PALE bi her awayî pirr xurt bû. Her hejmareke wê 80-90 rûpel bû. di hejmara PALE ya dawî de ji bo sedemên nederketina xwe van gotinan dibêje: "Kovara PALE heta niha, bi awayekî rêk û pêk neh hejmar derketin. Divê bête zanîn, ku di mercên Ewrûpa de weşandina kovareke weha ne tiştekî gengaz e. Ji her aliyên ve dijwarî hene. Ew dijwarî pirr caran dibin sebebên dawîhatina jiyana kovar û rojnameyên li derveyî welêt".

## JI SALA 1980 Û BI VIR DE

Piştî sala 1980 di hêla weşandina kovarên kurdî di Ewrûpayê de peşveçûneke mezin heye. Di vê demê de ji çilî zêdetir kovar derketine. Lê niha pîraniya wan dernakevin. Ji sala 1980 û bi vir de di nav çil û heşt (48) kovarên ku derketine de, tenê deh (10) kovar niha derdikevin.

Kovarên ku ji sala 1980 û bi vir de derketine ev in:

**DENGÊ YEKÎTIYÊ:** Bi zimanê kurdî û tirkî, di sala 1983'an de neh (9) hejmar derketiye.

### TÊKOŞER

Bi çar zimanan; kurdî, tirkî, fransîzî û flemânî derketiye. Çil û du (42) hejmar hatiye weşandin.

### ÇARÇIRA

Di sala 1986'an de bi hersê zaravayên kurdî; kurmançî, soranî û zazakî derketiye. Bi tenê çar hejmarên wê derketine û jê pê ve rawestiyaye.

### NEWROZ

Bi kurdî û swêdî di sala 1986'an de hejmareke wê derketiye.

### SERXWEBÛN

Di sala 1982'an derket. Heta niha 132 hejmarên wê derketiye. Bi zimanê kurdî û tirkî ye.

### BERBANGÊ KURDISTAN

Di sala 1984'an de hejmareke wê derketiye. Kovareke siyasî bû.

### REWŞEN

Kovareke çandî û edebî ye. Xwerû bi zimanê kurdî ye. Ji sala 1988'an û hetanî 1992'an neh (9) hejmar derketiye. Piştî hejmara nehan vê kovarê weşana xwe ya li Ewrûpa da sekinandin û eynî bi vî navî ji nû ve li Stembolê derket. REWŞENA ku li Stembolê derketiye heta niha şeş (6) hejmarên wê derçûne.

### RIZGARIYA WELAT

Di sala 1985'an de bi zimanê kurdî û tirkî deh hejmarên wê derketine.

### DEM

Bi zimanê kurdî û almanî di sala 1985'an de şeş (6) hejmar, di sala 1986'an de heşt (8) hejmar. Hemû li ser hev çardeh (14) hejmar derketiye.

### GAZIYA WELAT

Di navbera 1980 û 1983'an de bi kurdî

û tirkî neh hejmar derketiye.

### STÊR

Di sala 1983'an de xwerû bi zimanê kurdî sê hejmar derketiye.

### DEMOKRATÊN ŞOREŞGER

Bi kurdî û tirkî di sala 1986'an de hejmareke wê derketiye.

### ÇI BIKIN?

Di sala 1981 û 1982'an de pênc hejmarên wê derketine. Kovarek siyasî ya Trotskistan bû.

### DEMOKRAT

Bi kurdî û tirkî di sala 1988'an de heşt hejmar derketiye.

### NÛÇENAME

Bi kurdî û erebî di sala 1983'an de şeş hejmarên wê derketiye.

### KURDISTAN

Bi kurdî û erebî di sala 1983'an de hejmareke wê derketiye.

### HAWAR

Ev kovar pêşî di girtîgeha eskerî ya Diyarbekirê de ji aliyê Mazlûm Dogan û hevalên wî bi destan hatiye derxistin. Paşê li Ewrûpa ji nû ve hatiye çapkirin. Hawar heft hejmar derketibû. Nivîsên wê hemû bi tirkî bûn.

### JÎN

Bi zimanê kurdî û erebî di sala 1985'an de derket. Bîst hejmarên wê derketine.

### RIZGARÎ

Neh hejmarên wê berî 1980 li Tirkîyê derket. Hejmara dehan di sala 1988'an

de hat weşandin. Heta niha bîst û neh hejmar derketiye.

### DÊRSIM

Bi zimanê kurdî bû. Di sala 1988'an de sê hejmarên wê derketine.

### HEVKARÎ

Bi kurdî di sala 1987'an de çar hejmar derket.

### YEKÎTÎ

Di sala 1980'ê de du hejmar derket. Kovar bi kurdî bû.

MIZGÎN: Bi zimanê kurdî û almanî bû. Di navbera 1983 û 1986'an de çar hejmar derket.

### QÊRÎN

Hejmara yekemîn di sala 1983'an de derket. Bi zimanê kurdî û tirkî bû.

### RASTIYA KURDISTAN

Bi zimanê tirkî di sala 1987'an de neh hejmar derketiye.

### YEKÎTIYA SOSYALÎST

Di sala 1984'an de derket. Bi zimanê kurdî û tirkî bû. Hemû hîjdeh hejmar û çend hejmarên taybetî derketine.

### YEKÎTÎ

Di sala 1983'an de bi zimanê kurdî, tirkî û erebî şeş hejmar derket.

### WEKHEVÎ

Di sala 1981'ê de bi zimanê tirkî du hejmar derket.

### XEBAT

Berî sala 1980 li welêt heft hejmarên

wê derket. Paşê di sala 1985'an de bi eynî navî li Ewrûpa hejmara wê heysta derket. Hemû li ser hev hîjdeh hejmar derket. Bi kurdî û tirkî bû.

#### HÊVÎ

Bi zimanê kurdî (zaravayê kurmançî, soranî û dimilî) di sala 1983'an derket. Heta niha heft hejmarên wê derketiye.

#### BERHEM

Ji sala 1988'an hetanî 1992'an duwanzdeh hejmarên wê derket. Niha bi eynî navî li Tirkîyê sê hejmar derketiye. Bi zimanê tirkî û kurdî (zaravayê kurmançî û dimilî) ye. Kovareke lêkolînî ye.

#### RÊNASÎ

Kovara enformasyonê bû. Di sala 1984'an de deh hejmarên wê derket. Bi zimanê kurdî, zaravayê kurmançî û soranî bû.

#### DENGÊ WELAT

Bi zimanê kurdî û tirkî di sala 1988'an de du hejmar derket. Nivîsên li ser stratejî ya eskerî û bi giranî nivîsên teorîk tê de derketin.

#### ALA YEKÎTÎ

Di sala 1988'an de derket. Hetanî sala 1992'an bîst û heyst hejmarên wê derçûne. Bi zimanê kurdî û tirkî bû.

#### HÊVIYA GEL

Hejmara wê ya yekem di sala 1986'an de derket. Hetanî meha tebaxê a sala 1991'ê sî û heft hejmarên wê derketine. Ew jî bi zimanê kurdî û tirkî derdiket.

#### DENGÊ KURDISTAN

Xwerû bi zimanê tirkî bû. Hemû li ser

hev çardeh hejmar deketiye.

#### BINGEH

Bi zimanê kurdî û tirkî, di sala 1987'an de derket. Hemû li ser hev pênc hejmar derket.

#### NIŞTIMAN

Di navbera salên 1983 û 1985'an duwanzdeh hejmarên wê derketine. Paşê demeke dirêj rawestiya. Di sala 1990 meha îlonê dîsa ji hejmara sêzdehan dest bi weşanê kir. Hetanî sala 1992'an bîst û du hejmarên wê derketine. Bi zimanê kurdî û tirkî ye.

#### HÊZA WELATPARÊZ

Hejmara wê ya yekem di sala 1988'an de derket. Hetanî sala 1991'ê heyst hejmarên wê derketin. Bi zimanê kurdî û tirkî bû.

#### RIYA ŞOREŞ

Di sala 1984'an de derket. Bi zimanê kurdî û tirkî bû. Li ser hev donzdeh hejmar derketin.

#### TÊKOŞÎNA SOSYALÎST

Di sala 1989'an de hejmara wê ya yekem derket. Ew bi zimanê kurdî û tirkî bû. Li ser hev hemû heft hejmar derçû.

#### KAVA

Berî sala 1980 çar hejmarên wê li Tirkîyê derketibû. Di sala 1981'ê de bi eynî navî çar hejmarên wê li Ewrûpa derket. Hemû li ser hev heyst hejmar derketine. Bi zimanê kurdî û tirkî bû.

#### CÛDÎ

Bi kurdî û tirkî ji sê mehan carekê

derdikeve. Kovara Cûdî kovareke îslamî ye. Ew xwe bi dengê Kurdistana îslamî bi nav dike.

### TÊKOŞÎN

Pêşî li Tirkîyê pênc hejmarên wê derketin. Ji sala 1983'an hetanî sala 1986'an sê hejmarên wê li Ewrûpa derket. Ew bi zimanê kurdî û tirkî bû.

### ROJA WELAT

Hejmara wê ya yekem di sala 1977'an de li Tirkîyê derket. Hetanî sala 1984'an bi eynî navî li Ewrûpa di hejmar sêzdehan de dest bi weşanê kir. Hetanî sala 1986'an sî û heşt hejmarên wê derketin. Bi zimanê kurdî û tirkî bû.

### PÊŞENG

Berî sala 1980 çar hejmarên wê derketin. Piştî 1980 ew li Ewrûpa derket. Di sala 1986 û 1987'an de çar hejmarên wê yên taybetî jî derketin. Hetanî sala 1990 heftê û heşt hejmarên wê hatine weşandin.

### RIYA AZADÎ

Çil û çar hejmarên wê berî 1980 li Tirkîyê derket. Di sala 1982'an de li Ewrûpa derket. Ev kovara li Tirkîyê navê wê "Özgürlük Yolu" bû. Sed û sî û çar (134) hejmarên wê derket. Demekê hate rawestandî. Niha çar hejmarên wê yên taybetî derketine. Bi zimanê kurdî û tirkî ye.

### KURDISTAN PRESS

Di sala 1986'an de dest bi weşanê kir. Bi zimanê kurdî û tirkî bû. Hetanî niha not û sê hejmarên wê derketine.

### DENGÊ KOMKAR

Hejmara wê ya yekem di sala 1979'an de derket. Bi zimanê kurdî û tirkî ye. Hetanî sala 1992'an sed û çil û du (142) hejmarên wê derketine. Bi kurdî û tirkî ye.

### KURMANCÎ

Xwerû bi zimanê kurdî ye. Heta niha yanzdeh hejmar derketine.

### BERXWEDAN

Sê hejmarên pêşî xwerû bi kurdî bû. Paşê bû bi kurdî û tirkî. Hejmara yekem di sala 1982'an de derket. Heta sala 1992'an 153 hejmarê wê derketiye. Niha tenê bi zimanê tirkî tête weşandin.

### ROJA NÛ

Pêşî bi zimanê kurdî û tirkî bû, paşê xwerû bi zimanê kurdî derket. Hejmara wê ya yekem di sala 1978'an de derketibû. Heta hejmara çil û sisiyan bi kurdî û tirkî bû, şêst û pênc hejmar jî xwerû bi zimanê kurdî derket.

### ARMANC

Di navbera salên 1979 û 1986'an de 62 hejmar bi zimanê kurdî û derket. Paşê xwerû bi zimanê kurdî derket. Hetanî niha 132 hejmar derketiye. Ew hê jî weşana xwe berdewam dike.

### BERBANG

Hejmara wê ya yekem di sala 1982'an derket. Xwerû bi zimanê kurdî (zaravayê kurmancî, soranî û dimilî) ye. Bi du alfaban (latînî û erebî) derdikeve. Hetanî sala 1992'an heştê û pênc hejmarên wê derketine.

## WAN

Xwerû bi zimanê kurdî ye. Di sala 1992'an sê hejmar derketiye.

## NÛDEM

Kovareke hunerî, edebî û çandî ye. Xwerû bi zimanê kurdî ye. Hejmara wê ya yekem di sala 1992'an de derketiye. Tê de nivîsên bi zaravayê dimilî û soranî jî heye. Heta niha çar hejmarên wê derketine.

## DÎDAR

Di sala 1992'an de çar hejmarên wê derketiye. Kovara ciwanan e. Bi alfaba latînî û erebî, bi zaravayê kurmançî û soranî derdikeve.

## RONAHÎ

Bi zimanê kurdî û almanî hêj nû hejmara wê ya yekem di meha dawî ya sala 1992'an derket.

## KOVARÊN ZAROKAN

### HÊVÎ

Di navbera salên 1981 û 1984'an de panzdeh hejmarên wê derketin. Xwerû bi zimanê kurdî bû.

### HÊLÎN

Bi zimanê kurdî çardeh hejmar derket. Hejmara wê ya yekem di sala 1982'an de hate weşandin

### KULÎLK

Di sala 1980 de hejmara wê ya yekem derket. Hemû li serhev çil û çar hejmar derçû. Kovara Hêvî, Hêlîn, Kulîlkji bi zarok û kesên ku nuh hînî xwendin û

nivîsandina zimanê xwe yê zikmakî dibûn derdiketin.

## KOVARÊN PÊKENÎNÎ (MÎZAHÎ)

### ÎSOT

Di navbera sala 1985 û 1987'an de neh hejmarên wê derketin. Bi zimanê kurdî bû.

### MÎRKUT

Di sala 1985'an de sê hejmarên wê xwerû bi kurdî derketin.

### ZENGIL

Di sala 1985'an û 1986'an de heşt hejmarên wê derketin.

---

*Çavkanî: Reşo Zilan, pêşdeçûna ziman û rewşa weşanên kurdî li Ewrûpa. Berbang, hejmar: 65. û hemû kovarên ku li ba min bûn.*


# DANASÎNA PIRTÛKAN

**ABDURRAHMAN BEDÎRHAN VE  
İLK KÛRT GAZETESİ KÛRDİSTAN**  
Sayı: 17 ve 18

Xebata Malmîsanij ya dawî ye. Malmîsanij du hejmarên (17-18) rojnameya kurdan ya pêşî "Kurdistan" gihandine hev, ew ji tîpên erebî wergerandine tîpên latînî, bendên bi osmanî adepteyî tirkîya îro kiriye û ew bi çapeke bedew li Swêdê çap kiriye.

Wek tê zanîn hem Kemal Fuat, hem jî M. E. Bozarslan rojnameya Kurdistan ji nû ve çap kirine. Lê, li gorî agahdariyên Malmîsanij, di çapên herduyan de jî hejmarên 10, 12, 17, 18 û 19 tune ne. Lê Malmîsanij hejmarên 17 û 18 bi alîkariya dostên xwe bi dest xistine. Wî hejmar 18'an ji Pirtûkxana Ankara ya Millî, hejmar 17'an jî ji pirtûkxana Netewî ya Parîsê bi dest xistiye. Pirtûk hemû li ser hev 138 rûpel e.

**Navnîşana xwestinê:** Hyppingeplan 6,  
5 tr., S-163 62 Spånga-SWEDEN



**A. Hicri İzgören**

**Bedeli Ödenmiştir**

şairler



**YAZIT**  
*debiyat dergisi*

## BEDELİ ÖDENMİŞTİR

Pirtûkeke helbestkarê kurd Hicrî İzgören e. Pirtûk ji 26 kurtehelbestên bi tirkî pêk hatiye. Helbestkar dixwaze bi hindik gotin gelek tişt bibêje. Û ew bi ser jî dikeve. Ev pirtûka ku li Tirkîyê layiqî xelatê hatiye dîtin, bi tirkîyeke nûjen û bi gotinên orgînal hatiye hûnandin. Lê bi a me ger ew bi kurdî bûya, wê qîmeta wê li ba me hê bilindtir bûya. Pirtûk 64 rûpel e û di nav weşanên YAZIT de li Tirkîyê derketiye.

**Navnîşana xwestinê:** YAZIT Yayıncılık,  
Sağlık Sok. 17/12, Sıhhiye/Ankara-  
TURKEY



Malmîsanij  
&  
Mahmûd Lewendî

li Kurdistanana bakur û li Tirkiyê  
**Rojnamegeriya**  
**Kurdî**  
(1908-1992)

-II-

**NÊRÎNEKE REXNEYÎ LI**  
**HELBESTÊN KURDÎ**

Lêkolîneke lêkolînerê kurd Deham Evdil Fetah e. Fetah ji kurdên Sûriyê ye. Wek tê zanîn di vê dema dawî de kurdên me yên Sûriyê gelek berhem li pirtûkxana kurdî zêde kirine. Ev berhema ha yek ji wan e. Herweha mijara ku nivîskar ji xwe re hîlbijartiye mijareke balkêş e, heta niha bi kurdî pirtûkên di vî babetî de kêm derketine, an jî qet derneketine. Nivîskar mînak ji helbestên Melayê Cizîrî, Cegerxwîn, Tîrêj, Sebrî Botanî, Dilawerê Zengî, Salihê Heydo, Bêbihar, Evdirehmanê Mizûrî, Kemal Burkay, Kovan, Rojen Barnas, Şekoyê Hesên û Bedirxanê Sindî girtine û wan bi çavekî rexneyî berpêş dike. Pirtûk 183 rûpel û li gorî çapên Sûriyê çapeke bedew e.

**LI KURDISTANA BAKUR Û LI**  
**TIRKIYÊ ROJNAMEGERIYA KURDÎ**  
1908-1992

Ev cilda duwemîn ya xebata Malmîsanij û Mahmûd Lewendî ye. Di vê cilda dudan de lêkolîneran cih dane 56 rojname û kovarên kurdan. Kovarên ku wan bi dest xistine, digel wêneyê qaba wan yê pêşî û naveroka wan ew dane nas kirin. Ev berhema kolektîv ya di derheqa rojname û kovarên kurdan de, îro ne ewçend balkêş be jî, wê sibe mîna çavkaniyeke hêja bi kêrî gelek lêkolîneran were. Pirtûk 163 rûpel e û bi kurdiyê bedew e.

Navnîşana xwestinê: Hyppingeplan 6,  
5 tr., S-163 62 Spånga-SWEDEN



**LITERATURE ABOUT THE KURDS**  
(Literatur über Kurden  
Litteratur om kurder)

Ji aliye Nedim Dağdeviren ve hatiye amade kirin. Kataloge ke ku ji 250 weşanên bi kurdî û yê li ser kurdan hatiye pê. Ev yekemîn car e ku kataloge ke di vî babetê de tê amadekirin. Ev her 250 weşan bi sê zimanan; îngilizî, almanî û swêdî tene nasandin. Katalog hemû li ser hev 152 rûpel e û çapeke bedew e.

**Navnîşana xwestinê:** MEZOPOTAMYA  
Publishing & Distribution, BOX: 4036,  
S-141 04 HUDDINGE / SWEDEN

GABAR ÇIYAN  
**Bexçeya Zarokan**



**BEXÇEYA ZAROKAN**

Ji xabeteke Gabar Çiyan pêk hatiye. Gabar Çiyanê ku rojnamevan e û berpirsiyariya heftenameya Yeni Ülke ya li Swêdê dike, ev berhema xwe bi kurdî ji bo zarokên kurdan nivisandiyê. Weke ku nivîskar jî navê bexçe li pirtûka xwe kiriye, pirtûk bi rastî jî bexçeyekî tîne bîra mirov. Ew ji çîrokan, ji danasîna şairên kurdan, danasîna kovar û rojnameyan, danasîna bajarên kurdan û hwd. pêk hatiye. Pirtûk hemû li ser hev 65 rûpel e û li Swêd, di nav weşanên rojnameya Welat de derketiye.

**Navnîşana xwestinê:** Rojnameya Welat,  
Başmuhasip sok. No 16, Talas han 4. kat,  
Cağaloglu-ISTANBUL / TURKEY

# BIBE ABONEYÊ NÛDEMÊ!

Ger hewesa te li ser helbest, çîrok, roman, rexne, hevpeyvîn, lêkolîn, huner, sînema û hwd. hebe, pêşniyareke me heye; bibe aboneyê NÛDEMÊ!

Ger tu dixwazî ji tevgera huner û edebiyatê ya herçar perçeyên welêt haydar bibî û edebiyata dinyayê ya kevnar û nûjen bi zimanê kurdî bixwînî, dîsan bibe aboneyê NÛDEMÊ!

NÛDEM dixwaze ji avakirina edebiyata kurdî re bibe alîkar, tu jî alîkariya wê bikî, bibe abone!

Ez dixwazim ji avakirina edebiyata kurdî re bibim alîkar. Ji kerema xwe re min bikin aboneyê NÛDEMÊ.

Ji bo Swêd salekê 190 skr. Welatên din 39 Dolar.

**N a v** .....

**Paşnav** .....

**Navnîşan** .....

---

Vê karta jor dagire û fotokopiya wê li ser navnîşana NÛDEMÊ bişîne. Çer ku ew bigihîje me, em ê NÛDEMÊ digel karta abonetiye ji we re bişînin.

Ez hewesa xwe ya xwendinê bi hemû xizneyên Hindistanê nadim.

*Gibbon*

Sê tişt dikarin miletê min bibine helakê: zikmezini, xewa pirr û betalî

*Hz. Mehemed*

Şeref ji bo peyayên bi rûmet ji jiyanê jî bi qîmettir e.

*Shakespeare*

Tiştê ku tu dibêji ez qebûl nakim, lê ez heta mirinê mafê te yê gotinê diparêzim.

*Voltaire*

Min li ku benderuhok dîtibe ew li wir dixwaze bi hêz bibe.

*F. Nietzsche*

Mêrekî baş divê êvaran berî herkesî ranezê û sibehan piştî herkesî ranebe.

*Balzac*

Aştiyek ne baş, ji şer jî xerabtir e.

*Tacilus*

**NÛDEM**

No 5 - 1993